

K.T.

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

TRANSKRÎPSIYONA BERHEMA XELÎFE YÛSIF A BI NAVÊ *FERAÎZ*

TEZA LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

Rabia ORAK ELÇÎÇEK

ŞÊWIRMEND

End. Hdk. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN – 2019

T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

HALİFE YUSUF'UN *FERAİZ* ADLI ESERİNİN TRANSKRİPSİYONU

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN

Rabia ORAK ELÇİÇEK

DANIŞMAN

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ

VAN – 2019



T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ danışmanlığında, Rabia ORAK ELÇİÇEK tarafından hazırlanan “Transkripsiyona Berhema Xelife Yûsif a Bı Navê Feraîz” adlı bu çalışma, 12/07/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ’ın

İmza: 

ÜYE : Doç. Dr. Mahmut DÜNDAR

İmza: 

ÜYE : Dr. Öğr.Üyesi Mazhar TUNÇ

İmza: 

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

12/07/2019
Prof. Dr. Murat DEMİREL
Enstitü Müdürü



Teza Lîsansa Bilind

Rabia ORAK ELÇİÇEK

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ

ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ

Tîrmeh- 2019

TRANSKRÎPSÎYONA BERHEMA XELÎFE YÛSIF A BI NAVÊ *FERAÎZ*

KURTE

Edebiyata klasîk a kurdî di jiyana xwînerên kurd de xwedî cihekî gelekî girîng e. Kurdiya nivîskî bi saya edebiyata klasîk jiyaye û heta roja me hatiye. Gelek mela û feqe li medreseyan hînî edebiyata klasîk bûne, her wiha ew medrese ji bo wan wek dibistan bûn ku bi saya wan medreseyan derfet dîtin ku berhemên xwe biafirînin.

Yek ji wan melayan Xelîfe Yûsif e ku berhemên xwe bi saya medreseyan derxistiye holê. Xelîfe Yûsif, li Bazîdê hatiye dinyayê û jiyana xwe ji sedemên serdema xwe û ji bo pêşveçuyîna xwendina xwe li çend deverên din domandîye. Wekî Sêrt û Cizîrê jiyana xwe di medreseyan de derbas kiriye paşî vegeraye Bazîdê û li wir çûye rehma Xwedê.

Wekî piraniya wêjevanên klasîk a Kurd, Xelîfe Yûsif jî berhemên xwe bi tîpên Erebî û bi zimanê Kurdî nivîsandîye. Yek ji wan berheman *Feraîz* e ku em li ser xebitîne. Ev berhem ji bo xwendevanên medreseyan e ku ji bo dersê bikarbînin. Ev berhem li gor şertên Îslamê li ser mîrasa parkirina malê miriyan e. Ji kê/kî re çiqas par digehîje bi ewayek berfireh diyar kiriye. Di vê berhemê de hem zimanê Kurdî û hem jî zimanê Erebî bi hev re hatiye bikaranîn.

Bêjeyên Sereke : Xelîfe, Xelîfe Yûsif, Feraîz, wêje, wêjeya Kurdî

Hejmara Rûpelan : 143 + VII

Şêwirmend : End. Hdk. Dr. Nesim SÖNMEZ

Yüksek Lisans Tezi

Rabia ORAK ELÇİÇEK

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Tirmeh- 2019

HALİFE YUSUF'UN *FERAİZ* ADLI ESERİNİN TRANSKRİPSİYONU

ÖZET

Klasik Kürt edebiyatı, kürt okuyucularının yaşamında önemli bir yere sahiptir. Yazılı Kürtçe, klasik edebiyat sayesinde yaşamını sürdürüp günümüze kadar gelmiştir. Birçok müderris ve medrese talebesi klasik Kürt edebiyatını medreselerde öğrenmiş ve bu medreseler sayesinde bir fırsat bulup kendi eserlerini oluşturmuşlardır.

Bu müderrislerden bir tanesi de Halife Yusuf'tur ki medreseler sayesinde eserlerini ortaya çıkartmıştır. Halife Yusuf Bazîd'te dünyaya gelmiş olup eğitim ve yaşadığı dönemin sebeplerinden dolayı yaşamını başka yerlerde sürdürmüştür. Siirt, Cizre vb. medreselerde yaşamını sürdürmüş olup sonradan Bazîd'e dönmüş ve orada hayatının son dönemine kadar yaşamıştır.

Birçok klasik Kürt edebiyatçısı gibi, Halife Yusuf da eserlerini Arap alfabesini kullanarak Kürtçe yazmıştır. Bu eserlerden bir tanesi de tezimizin konusu olan *Feraiz* adlı eseridir. Bu eser daha çok medrese talebeleri için bir ders kitabı niteliğini taşımaktadır. Söz konusu eser islami şartlara göre mirasın paylaşımı hakkındadır. Mirasın kime, ne şekilde ve ne kadar dağıtılacağı açıklanmıştır. Eserde Kürtçe ve Arapça dilleri birlikte kullanılmıştır.

Anahtar Kelimeler : Halife, Halife Yusuf, Feraiz, Edebiyat, Kürt Edebiyatı

Sayfa Sayısı : 143 + VII

Tez Danışmanı : Dr. Öğr. Ü. Nesim SÖNMEZ

Master Thesis

Rabia ORAK ELÇİÇEK

**YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES**

July - 2019

**THE TRANSCRIPTION OF THE KHALIFA YUSUF'S BOOK
WHICH NAME IS THE *FERAIZ***

ABSTRACT

Classical Kurdish literature has an important place in the life of Kurdish readers. Kurdish writings has survived to the present day thanks to classical literature. Many imams and madrasah students learned Classical Kurdish Literature in madrasas and thanks to these madrasas they found an opportunity and created their own works.

One of these imams is Khalifa Yusuf, whose works has come into view thanks to the madrasas. Khalifa Yusuf was born in Bazîd and lived elsewhere due to education and the reasons for his time. He lived in madrasahs in places like Siirt and Cizre, then returned to Bazid and passed away.

Like many classical Kurdish writers, Khalifa Yusuf wrote his works in Kurdish language and Arabic alphabet. One of these works is Feraiz. This work is more of a textbook for madrasah students. It is based on the sharing of the property or in other words the leagacy of the dead according to Islamic conditions. Who has a share of what has been explained in a very detailed way. In this work, both Kurdish and Arabic languages are used together.

Key Words : Khalifa, Khalifa Yusuf, Feraiz, Literature, Kurdish Literature

Quantity Of Page : 143 + VII

Supervisor : Dr. Nesim SÖNMEZ

NAVEROK

KURTE	i
ÖZET	ii
ABSTRACT	iii
NAVEROK	iv
KURTEBÊJE	vi
PÊŞGOTIN	vii
DESTPÊK	1
1. JIYANA XELÎFE YÛSIF Û REWŞA POLÎTÎK A SERDEMA WÎ	3
1.1. Rewşa Bazîdê Ya Sîyasî Û Civakî Ya Wê Serdemê	3
1.2. Rewşa Perwerdehiyê Di Wê Serdemê De	5
1.3. Jiyana Xelîfe Yûsif	8
1.3.1. Serdema Bazîdê.....	9
1.3.2. Serdema Sêrtê û Cizîrê.....	10
1.3.3. Malbata Xelîfe Yûsif.....	12
1.3.4. Nav û Mexlesên wî	13
1.3.5. Xwendina Wî	14
1.4. Berhemên Xelîfe Yûsif	14
1.4.1. Îrşad'ul Îbad (Îlmîhala Şafîî).....	15
1.4.2. Teqrîz (nezmên olî û tesewufî)	16
1.4.3. Usûla Meratîba Hisabê (Rîsalet'ul Hisab/Matematik).....	16
1.4.4. Mecmeû'ul Mesailîş-Şer'îye Bi Lîsanê Kurdiye	17
1.4.5. Tuhfet'us Sibyan	17
1.4.6. Tuhfet-uz Zakirîn	17
1.4.7. Kîtab'ul Feraîz	18
1.4.8. Tecwîd'l Qur'an.....	21
1.4.9. Eqîdeya Îmanê (Eqîdetu'l îman)	22
1.4.10. Xutbe	22
1.4.11. Tuhfet'ul Amilîn (Ilma Fiqhê Ya Mezheba Şafîyê).....	23
1.4.12. Tuhfet'ul Îxwan.....	23

2. KESAYETÎ Û ZİMANÊ XELÎFE YÛSIF Ê EDEBÎ	25
2.1. Kesayetiya Xelîfe Yûsif.....	25
2.2. Aliyê Wî Yê Helbestvaniyê	26
2.3. Edîbên Ku li ser Xelîfe Yûsif Tesîr Kirine.....	30
2.3.1. Ehmedê Xanî.....	30
2.3.2. Melayê Bateyî	32
2.3.3. Mele Xelîlê Sêrtî	33
2.4. Zimanê Xelîfe Yûsif	33
2.4.1. Taybetiyên Devoka Serhedê	34
2.4.2. Taybetiyên Devoka Botan.....	35
2.5. Hêmanên Erebî, Farisî û Tirkî.....	36
2.5.1. Unsûrên Erebî	36
2.5.2. Unsûrên Farisî	36
2.5.3. Unsûrên Tirkî	37
3. METNÊN TRANSKRÎPSÎYONÊ	38
ÇAVKANÎ.....	85
PÊVEK	88

KURTEBÊJE

- c.** : cîld
- hb.** : Heman berhem
- hwd.** : her wekî din
- j.** : jimar
- K.T.** : Komara Tirkiyeyê
- M.T.** : Mes'ele Tu Bizan
- r.** : rûpel
- weş.** : Weşanxane

PÊŞGOTIN

Xelîfe Yûsif berhemeke giranbuha ya bi navê Kîtab'ul Feraîzê daye wêjeya Kurdî û ev berhem diyarî medreseyanê Kurdan kiriye. Gelek feqe û mela bi vê pirtûkê xwendine û ders dane. Naveroka pirtûkê li ser parkirina mîrate yanê malê miriyan e ku bi awayekî berfireh hatiye vegotin. Ev berhem di herêma Bazîdê de di medreseyan de wek çavkaniyek hatiye bikaranîn.

Sedema hîlbijartina me ya vê mijarê hêsantirkirina xwendina vê berhemê bi tîpên latînî ye. Xwendevanên ku nikarin bi tîpên erebî bixwînin, dê bi awayekî hêsantir bikarin ji vê xebatê fêhm bikin.

Girîngiya vê xebatê ev e ku heta niha kêma kesa bala xwe daye ser û lêkolînên akademîk û xebateke berfirêhî li ser nehatiye kirin. Her wiha xebatên derbarê Xelîfe Yûsif û berhemên wî de ku hatine latînîzekirin pir kêma in.

Xelîfe Yûsif melayek Kurd bû ku xwedî hişmendiya zimanê Kurdî bû. Her çiqas jiyana wî li ser xwendin û nivîsandina pexşan û nezmê dabûr jî be, ji aliyê raya giştî ya Kurdan ve zêde nehatiye naskirin. Armanca vê xebatê ev e ku em hem Xelîfe Yûsif hem jî berhema wî ya qedirbilind bi xwîneran bidin nasîn.

Ji bo alîkarî, pêşniyarî û rênîşandaniyê, di serî de ji şewirmendê xwe mamosteyê hêja Dr. Öğr.Ü. Nesim SÖNMEZ re gelek spasiyan dikim. Gelek spasiyên xwe li birayê xwe Dr. Suat ORAK re dikim ji bo piştevaniya wî. Bi taybetî spasiyên herî mezin li xwişka xwe Sevda ORAK REŞİTOĞLU dikim ku di nav ew qas karên xwe de hem teza min sererast kir, hem rê û rêbaziya teze da nîşanî min û hem jî piştevaniya min kir. Her wiha spasiyên xwe û minnetariyên xwe li Mele Emerê Avetaxî dikim ku dema xwe ya hêja ji bo me veqetand û alîkariya transkrîpsiyonê kir. Ez gellek spasiyên xwe ji bo Mele Zahîr KOLDAŞ dikim ku dema wî jî tunebû ji bo min dem peyda kir. Dîsa ji bo alîkariya Mele Nesrullah gelek spas dikim. Her wiha spasî ji bo alîkariya hevserê xwe Şaban dikim. Dawiyê spasiyên xwe ji hevala xwe Nazenîn Saadet GÜLER re pêşkêş dikim ji bo hebûn û alîkariya wê ya manewî.

DESTPÊK

Xelîfe Yûsif di navbera salên 1885 û 1965an de jiyaye. Li Bazîdê hatiye dinyayê, jiyana xwe li bajarên curbicur domandiye û di dawîyê de dîsa li Bazîdê çûye ser dilovaniya xwe. Xelîfe Yûsif mirovek xwedî hiş û raman bûye. Van fikr û ramanên xwe yê ku bi dîn re jî eleqedar in, pêşkêşî xwendevanên xwe kiriye.

Xelîfe Yûsif alimekî kurd e ku di medreseyan de ilmê dîtiye her weha gelek berhemana ji bo feqe û melayan amade kiriye. Gelek berhemên wî di medreseyan de wek pirtûka dersê hatine bikaranîn lê bedbextiyêke mezin e ku navê wî pir kêmtir hatiye naskirin. Alimek pir zana û zîrek bûye ji ber ku ji wan kêmtir kesan e ku îcazeta du terîqetan bi hev re hildaye.

Xelîfe Yûsif ji Bazîdê bigre heta Sêrt û Cizîrê li gelek deran jiyana û perwerdehiya xwe domandiye. Ji ber vê yekê ku maye bin bandora devok, çand û alimên ku li wan deran jiyane. Em dikarin vê bandorê di berhemên wî de jî bibînin. Her wiha tesîra mîrê wêjeya Kurdî Ehmedê Xanî li ser wî pir çêbûye û rêya wî şopandiye.

Wêjeya Kurdî ya Klasîk dema xwe ya zêrîn di serdema medreseyan de dîtiye. Di wan demên zêrîn de gelek berhemên tîr û tijî bi zimanê Kurdî û bi tîpên Erebi hatine nivîsandin. Xelîfe Yûsif jî yek ji wan wêjeyanan e ku berhemên xwe bi zimanê Kurdî û bi tîpên Erebi nivîsandiye. Ew dem her çiqas jî bo wêjeyê zêrîn be jî, ji bo standartbûyîna jiyana pir xerab bûye. Serdema ku berhemên xwe daye, serdemek gelek zor bûye. Gelê Kurd ji ber aborî, civakî û ramyarî gelek zext û zordarî kişandiye. Yek ji wan jî Xelîfe Yûsif bûye ku jiyaneke zehmet derbas kiriye.

Di jiyana Xelîfe Yûsif de qonaxa herî girîng yekemîn şerê cihanê bû. Ji ber ku di wê serdemê de hem kesîretiyê dît û hem jî koçberiyê. Em nikarin bêjin ji her awayê ve ev koçberî xerab bûye. Ji ber ku li cem aliman ilma xwe hilkişandiye asteke bilind û qedandiye. Li cem Mele Hamîdê kurê Mele Xelîlê Sêrtî ilma feraîzê hîn bûye. Tovê berhema wî ya *Feraîzê* ku em li ser xebitîne, li wir hatiyê avêtin.

Me jî di vê xebatê de hewl da ku em *Feraîzê* bi tîpên latînî bidin naskirin, her wiha ji çanda medreseyan derxin û pêşkêşî xwendevanan bikin. Xebatên ku bi tîpên Erebî hatine kirin, ji aliyê kêma kesana ve tîna fêmkirin û xwendin. Mebesta me ev e ku em bi tîpguhêziyê xwendina vê berhemê hêsantir bikin da ku herkes bikare jê îstîfade bike.

Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekemîn de me lêkolîn û xebata xwe li ser jiyana û rewşa serdema ku Xelîfe Yûsif tê de jiyaye kiriye. Di beşa duyemîn de em li ser kesayetî û zimanê wî yê Erebî sekinîn. Di beşa sêyemîn û beşa dawiyê de me cihê daye metnêna transkrîpsiyonê.



1. JIYANA XELÎFE YÛSIF Û REWŞA POLÎTÎK A SERDEMA WÎ

Di vê beşê de em li ser jiyana Xelîfe Yûsif rawestiyên herweha em li ser serdema ku Xelîfe Yûsif tê de jiya ye bi aliyê siyasî, cîvakî ve ku astengiya li ser rewş û perwerdehiyê çêbûye sekinîn e.

1.1. Rewşa Bazîdê Ya Siyasî Û Civakî Ya Wê Serdemê

Agirî wekî pirek e di navbera Anatolî û Îranê de. Her wiha Asyaya Navîn jî çûyîn û hatinên xwe, têkiliyên xwe yê siyasî li ser rêyên Agirî derbas dikirin. Agirî şahidê gelek bûyerên siyasî, dîrokî û çandî bûye. Bazîd jî wek navçeyek Agiriyê cîranê îranê û cihê gumrikê ye herweha ji bo leşkerî û ewlehî jî xwediyê rolek grîng e.¹

Bazîd ji aliyê bazirganiyê ve xwediyê roleke girîng bûye û Qesra Îshaq Paşayê jî gelek girîng bûye di dema xwe de. Dema ku derek dibe xwediyê roleke girîng, li wir pirsgerêkên civakî û siyasî her tim çêdibe. Tehrîbatên mezin derdikevin holê. Wekî her devereke Kurdistanê, em dikarin bêjin li hêrema Serhedê jî rewşa xirab a ji aliyê aborî, civakî û siyasî û her wiha ji aliyê jiyana mirovahiyê ve jî derketiye holê. Gelek sedem hene, yek ji van sedeman têkiliya osmaniyan a bi cîranên xwe re ye, bi taybetî bi rûs, ermenî û îraniyan re bûye pirsgerêke mezin li ser jiyana kurdan. Beriya yekemîn şerê cîhanê, di dema wî de û piştî wî jî, gelek asîmilasyon, serhildan, qirkirin û şer çêbûne. Ev tevahî jî li ser jiyana kurdan bûne rewşeke xirab û astengiyeke mezin.²

Di salên 1877-78an de, di şerê osmanî û rûsan de gelê kurd rastî xirabiyeke gelek mezin hat. Di vî şerî de leşkerên rûsî heta nivê Kurdistanê şer kirin. Di vê pêvajoyê de, leşkêrên rûsî dîtî ku kurd gelek jîrek û bi xîret in. Ji ber vê xwestinê vî rewşê jî bo berjewendiya xwe biemilînin.³

Rûsan ji kurdan hengek (alay) ava kir û bi wêrektî ew koçî Rûsyayê kirin. Ev jî bû sedema koçberiya çend eşîrên Kurdan ku çûne Qafqasyayê. Osmanî jî wekî

¹ <https://islamansiklopedisi.org.tr/dogubayazit>

² Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, çap 2., cilt 1., Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 245.

³ Muhammed Emin Zeki Beg, *h.b.*, r. 234.

Rûsan, ji eşîrên kurdan komên leşkeran çêkirin. Piştî şerê di navbera Rûs û Osmaniyan de, ev rewş zêdetir bû. Li Kurdistanê piştî qelsbûna hikumetê ewlehî jî qels bû û li gorî peymanê Berlînê ya xala 61ê, heke êrişên kurd û çerkezan li ser ermeniyan çêbe, divê reformek ji bo ewlehiyê bihata avakirin. Mixabin Osmaniyan jî di vê deverê de hinek sist tevgeriyan. Lê ev jî bû sedema serhildana Ermeniyan. Kurd û Ermeniyên ku heta wê demê bi hev re di nav aşîfî û xweşîtiyê de dijiyan mixabin piştî vê bûyerê ketine pêşîra hev. Ev jî bû sedema Siltan Ebdilhemidê II. an ku di navbera eşîrên Kurdan de Alayên Hemîdiyeyê damezirand.⁴ Ew Alayên Hemîdiyeyê ku hejmara wan ji şêstan jor bûn heta Yekemîn Şerê Cîhanê jiyana xwe domandin. Ewan bi Ermeniyan re gelek şerên qirêj çêkirin, kuştin û talankirinên pir dijwar di navbera Kurd û Ermeniyan de çêbû.⁵

Di sala 1890î de, serdarê Alayên Hemîdiyeyê Eyûp Paşa û zilamên xwe ve li gundên Agiriyê êriş dikirin li ser malên Ermeniyan û wan direvandin. Li şûna wan zilamên xwe cih dikirin, ew jî dibû sedema koçberiyên Ermeniyan di rêya Rûsyayê de. Gelek bûyerên qirêj çêbû di navbera Kurd û Ermenan de. Piştî sala 1915an bi dagirkeriya Rûsan re zordestiya Ermeniyan a li ser Kurdan zêde bû, ev şerê qirêj heta 1920an domand.⁶

Ev bûyer têra xwe zerar da gelê Kurd. Ne tenê ev bûyer, her wiha serhildana Şêx Seîd, komkujiya Geliyê Zilanê, serhildana Agiriyê û gelek bûyerên din bû sedema hilweşaneke mezin di jiyana Kurdan de.

Ev serdema ku Xelîfe tê de jiyaye, ji aliyê civakî, perwerdehî, derûnî, siyasî û aboriyê ve gelek serdemek qirêj bûye. Lê hilweşandina herî mezin jixwe Yekemîn Şerê Cîhanê bixwe bû. Kurdên ku Osmanî û Rûsan li herêma wan şer kir, ji xeynî mal û canê xwe, penaberiyê jî dîtin. Seferberiyeye mezin destpê kir. Ji nexweşî, birçîbûn û sefaletê wêdetir, koçî derên din kirin. Ev bûyera ku hate serê Kurdan, hem

⁴ Muhammed Emin Zeki Beg, *h.b.*, r. 235-236.

⁵ Abdulhalim Durma, *Evlîyalar Şehri Ağrı*, Samsun, 2014, r. 4.

⁶ Abdulhalim Durma, *h.b.*, r.5-6

li Îranê, hem jî li Osmaniye xetereyeke wekhev bû.⁷ Xelîfe Yûsif jî di wê serdemê de koçî Sêrtê kiribû.⁸

Di vê serdemê de, hefsed hezar Kurd mecbûrî koçberiyê bûne. Ev bûyer ne ji ber şer bû, ji ber Padişah Mehmet V. bû ku fermanek îmze kiribû. Armanca vî tiştî ev bû ku Kurd li

Anatoliya Navîn, di nav tirkên de ziman û çanda xwe ji bîr bikin û bê asîmîlekirin. Mixabin piraniya wan di rê de ji ber nexweşî, serma û birçîbûnê mirine. Armanca tunekirina Kurdan tenê di mejiyê komara Tirkên de nebû. Her wiha di mînakê Kurdên Anatoliya Navîn de em dibînin ku Osmanî jî di vê fikrê de bûn. Di vê koçberiyê de sêsed hezar can mir.⁹

1.2. Rewşa Perwerdehiyê Di Wê Serdemê De

Di dîroka Kurdan de rola dînê Îslamê gelek girîng e. Di vî warê de rola medreseyan jî gelek girîng e. Ji ber ku ji bo dînê xwe xizmeta herî mezin a perwerdehiyê li medreseyan kirine. Gelek alim, şêx û mela ji van medreseyan derketine. Destpêka edebiyata kurdî ya klasîk jî ji medreseyan derketiye. Alimên Kurdan yê ku ji medreseyan derketine, ji aliyê ilm û zimanê erebî û farisî ve rêzdariyeke mezin hilgirtine.

Medreseyên herî kevn di dîroka Selçûkiyan de, bi rêya wezîrê Alparslan Nîzamulmulk ve hatiye damezirandin. Bi navê “Medreseyên Nîzamiye” hatine nasîn. Lê belê li gorî hinek îdîayan medreseyên Beyhakiye ku li Nişabûrê hatine damezirandin, beriya yê Nîzamiyeyê hatine avakirin.¹⁰

Dîroka medreseyên kurdan jî, ji sed sala dehan bi Selahaddîn Eyûbî destpê kiriye li gorî İbrahim Halil Er ku Kadri Yıldırım vediguhezîne. Perwerdehiya

⁷Yusuf Ziya Döger, *Şeyh Said Harekatı Sonrası Pêcar Tenkil Harekatı 1927*, Nûbihar, İstanbul, 2016, r. 37.

⁸İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, ç. 2, Nûbihar, İstanbul, 2013, r. 468.

⁹Yusuf Ziya Döger, *Şeyh Said Harekatı Sonrası Pêcar Tenkil Harekatı 1927*, Nûbihar, İstanbul, 2016, r. 38-39.

¹⁰Kadri Yıldırım, *Kürt Medreseleri ve Alimleri*, Cilt 1, Avesta, İstanbul, 2018, r. 32.

zimanê Kurdî di nav medreseyan de bi destûra Selahaddînê Eyûbî bûye. Her wiha zimanê Eyûbî bixwe jî bi soranî bûye.¹¹

Li gorî xebatên Kadri Yıldırım ên ku li ser medrese û alimên Kurdan kiriye, medreseyên Kurdan dikare bi sê beşan bê lêkolînkirin: Medreseyên Mîrektiyan, Medreseyên Dergehan û Medreseyên Camî û Hucreyan.¹²

Gelek alimên kurdan li medreseyan perwerdehî dîtine. Piraniya şêxên Neqşîbendî yên kurdan ji Neqşî-Xalidî ne. Mewlana Xalidî Bexdadî xwediyê şêst xelîfeyan bûye û sih kes ji wan Kurd bûne.¹³

Di dawîya sedsala nozdemîn de, mirov dikare bêje ku polîtîkayên Osmanî yên li ser perwerdehiya kurdan bi rêya Padişah Abdulhemîdê II. bi pêş ket. Di dibistanan de her çiqas fikrên Osmanîti hebe jî, bingeha wê li ser tirkperestiyê bûye. Siltan hewl daye ku zimanê tirkî li dibistanan bibe zimanê hevpar.¹⁴

Fikra Siltan Abdulhemîd ew nebû ku qedexeyê li ser zimanên din bike, dixwest Tirkî bêtir belav bibe li cem gel. Li Kurdistanê gelek dibistan hatin damezirandin, lê mixabin ji xeynê çend hebên wan gelek ji wan hatin girtin an jî mane bê erk.¹⁵

Bi tesfîyekirina mirnîşan re, xwendin û perwerdehî gelek paş ve çû. Dema Abdulhemîd derket ser text, gelê Kurd bi derfetên xwe li medreseyan perwerdehî didan zarokên xwe û aboriya wan ji mîrektiyan dihat. Li medreseyan her cure perwerdehî dihat kirin; ilmî, dînî, fenî û hwd. Mixabin piştî modernîzma Osmanî, ev tenê bû cihê perwerdehiya zimanê erebî.¹⁶

Lê belê em dikarin bêjin rola terîqetan jî pir girîng bû li ser medreseyan. Ji ber ku heta dawîya Osmaniyan tesîra terîqeta Neqşîbendiyê li ser medreseyan hebû. Perwerdehî zêdetir li ser dîn bû. Seyda û melayên van medreseyan xwediyê statuyeke

¹¹ Kadri Yıldırım, *h.b.*, r. 37-38.

¹² Kadri Yıldırım, *h.b.*, r. 46.

¹³ Faruk Aslan, *Kürt Diyarının Bilinmeyen Saklı Tarihi, Biladî Ekradî Kurdistan*, Ötekiadam, İstanbul, 2015, r. 154.

¹⁴ Nihat Karademir, *Sultan Abdulhamit ve Kürtler*, Nûbihar, İstanbul, 2014, r. 299.

¹⁵ *h.b.*, r. 303.

¹⁶ *h.b.*, r. 304.

mezin bûn û ders ji aliyê wan ve dihat dayîn bo feqeyan. Di medreseyan de ders bi zimanê kurdî bû.¹⁷

Di vê serdemê de dibistan bê fealiyet bûn. Ji ber ku mamoste tunebûn ku ders bidin. Lê belê di heman dem û welatî de Ermenî gelek bi pêş ve diçûn. Paşdemayîna Kurdan her çiqas girêdayî dibistanên modern jî be, dîsa bûye sedema ku hinek Kurd di medrese û dergehane de bibin xwedî hişmendiyê.¹⁸

Bi vê hişmendiyê gelek serhildan çêbûn, wek serhildana Seyîd Ubeydullahê Nehrî, Şêx Ebdulselam Barzanî, Şêx Şahabeddîn Hîzanî û Şêx Mehmûd Berzencî. Piştî rakirina xelîfetiye jî wek Şêx Seîdê kal, serhildanê çêkirin. Ev tevek mela û şêxên terîqetan bûn.¹⁹

Piştî Komara Tirkiyê, bi zagona Tevhîd-î Tedrîsadê medrese hatin girtin. Lê belê perwerdehî bi xef jî be berdewam kir. Perwerdehî heta îro hat bi saya feqe û meleyên medreseyan. Mesrefên perwerdehiyê ji aliyê gel ve dihat peyda kirin. Di medreseyan de çend odeyên biçûk ên bi navê “hucre” dihatin çêkirin ji bo feqeyan. Ew der wek medrese dihatin bikaranîn.²⁰

Di dewra Abdulhemîd de yek ji projeyên herî girîng jî dibistana eşîran bû. Armanca damezirandina wî her çiqas perwerdekirina zarokên eşîra Ereban a bi terbiyeya Osmanî be jî hizra fêrkirina tirkîtiyê, xwedîkirina wan wek subay, mamoste û qaymaqam be jî zarokên Kurdan jî li wan dibistanan hatine perwerdekirin. Li gorî çend lêkolîneran, mebesta Siltan bi tenê îttîhadî îslamî nebû, fikra wî ew bû ku asîmîlasyonê li ser zarokan çêkin. Zarokên Ereban bikin Tirk an jî sîstema “devşîrme” bidomîne. Zarokên Kurd û Ereban wek leşkerên parastina Osmanîyan perwerdehî bike.²¹ Li gorî Musa Anter jî ew dibistan di Komara Tirkiyê de wek “Yatılı Okulları” hat damezirandin.²²

¹⁷ *h.b.*, r. 304.

¹⁸ *h.b.*, r. 309.

¹⁹ Mele Mihemed Kêrsî, *Medresa Kurd û Bandora wê Li Ser Cîvakê*, Nûbihar, h. 18, sal. 2014, r. 34.

²⁰ Arafat Yaz, *Cumhuriyet Dönemi Müderrislerinden Silvanlı Molla Ali Zila Hayatı, Eserleri Ve Kişiliği*, Sosyal Bilimler Enstitüsü İslam Tarihi Ve Sanatları Anabilim Dalı Yüksek Lisans Tezi, Diyarbakır, Dicle Üniversitesi, 2012, r. 10.

²¹ Nihat Karademir, *Sultan Abdulhamit ve Kürtler*, Nûbihar, İstanbul 2014, r. 327.

²² Musa Anter, *Hatıralarım*, 2. Baskı, Aram Yayınları, İstanbul, 2011, r. 251.

Hinek tişt wek fikra Siltan nebûn. Di van dibistanan de hinek kes heta Komara Tirkiyeyê sêdaqata xwe bi rejîme re domandin û dijî serhildanên Kurdan de cih girtin. Mînak Binbaşî Qasim û Elî Seîb. Lê belê gelek rewşenbîrên Kurdan jî ji van dibistanan derketin. Wekî Xelîlê Cibrân, Yûsif Ziya Beg û Îhsan Nûrî Begê ku serokê serhildana Agiriyê bû.²³

Di van salan de weşangeriya Kurdan jî baştir dibû lê ya herî baş piştî şerê cîhanê bû ku neteweyên Kurd komeleyan ava kirin. Êdî bi awayekî xurttir hebûna xwe ya siyasî derxistin holê.²⁴

Piştî Yekemîn Şerê Cîhanê Kurdan gelek felaket dîtîn. Mirin, birçî man û ji cih û warê xwe man. Di sala 1917an de Kurdên li derdorê Amedê, koçî Heleb, Misil û Edenê dibûn. Di rê de mirin, birçîbûn û nexweşî gelek didîtîn. Di sala 1921ê de serhildana Dêrsimê, 1925an de serhildana Şêx Seîd, 1930î de serhildana Îhsan Nûrî Paşa, Geliyê Zilan û Yekemîn Şerê Cîhanê rewşa wan gelek xirab kir. Xelîfe Yûsif jî para xwe ji van rewşên ne xweş hildaye û koçî Sêrtê kiriye.²⁵

Piştî şerê cîhanê bi avakirina komara Tirkiyê ve pergalek yekniyadîyê hatiye avakirin herweha axaftina yekzimanî jî yek ji van bû. Ji xeynî van bi zagona “Mufetişiya Ûmûmî” re gelek axa, şêx, serok û hwd. koçberî bajarên Rojavayê dikin.²⁶

1.3. Jiyana Xelîfe Yûsif

Xelîfe Yûsif di sala 1885an de li gundê Zengezorê ku girêdayî bajarê Agirî yê Bazîdê ye hatiye dinyayê. Di sala 1965an de dîsa li Bazîdê çûye rehma Xwedê.²⁷ Li gorî Doç. Dr. Mehmet Salih Geçit, Xelîfe Yûsif di sala 09.02.1965an de çûye rehma Xwedê. Her wiha saet û roja koçkirina wî jî diyar kiriye, li gorî wî Xelîfe roja sêşemê

²³ Ahmet Kahraman, “Kürt İsyânları”, *Kürt Tarihi Ve Kültürü Dizisi 4*, Evrensel Basım Yayın, İstanbul 2003, r. 47.

²⁴ Mesut Arslan, *Di Dewra Osmaniyan de Weşangeriya Kitêbên Kurdî(1844-1923)*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2014, r. 154.

²⁵ Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, çap 2., c. 1., Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 45.

²⁶ Adil Yıldırımçakar, *Umrek û Mirazek Bedüzzeman û Medresetuzzehra*, Nûbihar, İstanbul, 2018, r. 31.

²⁷ Bi Teshîha Ebdulselam Bêcirmanî û Huseyn Şemrexî, *Îrşad'ul İbad*, Nûbihar, İstanbul, 2015, r. 8.

saet di 02.00yan de, di heştê saliya xwe de çûye rehma Xwedê.²⁸ Her çiqas Geçit dîrokeke diyar dabe jî, li gorî Zeynelabîdîn Zinar ku di pirtûka xwe ya *Gencîneya Çanda Qedexe* de diyar dike, dîroka jidayîkbûn û koçkirina Xelîfe Yûsif ne diyar e.²⁹

Li gorî lêkolînên Geçit, navê gundê wî Zengezor e ku bi tirkî ewil wek “Sarıgül Mahallesi” hatiye qeydkirin. Lê piştî wexta ku Komara Tirkiyeyê navê kuçeyên welayetan guherandiye, navê wir kiriye “Sarıdana”. Lê belê di 2009an de Şaredariya Bazîdê dîsa navê wî yê berê, angî “Sarıgül Mahallesi” lê kiriye.³⁰ Ev tax pir nêzîkî Bazîdê ye, ji ber vê Şaredariya Bazîdê ew der ne wek gund, lê belê wek taxekî qeydkiriye.³¹ Di pirtûka *Evliyalar Şehri Ağrı* de navê gundê Xelîfe bi tirkî wek “Üç Murat” hatiye nîşandan.³² Her wiha di pirtûka *Ağrı Ziyaretgahları* de jî navê “Üç Murat” derbas dibe û tirba wî jî li gundê Seslitaş (Çalganî Tacdî) e ku kîlometreyek ji rê dûr e.³³

1.3.1. Serdema Bazîdê

Xelîfe piştî xwendina xwe ya li cem melayê gundê xwe, derbasî Bazîdê dibe û diçe cem Şêx Mihemedê Celalî. Wekî ku tê zanîn, Celalî pir eşîreke bi nav û deng e. Li gorî agahiyên kurê Şêx Mihemed Nizameddîn Arvasî, Şêx Mihemedê Celalî bi keça Seyîd Evdilezîz Arvasî re zewicî bû³⁴, ew bixwe jî Arvasî bû. Pismamê Hecî Salih Begê reîsê eşîra Celaliyan bû.³⁵ Demeke dirêj di nav Celaliyan de derbas kiriye. Ji ber vê yekê jê re Celalî tê gotin. Di sala 1851ê de hatiye dinyayê û di sala 1914an de li Sêrtê çûye rehma Xwedê. Ji ber aloziya şerê cîhanê koçî Sêrtê kiribû. Yazdeh kur û neh jî keçên wî hebûn.³⁶

Şêx Mihemed gelek feqe elimandine, yek ji van jî Bedîuzeman Seîd Nursî ye. Seîd Nursî di sala 1892yan de, hêj çardehsalî ku bi eqil û hişê xwe bala gel dikîşîne -

²⁸ Mehmet Salih Geçit, “Halîfe Yusûf Topçu (1885-1965) ve Akide Metni”, *Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, C. 4, Sayı 1, 2018/133-164, r. 134.

²⁹ Zeynelabîdîn Zinar, *Nimune Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Çapa Pêşî, Yekîtiya Nivîskarên Kurd Stockholm, 1991, r. 200.

³⁰ Mehmet Salih Geçit, *h.b.*, r. 134.

³¹ *h.b.*, 134.

³² Abdulhalim Durma, *Evliyalar Şehri Ağrı*, Samsun, 2014, r. 58.

³³ Taylan Köken, *Ağrı Ziyaretgahları*, www.sosyodenemeler.blogspot.com, 2013, r. 8.

³⁴ M.Salih Geçit, *h.b.*, r. 88.

³⁵ Süleyman Çevik, *Bi Kurê Xelîfe Yûsif Şêx Mustefa re Hevpeyvîn*, c. 8, j. 89, Nûbihar, İstanbul, 2003, r. 9.

³⁶ Abdulhalim Durma, *Evliyalar Şehri Ağrı*, Samsun 2014, r. 52.

ku alimek wek wî nedîtine, diçe cem Şêx Mihemed Celalî û sê meh li wir ders dibîne. Wê demê jê re Mele Seîd dihat gotin û piştî sê mehan îcazeta xwe hildide, diçe Sêrtê.³⁷

Dema ku Mele Seîd li cem Şêx Mihemed perwerdehî dibîne, wê demê Xelîfe Yûsif jî li wir perwerdehî dibîne. Wê çaxê Xelîfe Yûsif her roj ji Zengezorê heta Bazîdê diçû û ji Şêx Mihemed ders didît.³⁸

Mele Seîd her şevên pêncşeman diçû li ser gora Ehmedê Xanî. Şêx Mihemed ketiye şikê ka ew diçe ku. Xelîfe Yûsif û Mele Şerîf li pey wî şandiye. Ew jî wexta çûne, dîtine ku Mele Seîd bixwe xwe diaxive. Dibêje “belê Seyda, belê Seyda!”. Vê rewşê jî Şêx Mihemed re dibêjin û Şêx Mihemed jî ji wan re dibêje bila êdî tu kes tevî Seîd nebe.³⁹

Şêx Mihemed Celalî xwediyê roleke girîng bûye li cem dewletê jî. Ji ber vê xwendekarên wî wek tehsîldarên bilind dihatin hesabandin û ji leşkeriyê muaf dibûn. Xelîfe Yûsif jî yek ji wan bû ku ji leşkeriyê muaf bûbû.⁴⁰

1.3.2. Serdema Sêrtê û Cizîrê

Di dema şerê cihanê de wekî gelek hemwelatîyên xwe, Xelîfe jî jiyana xwe ji axa xwe dûr domandiye. Koçî Sêrtê kiriye û çûye medreseya Mele Xelîlê Sêrtê. Xelîfe Yûsif li cem kurê Mele Xelîl, Mele Hemîd ilma xwe bi pêş xistiye. Bingeha pirtûka wî ya bi navê *Feraîz* ku em li ser dixebitin, di wê serdemê de li cem Mele Hemîd hatiye avêtin. Yanî bingeha xwe li wir xurt kiriye.⁴¹

Seydayê Mele Hemîd bi xwe darsa wî daye. Mele Hemîd ew ji bo meletiyê pêşniyaz kiriye da ku bikare aboriya xwe jî bidomîne. Êdî ji Xelîfe re “Seyda” dihat gotin. Mele Hemîd ji Mele Mehmûd re nameyek şandiye da ku Xelîfe li derekê bike

³⁷ <http://www.risaleinurenstitusu.org/bediuzzaman-said-nursinin-kronolojik-hayati/>

³⁸ Abdulhalim Durma, *Evlialar Şehri Ağrı*, Samsun 2014, r. 52.

³⁹ Durma, *h.b.*, r. 58.

⁴⁰ Mehmet Salih Geçit, *Halife Yusuf Topçu (1885-1965) ve Akide Metni*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, Cilt 4, Sayı 1, Ağrı, 2018/133-164, r. 153.

⁴¹ Süleyman Çevik, *Bi Kurê Xelîfe Yûsif Şêx Mustefa re Hevpeyvîn*, Nubihar, Hejmar 89, Havin 2003, r. 9.

mele.⁴² Mele Mehmûd jî jê re li gundekî Cizîrê yê bi navê Mûdîlê cih dibîne ku li wir melatî bike. Xelîfe Yûsif li wî gundî zêdetirî pênc salan jiyaye û melatî kiriye. Gundiyar gelek jê hez kirine, lewre pêywira xwe gelek baş pêk aniye.⁴³

Navbera Xelîfe û Seydayê Cizîrê Şêx Mihemed Seîd gelek baş bû. Li cem wî fikra tesewifê emel dikir. Di 38 saliya xwe de, di sala 1923yan de îcazeta xwe ya yekemîn a tesewifê ji Şêx Mihemed Seîd girtiye. Ew jî Şêxê terîqeta Neqşibendiyê bû. Xelîfe Yûsif cara yekem xelîfetiya terîqeta Neqşibendiyê wê çaxê hildaye.⁴⁴

Xelîfe bê rawestan emelê xwe yê tesewifê domandiyê. Li ser perwerdekirina nefsa xwe mijûl bûye. Emelkirina xwe li cem ehlê tesewifê Şêx Îbrahîm Heqiyê Xalidiyê Neqşibendî berdewam kiriye û cara duyemîn xelîfetiye, ango îcazeta terîqeta Neqşibendiyê dîsa di sala 1931ê de girtiye.⁴⁵

Li gorî edeba dergah û xilwexaneyan, yên ku ji yekê zêdetir dibe xwediyê îcazetê, dibe “murşidê kamil”. Xelîfe jî li gorî vê fikrê bûyê “murşidê kamil”.⁴⁶

Piştî van Xelîfe xebatên xwe domandiyê. Çûye Bexdayê li ser gora Şêx Ebdilqadirê Geylanî. Li wir Şêx Ehmed Şerafettîn el-Qadirî xelîfetiya Qadiriye jî dayê.⁴⁷ Ji ber ku îcazeta du terîqetan hildaye jê re “Zu’l Cenaheyn” hatiye gotin.⁴⁸

Piştî van astên bilind, Xelîfe êdî perwerdehiya xwe xilas kiriye û veqeriyaye cih û warên ku jê dayîk bûye. Li Bazîde gelek karên irfanî kiriye. Rê û rêbaz nîşanî gel kiriye û ji wan re melatî kiriye. Xelîfe jî di rêya Ehmedê Xanî de çûye û berhemên xwe bi zimanê Kurdî nivîsiye. Di çil û pêncî saliyên xwe de di bin zext û zorên li ser zimanê Kurdî de gelek pirtûk nivîsîne bi vî zimanî. Piştî avakirina medreseya xwe jî Kurdî fêrî gelek şagirtan kiriye.⁴⁹

⁴² Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî, Stenbol, 1992, r. 486.

⁴³ Mihemed Sidiq Candan, *Xelîfe Yûsif û îrşad’ul îbad a Wî*, Kovara Nûpelda, Hejmar 6, Wan, 2011, r. 51.

⁴⁴ *h.b.*, r. 51.

⁴⁵ Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî, Stenbol, 1992, r. 486.

⁴⁶ Kovara Nûpelda, *h.b.*, r. 51.

⁴⁷ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Ūsif*, Kurd-kav, Stockholm, 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>.

⁴⁸ Mehmet Salih Geçit, *Halîfe Yûsif Topçu (1885-1965) ve Akide Metni*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, c. 4, Hejmar 1, Ağrı, 2018/133-164, r. 136.

⁴⁹ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Ūsif*, Kurd-kav, Stockholm, 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>.

Xelîfe Yûsif pir evîndarê dînê xwe bûye. Çil salan (Siyamud Dehr) bi rojan rojî girtiye û bi şevan jî bê rawestan nimêj kiriye. Xelîfe îbadetên xwe li gorî edetên terîqetan nekiriye, lê belê bi awayekî mutewazî ferz û sinetên xwe aniye cih. Îbadetên xwe bi gelê xwe re kiriye. Ji ber vê jê re “kalko” an jî “bavo” hatiye gotin.⁵⁰ Xelîfe Yûsif bi emrekî têr û tijî, bi îbadet, zikr û selawetên xwe di sala 1965an (09.02.1965) de roja sêşemê saet di 02.00yê şevê de û di 80 saliya xwe de çû rehma Xwedê.⁵¹

1.3.3. Malbata Xelîfe Yûsif

Navê bavê wî Şerîf Axa ye ku ew jî kurê Ebdullah e.⁵² Şerîf Axa di qesra Îshaq Paşayê de wekî topkar dixebitî. Di nav civatê de malbateke rêzdar bûn. Ji aliyê herêma xwe ve baş dihatin nasîn. Di dema hikumdariya Îshaq Paşa de di qesrê de wek serokê topkaran kar dikir û wek “Topçuzade” dihat naskirin.⁵³ Ji ber vê, navê Xelîfe Yûsif bi rastî Yûsuf Topçuoğlu an jî Topçu ye.⁵⁴

Şerîf Axa di Yekemîn Şerê Cîhanê de çûye Îranê û li wir wefat kiriye. Li gundê Erebaşê de hatiye defînkirin.⁵⁵

Navê dayîka wî jî Xanim bûye. Ew jî ji gundê Korîmayê girêdayî Bazîdê bûye.⁵⁶ Hevjîna Xelîfe, Fatma Xanim jî dîsa ji heman gundê (Zengezur) bûye û navê bavê wê Ebdulrezaq bûye. Xwedê Teala şeş zarok nesîbê Xelîfe kiriye. Ji wan zarokan sê keç û sê kur in.⁵⁷

Navên kurên wî Şêx Mistefa, Şêx Mihemed û Mihemed Nûrî ne. Mezinê wan Şêx Mistefa di sala 1923yan de li gundê Cizîrê, Hêdilê ku niha bi navê “Bereketli” tê nasîn, hatiye dinyayê. Ew jî wek bavê xwe di rêya Ehmedê Xanî de diçe û xwedî

⁵⁰ Mehmet Salih Geçit, *Halife Yusûf Topçu (1885-1965) ve Akide Metni*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, Çerm 4, Hejmar 1, 2018/133-164, r. 136.

⁵¹ Kadri Yıldırım, *Kürt Medreseleri ve Alimleri*, Cilt 1, Avesta, İstanbul, 2018, r. 290.

⁵² Bi Teshîha Ebdulselam Bêcirmanî û Huseyn Şemrexî, *Îrşad'ul Îbad*, Nûbihar, İstanbul, 2015, r. 8.

⁵³ Mihemed Sidiq Candan, *Xelîfe Yûsif û irşad'ul îbad a Wî*, Kovara Nûpelda, Bihar Hejmar 6, Wan 2011, r. 51.

⁵⁴ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Ūsif*, Kurd-kav, Stockholm, 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>.

⁵⁵ Bi Teshîha Ebdulselam Bêcirmanî û Huseyn Şemrexî, *Îrşad'ul Îbad*, Nûbihar, İstanbul, 2015, r. 8.

⁵⁶ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Ūsif*, Kurd-kav, Stockholm, 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>.

⁵⁷ Ali Karadeniz, *Xelîfe Yûsif Kî Ye?*, c. 8, j. 89, Nûbihar, İstanbul, 2003, r. 8.

ilmeke bêhempa ye. Piştî sala 1946an de ku navê melatîyê hildide, vedigere welatê xwe û xêr û xiryatan dike. Dibe sedema avakirina camî û medreseyan. Ji Mihemed Seîd Seyda el-Cezîrî îcazeta neqşîbendîyê digire û xebatên xwe li Bazîdê wekî muftî didomîne. Îcazeta piştî mirina bavê xwe hildide. Li cem gelê xwe mirovekî zana û bi qedr bûye. Jê re “bavo” anjî “galxo” dihat gotin. Li cem bavê xwe erebî û farisî jî hîn bûbû. Li ser rêya heqê diçû. Deh zarokên wî hebûn. Di sala 20.10.2004an de çû rehma Xwedê. Piştî wî zarok û neviyên wî kullîye vekirin û berdewama xêr û xiryatan kirin.⁵⁸

Helbet Şêx Mistefa bi tenê xizmeta gel nekiriye, her wiha çend berhemên bavê xwe jî ji kurdî wergerandine tirkî, erebî û farisî. Li ser wan bi awayekî berfireh xebitiye. Navên berheman ev in: Îrşad-ul Îbad, Tuhvetu-z Zakirîn, Tuhvetul Îhvan, Tuhvetul Amilîn, Feraîz, Tecvîd, Manzûm û Teqrîz.⁵⁹

Şêx M. Nûrî jî wekî birayê xwe Şêx Mistefa, îcazeta xwe ji Şêx Mihemed Seîd Seyda el-Cezîrî girtiye. Her du bira jî xelîfeyên Şêx Seyda ne.⁶⁰ Di sala 2013yan de li Stenbolê diçe rehma Xwedê. Gora wî niha li gundê Çalkê, li cem kullîyeya bavê wî, li goristana gund definkirî ye. Li medresa wî hê jî perwerdehî didome.⁶¹

1.3.4. Nav û Mexlesên wî

Navê wî yê rastî Xelîfe Yûsif Topçuoğlu ye. Ev paşnav jî ji Topçuzadeya bavê wî tê ku di qesra Îshaq Paşayê de wek topkar dixebitî. Mexlesên wî zêde tune ne. Ya herî navdar “Xelîfe” ye. Weku Hasan Akboğa jî di teza xwe ya masterê de diyar dike paşnavê wî wek “Tanrıverdi” hatiye nivîsîn, lê dema em lê dinêrin Xelîfe xwestiye ku ev paşnav “Allahverdi” (Xwedêda) be. Ev biryar jî ber sedemên pîrsgirêkên wê serdemê hatiye girtin ku “Tanrı” şûna “Allah” de dihat bikaranîn.⁶² Ji ber vê, paşnavê wî wek “Tanrıverdi” hatiye qeydkirin û weku Akboğa diyar dike, ev agahî jî neviyê wî Mela Evdile Tanrıverdi hatiye girtin. Li bajarê Xelîfe Yûsif de jî jê

⁵⁸ <http://ararat-welat.blogspot.com/2010/07/galxo-sex-mustafa-kimdir.html>.

⁵⁹ Abdulhalim Durma, *h.b.*, rr. 59-60.

⁶⁰ *h.b.*, r. 65.

⁶¹ Abdulhalim Durma, *Evlialar Şehri Ağrı*, Erol Ofset Matbaacılık ve Yayıncılık, Samsun, 2014, r. 65.

⁶² Hasan Akboğa, *Xelîfe Yûsif û Teqrîza Wî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bingölê, Enstîtûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Çewlig, 2017, r. 14.

re “Seydayê Xelîfe Yûsif” dihat gotin û li cem sofî û mirîdan jî jê re “şêx” an jî “murşîd” dihat gotin.⁶³

Xelîfe di çend pirtûkên xwe de navê xwe wek Ebdullah ibn-u Neqşîbendî el-Qadîrî û Ebdullah ibn Mehmûd Beyazîdî en-Neqşîbendî nivîsiye. Ji ber zext û zorên di serdema xwe de ku li ser pirtûkên kurdî hatine kirin, navê xwe bi awayekî veşartîye. Lê weku Zeynelabîdîn Zinar jî diyar dike, bi heseba ebcedê “156” “y, w, s, f” beramberî navê Mehmûd e ku wî di pirtûkên xwe de nîşan daye. Her wiha Ebdullah jî navê bapîrê wî bûye.⁶⁴

Li cem gelê xwe jî xwediyê hurmet û evîndariyê bûye ku gel jê re “bavo” an jî “kalko”⁶⁵ (bapîr) digot.⁶⁶

Yûsifê Bayezîdî jî li cem Bayezîdiyan dihat bikaranîn.⁶⁷

1.3.5. Xwendina Wî

Xelîfe Yûsif jî wekî gelek feqeyên medreseyan cara ewil ji medreseya li gundê xwe, li cem Mele Ehmed perwerdehî girtiye. Piştî astekê Xelîfe çûye cem Şêx Mihemedê Celalî ji bo perwerdehiyê.⁶⁸ Piştî yekemîn şerê cîhanê diçe Sêrtê û berdewama perwerdehiya xwe dike, emê di bin binbeşa serdema Sêrtê û Cizîrê de qala wî bikin.

1.4. Berhemên Xelîfe Yûsif

Edebiyata klasîk ya Kurdan ji devkî û nivîskîyê peyda dibe. Her çiqas ya devkî zêde jî be ya nivîskî jî gelek hene. Li gor kevinbûyîna berhemên nivîskî yê

⁶³ Mihemed Sidiq Candan, *Xelîfe Yûsif û Îrşad'ul Îbada Wî*, Kovara Nûpelda, Bihar Hejmar 6, Wan 2011, r. 51.

⁶⁴ Zeynelabîdîn Zinar, *Nimune Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Yekîtiya Nivîskarên Kurd, Çapa Pêşî, Stockholm 1991, r. 201.

⁶⁵ Ev peyv di hin çavkaniyan de wek “galko” di hin çavkaniyan de jî wek “kalko” derbas dibe.

⁶⁶ Mehmet Salih Geçit, “Halife Yusûf Topçu (1885-1965) ve Akide Metni”, *Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, Cilt 4, Sayı1, Ağrı, 2018/133-164, r. 136.

⁶⁷ Süleyman Çevik, *Bi Kurê Xelîfe Yûsif Şêx Mustefa re Hevpeyvîn*, Nûbihar c. 8, j.89, 2003, r. 9.

⁶⁸ M.Salih Geçit, *Ahmedî Hanî Çığırını Devam Ettiren Bayezid'li İlim Ve Fikir Adamları*, 2. Uluslar Arası Ahmedî Hanî Sempozyumu 1. Oturum, Bildiriler Kitabı, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi, 29 eylül 2018, r. 89.

gelan, kevinbûyîna edebiyata wan jî derdikeve holê. Destpêka dîroka wan jî li gor kevinbûyîna wan berheman e.⁶⁹

Tê zanîn ku li medreseyan di warê edebiyata Kurdî ya klasîk de gelek berhemên giranbuha derketine. Mela û seydayên xwediyê ilm û irfanan gelek berhem derxistine holê. Gelek ji wan jî ilma xwe bi xwe re veşartine. Yên berhemên wan hebin jî gelek ji wan nehatine nasîn an jî ji ber mirovên nezan qedrê wan nehatiye zanîn.

Xelîfe Yûsif jî gelek berhem dane. Em spasdarê zarokên wî ne ku xwediyê berhemên wî derketine. Mirov dikare berhemên wî wiha bi rêz bike.

1.4.1. Îrşad'ul Îbad (Îlmîhala Şafiî)

Di nav pirtûkên Xelîfe Yûsif de ya herî zêde hatiye naskirin Îrşad'ul Îbad e. Ji ber ku ev berhem li medreseyan wekî pirtûka perwerdehiyê hatiye bikaranîn. Ev berhem pexşan e, bi tîpên erebî hatiye nivîsîn û ji sê sed û bîst û du rûpelan pêk tê. Mijarên wê yên gelemperî ji fiqha dînê îslamê yê şafiî ye. Ji îmanê heta hec û zekatê, ji feraîzê heta kehanetan gelek mijar li ser bingeha usûla ilmihalê hatiye beyankirin.

Ev çapa li ber destê me di sala 2015an de ji aliyê Weşanên Nubiharê ve hatiye çapkirin. Ji aliyê Evdilselam Bêcirmanî û Hiseyn Şemrexî ve hatiye teshîhkirin. Destpêk û dawiya berhemê bi nezmê hatiye nivîsîn. Ji jiyana Xelîfe Yûsif dest pê dike û bi eqîdeya îmanê didome. Naverok zêdetir li ser paqijî, teharat, selat, cenaîz, nezaket, kefare, îsqad, hec, wesiyyet û hwd. hatiye avakirin. Behsa du hezar meseleyên dînî dike. Li gorî Zeynelabidîn Zinar ev berhem cara ewil di sala 1960an de li Enqerê çap bûye.⁷⁰

⁶⁹ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî Ya Klasîk*, Nûbihar, 2013, Îstanbul, r. 26.

⁷⁰ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Yûsif*, Kurd-kav, Stockholm, 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>.

Di nivîsandina vê berhemê de Xelîfe Yûsif ji van kesayetan sûd wergirtiye: Nevevî, İbn Hacer, Remlî ne. Her wiha pirtûkên ku jê sûd wergirtine ev in: El-Envar, Beycûrî, Mûxnîl-Muhtac, Îanetut Talibîn.⁷¹

Li gorî Mehmet Salih Geçit ev berhem li Sûriyeyê cara ewil bi metbaayê hatiye çapkirin, li Tirkiyê jî cara ewil di 1960an de de li Enqerê di metbaayê “Nûr”ê de hatiye çapkirin.⁷²

1.4.2. Teqrîz (nezmên olî û tesewufî)

Ev berhem ji helbestan pêk hatiye, berhemên wek rexne, methiye, pesinname ji bo Xweda û ji bo evîna Pêxember. Kêşana helbestan serbest e, helbestên wê bêtir ji rexneyan pêk hatine. Di sala 1961ê de li Enqerê û li ser navê Yusuf Topçuoğlu hatiye çapkirin.⁷³

Li ser vê berhemê di sala 2017an de Hesên Akboğa teza lîsansa bilind amade kiriye û cihekî berfireh daye naveroka wî ku me jî jê îstîfade kiriye.

1.4.3. Usûla Meratîba Hisabê (Rîsalet’ul Hîsab/Matematik)

Ev berhem li ser matematîkê hatiye amadekirin. Naveroka mijaran wisa tevlêhev û zor nîne, li gor şert û mercên rojane berhevkin, derxistin, nivîkin û lihevexistin, ango çar kiryarên hêsan bi kar aniyê. Mixabin ev berhem wek pirtûkek nehatiye çapkirin.⁷⁴ Lê di kovara Nubiharê hejmar 89an de Abdusselam Bêcirmanî bi awayekî berfireh wek çavkanî li ser sekiniye. Bêcirmanî diyar kiriye ku zimanê berhemê pir zor e ji ber ku peyvên Erebî pir tê de hene.⁷⁵

⁷¹ M.Salih Geçit, *Ahmedî Hanî Çığırını Devam Ettiren Bayezid’li İlim Ve Fikir Adamları*, 2. Uluslar Arası Ahmedî Hanî Sempozyumu 1. Oturum, *Bildiriler Kitabı*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi, Ağrı, 29 Eylül 2018, r. 138.

⁷² M.Salih Geçit, *h.b.*, r. 139

⁷³ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav, Stockholm, 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁷⁴ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav, Stockholm, 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁷⁵ Abdusselam Bêcirmanî, *Usûla Meratîbê Hisab*, Nubihar, Hejmar 89, Havin 2003, r. 27-35

1.4.4. Mecmeû'ul Mesailîş-Şer'îye Bi Lîfsanê Kurdiye

Ev berhem jî mîna berhema Îrşad'ul Îbad li ser fiqha dînê Îslamê sekiniye. Ji 795 rûpelan pêk hatiye. Di sala 2010an de li Stenbolê li cem weşanangeriya Nubiharê hatiye çapkirin.⁷⁶

1.4.5. Tuhfet'us Sibyan

Ev pirtûk jî wek pexşan hatiye amadekirin û xîtabî zarokan dike. Di vê berhemê de agahiyên derbarê fiqha dînê Îslamê yê li gor mezheba şafiîyê hen ji bo zarokan. Ev berhem jî wek kurtahiya îrşad'ul Îbad e. Ji 140 rûpelan pêk hatiye. Di sala 2008an de li Stenbolê di weşanên Nubiharê de çap bûye û 44 babet in.⁷⁷ Di dawiyê de ev helbest he ye:

Ey xwendiya! li min nekin lewm û îtab
Ger çî pir sehwa û eyb e, ev kitab
Hûn dirist û teshîh bidêrin xweşcewab
Ji lutf û kerema xwe wellahu e'lemu bissewab.⁷⁸

1.4.6. Tuhfet-uz Zakirîn

Di sala 1963an li Enqerê di çapxaneyê Nurê de hatiye çap kirin. Di pirtûkê de mexlesa Ebdullah İbnû Mehmûd Neqşebendî hatiye bi kar anîn. Ji 44 babetan pêk hatiye. Pexşanek bi Kurdî û Erebî ye. Di berhemê de hinek destxet û hinek tîpên makîne hatiye bikaranin, ji rûpela 113an pê de tîpên destxetê hatiye bikaranîn û wisa jî hatiye çapkirin.⁷⁹

⁷⁶ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsîf*, Kurd-kav, Stockholm, 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁷⁷ Mehmet Salih Geçit, *Halîfe Yusûf Topçu (1885-1965) ve Akide Metni*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, cilt4, Hejmar 1, 2018/133-164, r. 140

⁷⁸ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsîf*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁷⁹ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsîf*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

Weşanên Hîrayê di sala 2000î de li Stenbolê çapa duyemin weşandiye. Di vê çapê de zimanê Tirkî zêdetir hatiye bikaranîn. Ji 416 rûpelan pêk hatiye. Tirkiya wî jî Mihemed Can amade kiriye.⁸⁰

Ev pirtûk wekî pirtûka hedîsên bijare ye ku di serî de bi metna Erebî, pê ve wergera Kurdî û şîrovevên wê hatine nivîsandin.⁸¹

Di pirtûkê de wekî gelemperiya pirtûkên Xelîfe, destpêk ji helbestek pêk tê ku ev helbest di berhema wî ya Tuhfet'ul Îxwanê de jî hatiya bikaranîn. Helbest ev e:

Ger tewfîq neda qeyûmê Qadir
Yek zere taet ji kes nebûya sadir
Eger tewfîqa xeyrê nebûya ji Barî
Yek zere qebcî ji dest nedibû carî
Efû ke gunahê min rûsiyah
Bi lutf û bi rehma xwo ey Padîşah!
Şefaetçî ke ji bo minê bênewa
Hebîbê te kir xatemê enbiya
Ji bo cumle nexlûq her ew şefaetçî ye
Te ew rehmet ji bo alem şandiye
Ew hebîbê te eflak ji bo çêkirî
Bi cahê wî azad ke, me ji agirî
Bê hed ê hesab her selat û selam
Li ser wî û al û eshaba tamam.⁸²

1.4.7. Kîtab'ûl Feraîz

Ev berhem ku em li ser xebitîne di sala 1961ê de li Enqerê çap bûye. Ev berhem pexşan e û ji 56 rûpelan pêk hatiye.

⁸⁰ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁸¹ Mehmet Salih Geçit, *Halîfe Yusûf Topçu (1885-1965) ve Akide Metni*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, cilt4, Hejmar 1, 2018/133-164, r. 140

⁸² Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

Mijara wî li ser dabeşkirina mîratê ye. Ji kî/kê re çiqas par dikeve li gor şertên dînê îslamê diyar kiriye.

Di vê berhemê de jî çawa ku em di pirtûka matematîkê de hesaban dibînin, hesabên bi reqeman gelek in bi taybetî jî hesaba nîvîkirinê hatiye bikaranîn.

Xelîfe Yûsif di vê berhemê de navê Yûsif bi hesaba Ebcedê li gor reqemên 156 nivîsandiye lê mexlesa xwe ya bi navê Ebdullah Îbn-u Mehmud Neqşebendî jî bikar aniye.

Ev berhem bi zaravayê Kurmancî hatiye nivîsandin, lê belê tê de peyvên Erebi pîr zêde ne. Jixwe ev berhem bi taybetî ji bo feqeyan e ku wan dersên xwe bi Erebi û Kurdî dîtine di medreseyan de, wekî din kesekî/e ku bi Erebi nizane bi xwendina vê berhemê dibe ku serwext nebe.

Li ser pirtûkê çend malikên nezmê jî hene ku em li ser berhema Îrşad'ul Îbadê ya di çapa Nubiharê de jî dibînin ev in:

Ey ummîyê ku hûn erebî nizanin
Ji we ra mizgînî ye ger hûn bizanin
Kesê wê bixwûne ji pîr û cana
Wê bibe feqîhekî xebîr û zana
Bi tewfîwa Xelaqê erd û asîmana
Bi cahê şefîfê cumle ins û cana
Sed hizar selat û selam her zemana
Li ser wî û al û eshaba her weqt û hîn û ana.
Di rûpela 56an de jî ev hene:
Ey kesê ku hûn ummî û nezan in
Îhsanek ji Xudê ger hûn bizanin
Ger çî ne muhtacê wê ne alim û zana
Lakin zanîna wê ferz e ji bo cahil û nezana
Bi ilmê fexr neke ey kesê alim û zana
Fexr ew e tedbîr bikin ji bo cahil û nezana
Wan hişyar bikin heta dînê xwe naskin

Ji cehl û delaletê ewan xilas kin
Eger xwendiyê ku nav mela ne
Bi eceb tekebbur ew mubtela ne
Bi te'n û istihza û bihana
Men' dikin ji te'elumê cahil û nezana
Ewê digel ilm bimrin herin fenayê
Wan ehl û etba'ê ummî dê bimînin li dunyayê
Ger te divê riya dînê xwe bizanî
Bi sehl, bê mesref bi terzek erzanî
Ewel bixwîne Qurana 'ezîm ji ezber
Paşî wê Îrşad-ul Îbadê çendî jiber
Terîqa Heq wê ji te ra xuya be
Çi ta'etê bikî wê meqbûlê Xuda be
Ne Îrşad-ul Îbadet, belkî ew dewa ye
Ji bo mereza cehlê eceb şîfa ye
Lewra ji Şer'ê heye tê da du hizar mesail
Yê xwendî ji terîqa musteqîm nabitin mail
Kurmancî ye, şêrîntir e ji şekir
Xweziya bi wî kesî ku zanî hem jî jiber kir
Çi kesê qenc bixwîne, lê nezer ke
Ewê helal û heram ji hevdu ferq ke
Paşê huba zanîne li wî eser ke
Erkanê wuddû û xeslê tamam jiber ke
Hem wê erkanê sinet, nimêja mubarek
Wê bizane azan, îqamet, tesbîha bicarek
Wê bizane nimêja cemaet, herdu îda
Wê di xesl û nimêja meyita da bibe alim û seyda
Hem wê bizane ferza zekat û sewmê
Paşê laiq e bibe îmamê qewmê
Hem wê bizane erkan û adabê nîkahê
Xwedê bide wî necat û fewz û hem felahê
Hem wê bizane halê ddehiye w'eqîqeta sebiyan

Cenet meskenê wî be di nêv hûr û xilman
Hem wê bizane yê helal û enwa'ê heywana
Ji ekla heram men' bike cahil û nezana
Eger mesailê wê tamam qenc bizane
Heq e ku ew alim e, ne cahil û nezan e
Lewra ferman kiriye Hezretê Pêxember
Şefî'ê assiya, roja Qiyam û Mehşer
Ji weqta piçûkî der zemanê mehd
Heta qebrê kesba emel bikin bi lez û cehd
Ger bêjin Kurmancî ye, ne fesîh û letîf e
Haşa! Xalis me'nayê Şer'a Şerîf e
Ji şer'ê qet meqsed fesahet nine
Belkî emel û silûka terîqa dîn e
Ger hûn qebûl bikin ya Heq wiha ye
Wene, cewher li sûka beqala bê biha ye
Ji bo mu'anida faîde ew e, negotin
Li sûka mirîşka deve nayê firotin.⁸³

1.4.8. Tecwîd'l Qur'an

Ev jî wekî pirtûkên din bi pexşanî hatiye amadekirin. Ev berhem ji 44 rûpel û 38 mijaran pêk tê. Ev berhem û berhema *Eqîda Îmanê* di yek nusxeyê de û bi hev re hatine çapkirin. Di sala 2008an de ev berhem dîsa ji aliyê weşanxaneyê Nubiharê ve çap bûye.⁸⁴

Ev yekemîn berhem e ku tecwîda Qur'anê bi zimanê Kurdî hatiye nivîsîn. Ev berhêm bêtir xîtabî mele û xwendevanên medreseyan dike û li ser bingeha tecwîdkirina Qur'anê disekine.⁸⁵

Li ser rûpela jêrîn de Xelîfe Yûsif ev helbest nivîsandiye:

⁸³ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Yûsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁸⁴ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Yûsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁸⁵ Mehmet Salih Geçit, *Halîfe Yusûf Topçu (1885-1965) ve Akide Metni*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, cilt4, Hejmar 1, 2018/133-164, r. 138

Wacib e li ser xas û amê
Zanîna erkanê îman û îslamê
Paşê wacib e li ser da û baba
Te'îlma ewlada ruhniya herdu çava
Kurmancî ye, şêrîntir e ji şekir
Xwezaya bi wî kesî zanî hem jiber kir.⁸⁶

1.4.9. Eqîdeya Îmanê (Eqîdetu'l îman)

Ev pirtûk ji 30 rûpel û ji 17 sernavan pêk hatiye. Weşanxaneyê Nubiharê di sala 2008an de çap kiriye.⁸⁷

Doç. Dr. Mehmet Salih Geçit li ser vê mijarê gotarek amade kiriye. Ev gotar di sala 2018an de di kovara *Zanîsta Cîvakî* ya Zanîngeha îbrahîm Çeçenê, di hejmara yekem de hatiye weşandin. Ev gotar bi zimanê Tirkî hatiye amadekirin.

Ev berhem li ser bingeha baweriyê û eqîda îslamê ye. Ev berhem wek îlmîhalek di pirtûka *Îrşadû'l 'Îbadê* de, di beşa yekem de cih girîtiye. Paşî bi rêya neviyê Xelîfe Yûsif Şêx Evdilal Tanriverdî ve wek pirtûkek bi serê xwe hatiye amadekirin. Ev berhem li gor mezheba eş'ariyê hatiye amadekirin, ji ber ku xîtabeta wî gel bû û gel jî li ser mezheba eş'arîtiyê bû.⁸⁸

1.4.10. Xutbe

Ev berhem ji bo danasîn û fêkirina nimêja îne ye. Berhemeke kurt û piçûk e. Ji aliyê matbaaya Nûrê ve hatiye çapkirin.⁸⁹

Li gor Z. Zinar ev berhem di sala 1963an de çap bûye û cihê çapkirina wê ne diyar e. Li gor hesaba Ebcêdê navê Xelîfe jî li ser berhemê nivîsandiye.⁹⁰

⁸⁶ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁸⁷ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁸⁸ Mehmet Salih Geçit, *Halîfe Yusûf Topçu (1885-1965) ve Akide Metni*, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, cilt4, Hejmar 1, 2018/133-164, r. 140

⁸⁹ M.salih Geçit, *h.b.*, r.140

⁹⁰ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

Xelîfe di berhemê de bala xwe daye li ser van pênc xalan ku dê çawa ji aliyê melayan ve bên xwendin:

- 1-Hemdê Xweda
- 2-Selewat
- 3-Wesayeta bi teqwayê
- 4-Ayet
- 5-Dua⁹¹

1.4.11. Tuhfet'ul Amilîn (Ilma Fiqhê Ya Mezheba Şafîyê)

Ev berhem Erebi ye.⁹² Agahiyên fiqha îslamê dide. Di navbera 1913-14an de li çapxaneyê Teraqiyê, li Şamê hatiye çapkirin. Xelîfe 29 salî bû dema ev berhem hatiye çapkirin.⁹³

Ev berhem jî li ser şopa berhema Îrşad'ul Îbadê ye, agahiyên li gor mezheba şafîyê dide û berhemeke pîçûk e.⁹⁴

1.4.12. Tuhfet'ul Îxwan

Ev berhem jî li ser fiqha îslamê ye û bi zimanê Erebi ye. Ji 140 rûpelan pêk hatiye. Di sala 1996an de ji aliyê weşanxaneyê Şûrayê ve hatiye çapkirin. Li Stenbolê çap bûye.⁹⁵

Zeynelabidin Zinar diyar dike ku di pirtûkê de çend helbest hene;

Efû ke gunahê min rûsiyah
Bi lutf û bi rehma xwe ey Padîşah
Şefaetçî ke ji bo minê bênewa

⁹¹ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁹² Hasan Akboğa, *Xelîfe Y'Êsif Ê Teqrîza Wî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bingölê, Enstîtûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê, Çewlig 2017, r.23

⁹³ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

⁹⁴ M.salih geçit, *h.b.*, r.140

⁹⁵ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

Hebîbê te kir xatemê enbiya
Ji bo cumle mexlûq her ew şefaetçî ye
Te ew rehmet ji bo alem şandiye
Ew hebîbê te eflakî ji bo çêkirî
Bi cahê wî azad ke me ji agirî
Bê hed û hesab her selat û selam
Li ser wî û al û eshaba tamam.⁹⁶



⁹⁶ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsîf*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

2. KESAYETÎ Û ZIMANÊ XELÎFE YÛSIF Ê EDEBÎ

Em di vê beşê de li ser kesayetiya Xelîfe Yûsif di warê edebî de sekinîn e. Di berhemên xwe de taybetiyên devokan ku bikar aniye û di bin tesîra kîjan edîban de maye me behsa wan kiriye.

2.1. Kesayetiya Xelîfe Yûsif

Melayên Kurdan yê ku ji medreseyan îlimdar bûne, di warê kêmasiyên nenivîsandinê de hatine rexnekirin. Gelek ji wan xwediyê ilmeke bêhempa bûne, metnên Erebî, Farisî, Osmanî pir baş dixwendin û dinivîsandin. Gelek ji wan jî, bi taybetî yê di medresyên Kurdan de ilmê dîtine bi zimanê Kurdî jî axaftin û nivîsandinê baş pêk dianîn. Lê mixabin ev zanîn û alimtiya gelek ji wan bi mirina wan ve binax bûne. Ji ber ku kê m ji wan aliman berhemnivîsandinê ji xwe re eded kirine yan jî bêtir girîngiyê dane li ser nivîsandina bi zimanê Erebî. Em nikarin tevahiya wan tawanbar bikin ji ber sedemên siyasî yê serdemê û zextên li ser zimanê Kurdî û her wiha nezanîna rê û rêbaziya nivîsandinê jî sedemeke din e.

Lê dema em li jiyana Xelîfe dinêrin, em dibînin ku gelek berhem di paş xwe de hiştine. Berhemên wî di nav mela û feqeyan de gelek navdar in. Di gelek waran de nivîsiye, hem bi cureya pexşanê û hem jî bi cureya helbestê nivîsiye.

Her çiqas Xelîfe Yûsif di wêjeya Kurdî de zehf nehatibe naskirin jî, dîsa tesîra wî li ser medresyên Kurdî gelek mezin e. Ji ber ku berhemên wî bi taybetî jî *Îrşad'ul Îbad* û *Feraîza* wî gelek bi nav û deng in di medreseyan de. Ev her du jî wek pirtûka dersê hatine bikaranîn.

Xelîfe Yûsif gelek feqe gihandine û gelek şagirtên xwe fêrî nivîsandina zimanê Kurdî kiriye. Li derdora xwe bi taybetî şivan û gavanan komê medresê kiriye û ji wan re zimanê Kurdî fêr kiriye.⁹⁷

⁹⁷ Zeynelabidin Zinar, *GotarLi Ser Jiyana Xelîfe Yûsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

Xelîfe Yûsif di helbestên xwe de peyam dide xwendevanan. Yek ji van peyaman ev e ku girîngiya zimanê Kurdî dide nîşan û divê qîmet bidin zimanê xwe. Her wiha dixwaze bêje, yê ku bixwaze bixwîne Kurdî têra wan heye;

Ger te hebûya û kiyased
Tê wê bixwenda her wext û saet

Kêmqîmet e semen erzan e
Kurmancî ye herkes dizane

Tu qedrê kitêba xwe qenc bizane
Nebê Kurmancî ye kes qedrê wî nizane⁹⁸

2.2. Aliyê Wî Yê Helbestvaniyê

Dema me li aliyê wî yê nivîsandina helbestan yanî helbestvaniyê nihêrî me dît ku wekî pexşanê pênuşa wî zexm e.

Helbestên wî piranî di bin bandora ilmê Îslamî de jî be em dikarin bibînin ku fikra xwe ya li ser zimanê xwe aniye ziman. Wek mînak di pirtûka *Teqrîzê* de çend helbestên wî wiha ne;

Ji ewel kesî nediye heta evî zemanî
Bi vê tertîbê, xasma bi vî lîsanî

Lîsanê kurmancî çil bav û kalan
Hêj nizanî bi xwendina mah şû salan
Kelbê kûtxwur bi kêr şivanî nayê
Cahilek nezan î, Xwedê nedayê
Ey cahilê malxirab ê wêran!
Neke de'wa meydana piling û şêran

Tu ku ehmeq î, lîsanê abaê xwe nizanî
Şerm û heya bike, tu kêmtirê ji san î

⁹⁸ Dr.Naci Kutlay, *Xelîfe Yûsif Di Rêya Ehmedê Xanî De*, Nûbihar c. 8, j.89, 2003, r. 25

.....

Guh nede wî cahilî, wî bêedebî
Ku dibêje "ilm nîne ji xeyr erebî"

Lewra DÎN îbaretê ji me'nan e
Ne ku bi kelîmet û lefz û hirûfan e

Nebêje Yûsif xudan'eyb û natemîz e
Qewlê wî ne meqbûl û ezîz e

Nizanî tu, hingiv ji bo mereza dewa ye
Gerçi ji mêşek denî bê beha ye

Xarina wî lezîz e, gelek şêrîn e
Nebêje kevçik dar e, weya zêrîn e?

.....

Lîsanê kurmancî egerçî naşîrîn e
Lakin di benda me'nayê de şekîrîn e

Gerçi ew darek kêmbiha ye
Lakin semerê wê Şer'a Mustefa ye

Lazim e ji wî semerî nebî tu xafil
Gerçi tu yî xwedanê idrak û aqil

Kesê ku wiha fêm neke, ew nezan e
Ew ne insan e, kerekî xwedanpalaan e

Kerê reş ji wî çêtir bizane
Kerê guhbiçûk e, ne wekî keran e

Ji serî veke pêç û emamet

Xwedê nedaye wî bext û seadet.⁹⁹

.....

Dîsa di pirtûka *Feraîzê* de bang dike ku bixwînin û bizanin an jî ji ilmê xwe fexrê nekin û bizanin ka rêbaziya zanîna dînê xwe hûn ê çawa bikin;

Ey kesê ku hûn ummî û nezan in
Îhsanek ji Xudê ger hûn bizanin

Gerçî ne mihtacê wê ne alim û zana
Lakin zanîna wê ferz e ji bo cahil û nezana

Bi ilmê fexr neke ey kesê alim û zana
Fexr ew e tedbîr bikin ji bo cahil û nezana

Wan hişyar bikin heta dînê xwe naskin
Ji cehl û delaletê ewan xilas kin

Eger xwendiyê ku nav mela ne
Bi eceb tekebbur ew mubtela ne

Bi te'n û istihza û bihana
Men' dîkin ji te'elumê cahil û nezana

Ewê digel ilm bimirin herin fenayê
Wan ehl û etba'ê ummî dê bimînin li dunyayê

Ger te divê riya dînê xwe bizanî
Bi sehl, bê mesref bi terzek erzanî

Ewel bixwîne Qurana 'ezîm ji ezber
Paş î wê Îrşad-ul Îbadê çendî jiber

Terîqa Heq wê ji te ra xuya be
Çi ta'etê bikî wê meqbûlê Xuda be

⁹⁹ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsîf*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

Ne Îrşad-ul Îbadet, belkî ew dewa ye
Ji bo mereza cehlê eceb şîfa ye

Lewra ji Şer'ê heye tê da du hizar mesail
Yê xwendî ji terîqa musteqîm nabitin mail

Kurmancî ye, şêrîntir e ji şekir
Xweziya bi wî kesî ku zanî hem jî jiber kir

Çi kesê qenc bixwîne, lê nezer ke
Ewê helal û heram ji hevdu ferq ke

Paşê huba zanînê li wî eser ke
Erkanê wuddû û xeslê tamam jiber ke

Hem wê erkanê sinet, nimêja mubarek
Wê bizane azan, îqamet, tesbîha bicarek

Wê bizane nimêja cemaet, herdu îda
Wê di xesl û nimêja meyita da bibe alim û Seyda

Hem wê bizane ferza zekat û sewmê
Paşê laiq e bibe îmamê qewmê

Hem wê bizane erkan û adabê nîkahê
Xwedê bide wî necat û fewz û hem felahê

Hem wê bizane halê dehiye w'eqîqeta sebiyan
Cenet meskenê wî be di nêv hûr û xilman

Hem wê bizane yê helal û enwa'ê heywana
Ji ekla heram men' bike cahil û nezana

Eger mesailê wê tamam qenc bizane
Heq e ku ew alim e, ne cahil û nezan e

Lewra ferman kiriye Hezretê Pêxember
Şefî'ê asiya, roja Qiyam û Mehşer

Ji weqta piçûkî der zemanê mehd
Heta qebrê kesba emel bikin bi lez û cehd

Ger bêjin Kurmancî ye, ne fesîh û letîf e
Haşa! Xalis me'nayê Şer'a Şerîf e

Ji şer'ê qet meqsed fesahet nine
Belkî emel û silûka terîqa dîn e

Ger hûn qebûl bikin ya Heq wiha ye
Wene, cewher li sûka beqala bê biha ye

Ji bo mu'anida faîde ew e, negotin
Li sûka mirîşka deve nayê firotin.¹⁰⁰

2.3. Edîbên Ku li ser Xelîfe Yûsif Tesîr Kirine

Wekî gelek wêjevanên Kurdan ku di bin bandora gelek kesan de mane Xelîfe Yûsif jî di bin bandor û kesayetiya gelek edîban de maye.

Bi taybetî navê van her sê wêjevanên qedirbilind ên Kurd di nav helbestên wî de derbas dibe ev in; Ehmedê Xanî, Mele Huseynê Bateyî û Mele Xelîlê Sêrtî. Dibe ku di bin dandora gelek yên din de jî mabe lê teqez em dizanin ku van tesîr lê kiriye.

2.3.1. Ehmedê Xanî

Dema em lê dinêrin, em dibînin ku tesîreke mezin ya Ehmedê Xanî li ser Xelîfe Yûsif heye. Hembajariya wan dibe sedema naskirin û di bin bandormayina wî de. Ji aliyê din ve jî Xelîfe di medreseya Ehmedê Xanî de feqetiyê kiriye û ew jî dibe sedema naskirin û fêmkirina wî.

Xelîfe Yûsif jî wekî Ehmedê Xanî helbestên pirzimanî nivîsiye. Di pirtûka *Tuhfet'ül İxvan* rûpela 128an de mîna keke vê helbestê heye;

¹⁰⁰ Pirtûka Feraizê Ku em Li ser Dixebitin, r.56

Alimlere wacib îken, men' eylemek bid'etlerî
La reybe fî şurbîd-duxanî semme qetîl

Yese'ûne fî şurbîd-duxanî, we îstehsen husnurridaî
Niçun buna raxib, pîr û sebî, mîr û geda?

Def'î erzî bu dir deyup, için meridî el lewbi el lewr
Îsme' kelamiya exî, la teleb minha eşşîfaî¹⁰¹

Her wiha em dikarin mînakek ji helbesta Ehmedê Xanî jî bidin:

Şehîdê Kerbela

Leyse fî qelbî sîwake ya hebîbî kulle hal
Her demem xem hem demem şud der firaqet mah û sal
Ger benım kanım dilersen, çoktan olmuştur helal
Mest û ser xwoşem ji îşqê, min nema 'eql û kemal

Ente fikrî fî fûadî, Ente rûhî fil cesed
Leşkerê xemhayê To, mulkê dilem wêranî kerd
Dade geldim aşk elinden isterim senden meded
Wan Tetaran kirne talan can û dîn û mulk û mal

Tale xemmî, zade hemmî, şa'e sirrî fil mela
Teşneyê cama wîsalim çûn şehîdê Kerbela
Yoksa sen dîvane oldun, nice halin? Ey dila!
Yan ji nû ve îşveyek da min hebîna çav xeza

Bîttû mehcûren hebîbî! Leste mînnî alîmen
Murdem ez derdê firaqet, xafilî Ez halê men
Can û dîlden arzi kıldım halımı canane ben
Erzî hala min Tu xafil, qet ne pîrsî erzî hal

Hellena mîn nr metîl weslî hebîbî mîn nesîb

¹⁰¹ Zeynelabidin Zinar, *Gotar Li Ser Jiyana Xelîfe Êsif*, Kurd-kav 19 Gulan 2012, <http://www.diyarname.com/news.php?Idx=5973>

Û fitadem ber deret bê çare, sergerde xerîb
Derdê men çok olduğunden ona yoktur hiç tebîb
Ey tebîbê min dewayê derdê 'Xanî' her wîsal¹⁰²

Xelîfe di helbesteke xwe ya ku di berhema wî ya bi navê *Feraîz* de derbas dibe, behsa Xanî û çend berhemên wî dike:

Xweziya weqta tu wan dikî itirazê
Ez jî hazir bibûma wê weqt û lehzê
Ewan bidiya ji min ecaib icabet
Heta qiyamet bibûna şermî, xicalet

Meger kor î, bi kurmancî nizanî
Çend kitêb gotine Ehmedê Xanî
Yûsif û Zuleyxa, Mem û zîn
Nûbihara fesîh bi elfazê şekirîn¹⁰³

Lê mixabin Xelîfe di vê helbestê de Yûsif û Zuleyxa wekî berhemeke Xanî dide nîşan lê ew berhem ne ya Ehmedê Xanî ye, em dizanin ku ya Selîmê Hîzanî ye. Doç. Dr. Nesîm Sönmez jî di gotara xwe ya bi navê Selîmê Hîzanî de diyar dike ku jî berhemên Selîmê Hîzanî tenê yek heye di destê me de: Yûsif û Zuleyxa.¹⁰⁴ Her wiha Dr. Nacî Kutluay jî di kovara Nubiharê de li ser vê şaşitiyê rawestiyaye.¹⁰⁵

2.3.2. Melayê Bateyî

Mela Huseynê Bateyî wekî melayên din berhemeke bêhempa diyarî wêjeya klasîk a Kurdî kiriye. *Mewluda* Mela Huseyn di çanda Kurdan de xwedî cihekî girîng e, her wiha di rojên taybet ên wek taziye, jidayîkbûn, xêrûxiryat û hwd. de tê xwendin. Xelîfe di helbesteke xwe de wiha behsa *Mewluda* Melayê Bateyî dike;

...

¹⁰² Abdurrahman Durre, *Şerha Diwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, Berdan Matbaacılık, Stenbol, 2002, r. 252

¹⁰³ Pirtuka Feraizê Ku em Li ser Dixebitin, r. 57

¹⁰⁴ Nesîm Sönmez, Selîmê Hîzanî, Pdf:

https://www.academia.edu/26532359/SEL%C3%8EM%C3%8A_H%C3%8EZAN%C3%8E.pdf

¹⁰⁵ Dr.Naci Kutlay, *Xelîfe Yûsif Di Réya Ehmedê Xanî De*, Nûbihar c. 8, j.89, 2003, r. 25

Ne şeyxê Batê xwedan qelbê Munewer
Bi kurmancî gotiye “mewluda pêxember”.¹⁰⁶

2.3.3. Mele Xelîlê Sêrtî

Mele Xelîlê Sêrtî cihekî taybet girtiye li cem Xelîfe Yûsif. Heta ne tenê li cem Xelîfe, li cem mela û feqeyên din jî gelek bi qedr û qîmet e. Berhema wî ya bi navê *Nehc'ul Enam* li medreseyên Kurdan hatiye xwendin. Girîngiya wî li cem Xelîfe ne tenê ji ber *Nehc'ul Enam* e. Tê zanîn ku Xelîfe Yûsif ji ber şerê cîhanê koçî Sêrtê dike û diçe cem Mele Hamîdê kurê Mele Xelîl. Ji ber vê yekê tesîra Mele Xelîl li ser Xelîfe gelek heye. Xelîfe Yûsif di helbesteke xwe de navê Mela Xelîl û berhema wî wiha tîne ziman:

....

Nizanî Nehc'ul- Enam'a celîl e
Bi kurmancî t'elîfa Mele Xelîl e¹⁰⁷

2.4. Zimanê Xelîfe Yûsif

Xelîfe Yûsif berhemên xwe bi zimanê kurmancî nivîsiye. Lê peyvên Erebî cihek mezin girtiye di wan berhemên de. Ev taybetî li cem melayan gelek e, ji bo ku feqeyên wan Erebiya xwe bi pêş ve bibin. Ji bo fêmkirina van berhemên, divê mirov xwedî Erebiyeke baş be. Berhema *Feraîz* jî yek ji wan e ku mirov bê zanîna Erebî tênagehîje wateya wê.

Xelîfe Yusif di berhemên xwe de taybetiyên devokên ku li wir jiyaye dide nîşan. Tesîra devokan li ser jiyana wî gelek e, ji ber ku demeke dirêj li devera Botî jiyaye û jiyana wî jî li serhedê domaye. Em ê di binbeşeke din de ji van herêman mînakên bidin.

Xelîfe di bin zext û zordariya serdema xwe ya li ser zimanê kurdî de berhemên xwe bi zimanê xwe nivîsandîye û gelek rûmet daye zimanê xwe. Li cem

¹⁰⁶ Kadri Yıldırım, *Kürt Medreseleri ve Alimleri*, Cilt 1, Avesta 2018 İstanbul r. 294

¹⁰⁷ K. Yıldırım, *h.b.*, r. 293

gelek kesan ev xebata ku Xelîfe derxistiye holê bi awayekî erênî û li cem hinek kesan jî neyinî hatiye şîrovekirin. Lê Xelîfe bersiva wan wiha daye:

Lazim e tu dînê xwe qenc bizanî
Ger çi bi kurmancî weya bi îbranî

Ji bo fezîlet ew e nîhayet
Lew ref'a wî bûye nîşanê qîyamet

Lîsanê kurmancî eger çi naşêrîn e
Lakin di binda me'anêd şekerîn e

Gerçi ew darek kêmbiha ye
Lakin semer wî şer'a Mistefa ye¹⁰⁸

2.4.1. Taybetiyên Devoka Serhedê

Taybetiyên devoka Serhedê ev e ku di gelek peyvvan de daçek nayên bikaranîn an jî şûna daçekên wekî de-re de da-ra tîn bikaranîn. Her wiha em dikarin di axaftinên serhediyên de jî bibînin ku tîpa “w” yê gelek caran nayên bikaranîn, wek mînak çanî? (çawanî?), inda(winda). Carna jî şûna tîpa “n”yê “d” tî bikaranîn. Wek mînak:

Ewid (ew in)¹⁰⁹, fenanî (wek),

Carna cînavk tîn kurtkirin; mi (min), bavêm (bavê min), destêx (destê xwe) bişo.¹¹⁰

Carna hinek peyv ji dawiyê tîn birîn; go (got), cî (cîh), mi (min), zar (zarok)¹¹¹

Kurtkirina lêkeran; kerem ke (bike), bise (bisekine) an jî bisene (bisekine), huş e (huş be)¹¹²

¹⁰⁸ Kovara Nupelda, *h.b.*, r. 51

¹⁰⁹ Feraiz, *h.b.*, Rûpe 19, Hevok 10

¹¹⁰ Murad Celali, *Kurmanciya Serhedê û Devoka Gundê Taxilka*, Nubihar, cild 22, sal 2018, r. 41

¹¹¹ Murad Celali, *h.b.*, r. 42

¹¹² Murad Celali, *h.b.*, r. 42

Hinek caran peyv tèn dirêjkirin; nehwêd (nod), anegorî (gor), yanzde (yazde)¹¹³

2.4.2. Taybetiyên Devoka Botan

Botanî an jî Botî navê devokek e ku li herêma Cizîr, Şîrnex, Sêrt, Amed, Zaxo û Dêrika Hemko¹¹⁴ tê axaftin. Em dikarin di wêjeya klasîk a Kurdî de berhemên gelek serkeftî bibînin bi vê devokê, em dikarin berhemên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî ji bo vê bidin mînak ku herî zêde ew tèn nasîn. Her çiqas Ehmedê Xanî bi devoka Serhedê tê naskirin jî bandora devoka Botan li ser berhemên wî gelek e, ne tenê ew her wiha Mele Mehmudê Bazidî jî di bin bandora devoka Botan de maye, jî ber ku devoka Botan ji bo zimanê Kurdî wek zimanê edebî dihat hesabandin.¹¹⁵ Edîbên kurd yên ku demekî jiyana wan li herema Botan dervas bûne di bin bandora devoka Botan de mane, Xelîfe Yûsif jî yek ji wan e ku di bin bandora vê devokê de maye.

Her wiha taybetiyeke devoka Botan ev e ku tîpa “t”yê di dawiya lêkeran de tê bikaranîn. Wekî mînak: muamelat¹¹⁶. Wekî din em dikarin peyva “nik” jî li gelek deran bibînin ku ev peyv ji herêma Botan e : Li nik.¹¹⁷

Taybetmendiyeke din jî şûna peyva Xwedê/Xweda de Xudê/Xuda tê bikaranîn.¹¹⁸

Mînak:

Ey kesê ku hûn ummî û nezan in

Îhsanek ji Xudê ger hûn bizanin¹¹⁹

¹¹³ Murad Celali, *h.b.*, r. 43

¹¹⁴ <http://www.saradistribution.com/ziman.htm>

¹¹⁵ http://www.nefel.com/articles/article_print.asp?ArticleNr=3595

¹¹⁶ Feraîz, *h.b.*, Rûpel 8, Rêz 14

¹¹⁷ Feraîz, *h.b.*, Rûpel 7, Rêz 13

¹¹⁸ İbrahim Gözetin, *Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wî Ya Nehcû'l- Enam, Teza Mastirê, Zanîngeha Muşê ya Alparslanê, Enstîtûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkiyeyê, Muş 2015, r.58*

¹¹⁹ Feraîz, *h.b.*, Rûpel 56.

2.5. Hêmanên Erebî, Farisî û Tirkî

Wêjeya Kurdî ya Klasîk di bin bandora zimanê cîranên xwe de gelek maye. Sedema herî mezin ew e ku alim di medreseyan de perwerdehiya xwe bi zimanê biyanî dîtine. Tesîra herî mezin zimanê Erebî ye, ji ber ku dîne Îslamê li herêma Ereban ango li Erebîstanê derketiye holê.

Em dikarin hêmanên Farisî jî pir bibînin ji sedema ku pirtûkên bi zimanê Farisî jî di medreseyan de hatine xwendin û fêrkirin. Hêmanên tirkî an jî Osmanî jî em dikarin bibînin ji ber sedema qedexekirina zimanê Kurdî an jî jiyana bi hev du re li ser welatek. Her wiha zimanê berhema ku em li ser dikebin jî pîrzimanî ye, Erebî pir zêde bikar hatiye, farisî gelek kême û tirkî jî hinek heye.

2.5.1. Unsûrên Erebî

Di *Feraîzê* de piştî zimanê Kurdî, yê herî zêde hatiye bikaranîn Erebî ye. Weku di berhema navborî de tê dîtin, bi taybetî navên ferdên malbatê hema hema em bêjin tevahî bi zimanê Erebî hatine nivîsandin. Wek mînak: bintî, ebî, zewc, zewcet, cedd, mu'tiq, ced, zewil-erham û hwd. Her wiha hejmarên parvekirinê jî bi Erebî ne. Wek mînak; sulus, sidus û hwd.

Xelîfe Yûsif di *Feraîzê* de, di rûpela serî de bi zimanê Erebî Sûreta Nîsa, Ayeta 7an dest pê kiriye û dîsa di rûpela pêncemîn de jî hedîsa nebî ya li ser mijara feraîzê bi zimanê Erebî hatiye nivîsandin.

Hema hema di hemû hevokan de mirov dikare rastî du sê peyvên Erebî bê di vê berhemê de.

2.5.2. Unsûrên Farisî

Xelîfe Yûsif piranî xebatên xwe bi zimanê Kurdî kiriye lê zimanên din jî baş dizanîbû. Dema me li ser jiyana wî lêkolîn kir, me li gelek cihan dît ku li ser zimanê farisî jî vaqif e. Hesên Akboğa jî vê taybetmendiya Xelîfe di teza xwe de diyar

kiriye.¹²⁰ Di *Feraîzê* de em zêde rastî peyvên farisî nehatin. Lê belê peyvên hevpar ên Farisî û Kurdî dihewîne. Wekî mînak: cuda, jêr, nîv, jin, bi, eger, wê/wî, kes, çi...

2.5.3. Unsûrên Tirkî

Xelîfe Yûsif di berhemên xwe de peyvên Tirkî gelek caran bikar aniye. Ev taybetiyeke axaftina Serhediyên e. Li vê herêmê peyvên Tirkî û Kurdî bi hev re tê bikaranîn. Em dikarin mînakên di pirtûkên nivîskarên din de jî bibînin. Önder Baytar ji bo vê mijarê Erebe Şemo wek mînak nîşan daye di teza xwe de, wekî mînak “orta gund” (r-134 Şivanê Kurmanca).¹²¹

Dibe ku qedexebûna li ser zimanê Kurdî jî bibe sedemê ji bo bikaranîna zimanê serdest, ango Tirkî. Belkî di zimanê nivîskî de nivîskar baldarî didin li ser vê mijarê, lê di axaftina rojane ya gel de, bi taybetî di nav gelê serhedê de Tirkî pir tê bikaranîn. Ev bikaranîn herî zêde di lêkeran de tê dîtin.

Di *Feraîzê* de jî gelek mînakên vê hene:

Weya (an/ango), rûpel 6, hevok 7.

Lakin (ango), rûpel 8, hevok 1.

Fezle (zêde), rûpela 16, hevok 14.

Şeyek (tiştêk), rûpel 6, hevok 14.

tu şey (tu tişt), rûpel 11, hevok 12.

emma (an), rûpel 20, hevok 4.

aîlet (malbat), rûpel 24, hevok 14.

daha (êdî), rûpel 8, hevok 10.

mutleqa (yeqîn), rûpel 20, hevok 13.

sahîb (xwedî), rûpel 6, hevok 20.

¹²⁰ Hasan Akboğa, *Xelîfe Yûsif û Teqrîza Wî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bingölê, Enstîtûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Çewlig 2017, r.27

¹²¹ Önder Baytar, *Dîwana Mela Ehmedê Heyderî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê, Mêrdîn 2013, r.43

3. METNÊN TRANSKRÎPSÎYONÊ

Heta niha me behsa jîyan, perwerdehî û cihên ku Xelîfe Yûsif lê jiyane kir. Her wiha me behsa rewşa siyasî ya serdema ku Xelîfe tê de jiyaye jî kir. Em ê di vê beşê de transkrîpsiyona berhema Xelîfe Yûsif a bi navê *Feraîzê* pêşkêş bikin.

KÎTABA FERAIZÊ

(Rûpel 0.) Kîtaba feraizê (ji mercanên feraizê) ango meselên parkirina malên miriyê.

Xudayê Teala gotiye:

Heye jî mêr û jinan re parek kifş e ji malê ku dê û bav û eqrebayan piştê mirina xwe hiştine. Ew mal çi hindik, çi jî pir be (Sûretê Nîsa, Ayet 7). Ji pêxember (s.x.l) hatiye riwayetkirin. Du kelîme hene ser zimanê sivik, di şîhîne de giran, li bal Xuda jî pir tene hezkirin. Ew jî ev in:

Hatiye rîvayetkirin ji resûlê Xwedê a.s. Sibhanallah sed caran ku mirovên Sibhanallah dibêjin wekî sed koleyan ku ji weledê Hz. Îsmâil hatiye azadkirin, di xêrê de beranberê wî ye.

Sed car peyva Elhemdulillah ku mirov bêje beranberê xêra sed hespên zîm kirî û gem kirî di rêya xwedê de ku li ser tê barkirin, beranberê xêra wî ye. Wellahu ekber ; dîsa mînanê sed deveyên ku hatiye nîşankirin û hatiye serjêkirin di Mekkehê de beranberê xêra wî ye. Kelîma Lailaheillahê mirov ku bêje xêra wî mînanê tijîbûyîna mabeyna erd û asîmana ye.

(Hedîsê nesaî, El Hekîmû Tederanî rîvayet kiriye.

(Rûpel 1.)¹²²

Sahîfe	Satir	Xeletî (xeta)	Rastî(Sewab)
4	12	hems	xems
4	15	menfese	suduse
4	15	2	3
4	15	hems	xems
6	6	mekret	megot
6	19	teku	nekû
7	13	beyt	bint
8	14	laften	lafzen
11	18	nal	bal
16	11	jinav	ji bav
18	17	nîne	tîne
30	12	heta	haleta
31	8	elma	elimal
22	14	selas	selaset
32	17	we lîlwereset	welîlweresetê tiz'etûn
35	3	meqewlûhû	feqewlûhû
35	8	(1/2)	(1/3)
35	15	zêdeyên	zêdebin
37	11	we ex uxt	we ex we uxt
42	02	xuhat	Xuhên
43	05	hem wedeke	Hem weledeke
43	13	îb	ev
43	15	eb	ev

¹²² Ev Rûpel li ser sererastinên çend peyvên ku di berhemê de şaşitî hatiye nivîsandin e. Lê belê em nizanin ka ewî bixwe rast kiriye an jî li çapxanê hatiye rastkirin.

47	07	diwada	diwîda
48	07	hem	hem
48	20	mûbanîna	mûbayîna
49	1	herdun	herdûwan
49	03	re çil	ji çil
49	19	tekzîma	tekzîba
49	19	zuwêcet	zewcet
50	8	kurte	kurne
50	9	hemzêde	hem zêdekirine
50	15	heft	hev in
51	11	raqisma	qisma
52	11	şeşayeb	şeşaye
53	19	lesîb	nesîb
55	2	şafiî mezhebê	mezhebê henîfi
55	06	mudlenim	mûde genim
56	16	tesebûhen	tesbîhan
56	28	ju	ji bo

(Rûpel 3.)¹²³

Ey ummiyê ku hûn erebî nizanin

ji we re mizgînî ye ger hûn bizanin

Kesê wî bixwîne ji dil û can

wê bibe feqîhekî xebîr û zana

Bi tewfîqa xelaqê erd û esmana

¹²³ Di vê Rûpelê de hinek Erebi û hinek Kurdî hatiye nivîsandin ya Kurdî me bikar anî.

Bi cahê şefîê cumle îns û cana
Sed hezar selat û selam her zemana
Li ser wî al û eshaba her weqt hîn û ana

Nivîskarê vê pirtûkê:

Ebdullah kurê Mehmûdê neqşîbendî yê ku muhtacê bal rehmeta Rebbê xwe
yê Qedîr ve ye.

Ya Xuda tu wî ûsûl û furuên wî û gişt bawermendan bibexşînî, Amîn, Hîcrî
1379, mîladî 1960, Rumî 1375

(Rûpel 3.)¹²⁴

Bîsmîllahîrahmanêrahîm

(Rûpel 4.)¹²⁵

Eva kîtaba feraizê ye. “(Mesele tu bizan)¹²⁶ ango mesele tu bizane (Tedaxul)
ew e ku du ‘ededên yek biçûk yek mezin wekî 2 û 6 û 3 û 6, 4 û 8. Tu yê biçûk ji yê
mezin du caran weya zêdetir bavêjî fena dikî wekî niha ev mîsalê me got:

(Tewafuq) Ew e ku du ‘ededên tedaxul tê de carî nabe wekî niha 6 û 8
‘ededek salis ji xeyrê wahid ku isneyne herdu wan jê fena dike. Wekî niha 6 û 8, hem
8 û 12.

(Tebayûn) Ew e ku herdu tê de carî nabin, wahid herdu wan jê fena dike wekî
niha 2 û 4 û 5 û 6 yanî kullê ededê kit (fer) û cût.

(Temasûl) 3, 3 û 6, 6 û 4, 4 (Enwar cild 2, sahîfe 8).

Ev tablo bi zimanê Erebi cetvela hesabkirina feraizê ye.

¹²⁴ Di vê Rûpelê de bi zimanê Erebi ji bo Xwedê û nebî zikir hene.

¹²⁵ Di vê Rûpelê de cetvela feraizê heye li ser hesaba matematîkê bi peyvên Erebi.

¹²⁶ Ji niha pê ve ev gotin dê wek (M.T.) bê nivîsîn.

[صورة وان عددكو چند فرض تداهنه]

٨ ثمان ربيع ٢ ١ نصف ٤	٦ سدس ١ ثلث ثلثان ٤ ٢ نصف ٣	٤ ربيع ١ نصف ٢	٣ ثلث ١ ثلثان ٢	٢ نصف ١
١٥ خمس ثلث ٥ ٣ ثلثان ١٠	١٤ سبع ٢ نصف ٧	١٢ سدس ربيع ٣ ٢ ثلث ثلثان ٨ ٤ نصف ٦	١٠ عشر خمس ٢ ١ نصف ٥	٩ تسع ثلث ٢ ١ ثلثان ٦
٢٤ ثمان ربيع سدس ربيع ٦ ٤ ثلث ثلثان ١٦ ٨ نصف ١٢	٢١ سبع ثلث ٧ ٣ ثلثان ١٤	٢٠ عشر خمس ٤ ٢ ربيع نصف ١٠ ٥	١٨ تسع سدس ٢ ٢ ثلث ثلثان ١٢ ٦ نصف ٩	١٦ ثمان ربيع ٤ ٢ نصف ٨

Bîsmîllahîrrahîmannîrrahîm

(Rûpel 5.)

(Tu bizan) Hatiye rîwayetkîrin ji pêxember (s.x.l) ku wî ferman kiriye gotiye: “Hûn feraizê bizanin û bi mirovan bidin zanîn bi tehqîqa ez mirovek meqbûd im yaxnê (ango) ez ê îrtehal (bar) bikim bal axretê va. Hem bê tehqîqa wê ilm bête qebidkîrin. Hem wê zahir bibe fitne bi terzek wisa ku duduwê muxtelif bit di ilmî feraizê da ew ê rast neyên kesek ku hukum bike di mabeyna wan da, bi kifşkirina nesîbê wan ji mîrasê.” (M.T.) Eger hec li ser yekî wacip bû, wî hec nekîr heta ku mir wacibê heckîrin ji ber wî bi ûcretulmisil ne ku zê ji mîqatê şehre wî. Eger

terîka(mîras) wî hebe. We illa fela çê wesiyet bi hecî kiribe çî ne. Eger wî wesiyet kir bi zêdeyî ji ûcretilmislî. Wî jî sulusî bê îxrackirin. Her wekî heca ku wesiyet kiribe. Li nik edema wucubê li ser wî. Ew ê jî sûlûsê be. (M.T.) Ne Durêste teserrufa warisa di şeyek ji terîket pêşiya hec kirina ji ber vê, her wekî daîna cemiî duyûnet ku bi terîkeyê ve girtiye. Ev meseleteke ku kesirê ji nasa jê xafilîn lazim e hişyarkirin li ser (Buxyetul mustehşirin sahife 121). Hem ewî dîsa (pêxember) ferman kiriye û gotiye hûn feraîdî bizanin lewra ew jî dinêwe ye û hem ew nîvî ilmî ye, hem ew ewêlê ilmî ku bête hildan ji nav ûmmeta min. Hem dîsa pêxember (s.x.l) ferman kiriye gotiye çî kesî bizane meseletek ji ilmî feraîdê ew dê be disewaba de (di xêrê de) her wekî ew kes ku deh ebd di rêya Xudê da azad kiribe.

(Rûpel 6.) M.T. Wacibê evvele bê îxrackirin ji terîketa meyîtê mesarifê techiza wî paşî bê edakirin, duyûnê wî çî deynê mexluqa çî deynê Xudê ku zekat û nezr we kefarete we ucureta ji ber ve heckirin. Eger hec li ser wacib bûye nekiriye we mînanî wan. Paşî wê bê pêkanîn wesiyeta wî ji sulusa terîka mayî piştê ixraca evê me got yê baqî ji bo wan saneh(warisan e).

(Faidetûn) Ger du zarokên bihev ve bin du serê wan çar destê wan, çar lingê wan, hebên ibnu qettan rehma Xudê lê be gotiye ew weka du heban in dê temamê ehkamê Xweda jî hicbê û irsê û xeyrê wan, Xuda çêtir dizane (Şerha tertiv ewel sahîfe 23). (M. Tu bizan) Waris ji ricalan (mêr), pazdeh in. (Bav) (Bavê bavî ye) Eger çiqas here jor (Hem kur e) (hem kurê kurî ye). Eger çiqas berjêr ve herin Hem (Birayê ji dê û bavek) (Hem bira ji bavek), (Hem birayê ji dê) ne ku ewladê wan. Yanî birayêd ji dê lewra ew ji zewilerham¹²⁷ e. (Hem kurê birayê ji dê û bavê) (Hem kurê birayê ji bav) Eger çî qas ber jêr herin (Hem apê ji dê û bav) (Hem apê ji bav) (Hem kurê apê ji bav) çî apê meyyit(mirî) çî apê bavê wî, çî apê kalkê wî (Hem kurê apê ji dê û bav) Eger çiqas berjêr herin hem (zewc) Eger çî zewcet (jin) reciyye¹²⁸ be pêşiya temambûna iddetê bimre (Beycârî sahîfe 70). Hem sahibê welaê (kolê) yanî mu'tiqê ew ê ku 'ebd azad kiriye. Wela ji bo wî ye.

¹²⁷ Zewilerham=eqreba

¹²⁸ Riciyet= telaqa berdana ku jê re zivirandin heye.

(Tu bizan): Waris ji jinan deh in. (Keç e), (hem keça kurê ye), (hem em e), (hem ceddê e) ji teref bavê. Eger çi diya bavê bavî be, (hem ceddê ji terefê dê) ne ku diya bavê dê, lewra ew jî zewîlerham e.

(Hem xuha ji dê û bab) (hem xuha ji bab), (hem xuha ji dê) ne ku ewladê wî (hem jin, hem mu'tiq e) yanî jina ku 'ebd azad kiribe. Mesela paşî ku kullê van nebûn, terike jî beytulmalera ye eger muntezem be we illa wê bê redkirin li ser sahibê ferda, ji xeyrî zewc we zewcetê, bi nisbet parwan paşî ku kullê vana nebûn wê bi serfkirin bal zewilerhamê ve.

(Rûpel 7) (M.T) Zewil erham panzdeh in. (Ewladên keçan), (hem keçê keçê kuran), (îanet per 221). (Hem ewladê xuhan), eger çiqas ber jêr herin (hem keçê biran), (hem keçê apan), eger çiqas ber jêr herin, (hem apê dê), (hem xal), (hem xaltî), (hem met), (hem bavê dê), (hem diya bavê dê), (hem ewladê birayê ji dê) ne. Emma embiya, irsiyet ji wan nayên birin, belkî terîketa wan piştê mewta wan sedeqe da weku kes ji warisê wan xweziya mirina wan nekin, heta bi wî helak bin, hem da weku sewaba wan zêde be (Şerha Tertîp, per 17).

(M.T.) Zemanê ji meyyitek çi zikur çi uns, ma kullê recalan, ji wan irsiyet dibin (sisê) ku (bav), (kur) we (zewc) feqet eger ji meyyit ma kullê nîsa, ji wan irsiyet dibin (pênc) ku (bint), (we binta ibn) (hem em) (hem uxta ji ebweyna) (hem zewcet). Eger ji meyyît çi zukur uns mane du sinif ji wana ji xeynî zewc weya zewcetê ji wan jî irsiyet dibin pênc ku (bav) (we dê) (we kur) (we keç), (hem zewc).

(M.T.) Eger ji meyyitek ma recalek, ew kullê mal debit dike, ji xeyrî zewcê mutleqa hem ji xeyrî exê ji emê eger beytûlmal muntezem we illa ew ji kullê mal debit dike eger ji meyyitek ma jinek ew ji kullê mal debit dike li nik reddî ne ku bi red wek niha ji zewcê ma zewcet, weya bi 'eks ji xeynî jina mu'tiqe lewra ew debit dike.

(MT) Esbabê irsiyet birinê (çar in) (qerabet) (hem nîkah), (hem wellaê) (hem îslam) bi wan cihê ku tê serfkirî bal beytûlmalê.

(M.T.) Eger yek mir tu warisê bi hersê esbabê irsiyet birinê ji nemal weya zêde ma, ji ber xweyê ferda şeyek ji terîketê ew ê bighîje beytûlmalê eger muntezîm

be, we illa wê bê redkirin li ser xweyê ferda, li ser qewlê sehîh murecch ku pê tê fetwa dayîn.

(M.T.) Hinga zewil ehram irsiyet dibin, li nik nebana xwe yê ferda.

(M.T.) Zemanê beytûlmal muntezem nebû hem hate hukumkirin bi edem redda li ser xweyê ferda, hem bi 'edem irsiyetbirina zewilerhama, çawa ku ew jî muqabilî racihî ye, eger di beldê da, qadiyek hebû bi şurutê wî, hem mezûnê di teserrufa di mala (Rûpel 8) mesalihê musulmanan da.

Ew ê mal bê def'îkirin bal wî qadîyê we. Eger qadî di beled da tunebe, weya hebe lakî şurutê wî têda tunebe, hem ew mal jî di destê yekî emîn da be, ew ê bixwe serf bike bal mesalihê musulmanan. Eger qadî bi şurutê wî hebe lakîn ne mezun be, di teserrufê da, gelo ew ê bi dayîn ji bo wî, weya ew bixwe serf bike weya ew ê bê hiştin, heta zahir be beytûlmal ya eseh ew e ku bi dayîn ji bo qadî. Eger qadî tunebe, weya hebe lakîn zalim be ew ê mal bê def'îkirin bal alimek mutedeyyîn ve. Eger ew jî tunebe wê bi def'îkirin bal li yek salihê mueyyen ve ku ew jî wî malê serf bike di cihê wî da ku mesalihê musulmanan e. (Faîdetun)

(M.T.) Kesîrê ji nasa di heyata xwe da be'dek ji kurê'd xwe cuda dikan. Qederek ji malê xwe didin çî hindik(qelîl) çî zehf(kesîr). Hem dibêjine wan ku nesîbê we ji malê min ew e. Çî di heyatê çî piştê mewta min, tu nesîbê we di malê'd min da nîne. Weya keçê'd xwe didin mêt, dibêjinê tu nesîbê wan êdî(daha) di malê min da nîne ewana bi vê gotinê ji warisbûnê nakevin. Belkî şîrîkê yê mayîn in di tamamê terîketa meyyîtî da. Eger çî bigotina wî razî bibin di heyata wî da bi huzura şahida illa wekî meyyît pêşiya merda mewtê di wexta sehta xwe da tamamê malê xwe, hibbeyê li ser warisê li nik xwe bike. Ew jî lefzen qebûl bikin bi huzûra şahida. Eger balix bin weya ew bide wanê ne balix û hem jê ra qebûl bike lefzen bi huzûra şahida. Hem piştî mewtê li ser muamelata wî şahidê bidinê. Paşî ew kur û keç ji wî malê bê nesîb dibin. Ne ku cudakirinê we zewicandinê we qelendayînê, we maldayîne wan dê heyata meyyîtî da. Çawa ku kesir ji melayêd bê ilm wusa zen dikan. Wan ji terîketê mehrum dikan, dibin hamilê gunehê wan.

(M.T.) Eger be'dek ji warisa mesela weya xeyrî wan de'wa deynekî li ser meyyîtê kir weya dewa eynekî ji terîketê nayê guhdan ew de'we illa bi du şahidê adil weya bi tesdîqa warisa. Eger hindekî ji warisa tesdîq hem hineka jî înkâr kirin ew muddeayê bê parî vegerin li ser hisseta wan ji terîketê. Her çi tesdîq kirine wê miqdarê (Rûpel 9) ku bi hesseta wî ve girtiye wî eda bike.

Ne ku xeyrî wî eger waris muxtelif bûn, di eynekî ji terîketê, çi ew 'eyn xasê bi zukura (mêr) be wekî niha tiving û şûr e çi xasê bi jinan be wekî niha xişir jinaê eger şahid ji bo terefekî hebe wê bê hukumkirin bi şahida. Eger şahid ji bo herduwan jî hebe şahidê herduwan saqit dibin. Weya qet şahid tunebin ew terîketê di mabeyna warisan da.

(M.T.) (Firudê muqedder di Qur'anê da şeş in (yek ji bo nisf e) ew ji bo (pênca ye) ji bo (zewcê) zemanê ji zewcetê nemabû weled eger çi ji zînayê be, hem weledê ibn çi ji wî zewcê çi ji xeyrê wî çi zukur çi uns (hem nisif) (ji bo yek keça sulbê ye) (hem ji bo yek keça ibnê ye), (hem ji bo yek xuha ji dê û bavê ye), (hem ji bo yek xuha ji bavê ye). Mîsala wî jinik mir jê ma zewc, ev xuha wê ya ji ebê ve.

Hem yek ji firûda rubu'e (çaran yek) ew ji bo duduyan e (ji bo zewc e) zemanê ji bo jinê hebin weled weya weledê ibn.

Ewêd waris bo ku mani' irsiyet birinê bi wan ve tunebe ji murtedbûn we qatîlbûn we xeyrî wan we illa ew î kel'edemê (çawa tunebe).

Çi ji wî zewacê be çi xeyrê wî çi neseba weled sabit be çi ne weya menfîî bilîanê weya ji zînayê be (şerha rehebî ewel per 78). (Hem rubuê ji bo zewcetê ye) çi yek çi zêde. Ger çi deh bin wekê niha di nîkaha kafîrada ye bê weku ew we zewca wan we misilman bûn pêşiya îxtiyariya çaran ji wan zewc mir caiz e gerandina sumunê di nabeyna wan da bi sulhê wek hev weya zêde. (Eger çi ew zewc newetandîbe). Hem eger çi çar bin we. Eger çi rec'îye bin hingê ku di 'ededa be, ne ku bayîne bi xelafê her sê îmama. Yanî hetta ku îddeta bayîne tamam nebe. Zemanê ji bo meyyît nemabû weled hem weledê ibnê ewid waris.

Ne ku weledê zînayê lewra ew ji bavê xwe irsiyetê nabe. Çi ji wî zewcetê çi ji xeyrê wî çi zukur çi uns çi xunus.

(M.T.) (Yek ji furuda sumun e) ew ji bo zewcetê ye çî yek çî zêdetir. Eger çî deh bin wekî niha di nîkaha kafiran da ye. Weya be'dek ji wan rec'iyet bin eger ji bo zewcê weled weya weledê ibnê (Rûpel 10) ew ê nesîbê warisa hebe çî ji xeyrî wî çî zukur çî uns çî xuns (Beycurî 58)

(Hem yek ji furada sulûsanê) ew ji bo çara ye (ji bo du keçê sulbê weya zêdetir) (hem ji bo du keçê kurê ne weya zêdetir). (Hem ji bo du xuhê ji dê û bavê ne weya zêdetir). (Hem ji bo du xuhê ji bavê ne weya zêdetir in). (Hem yek ji firûda sulûse) ew ji bo duduyan e (ji bo ummê ye). Zemanê ji bo meyyît weled, hem weledê ibn nebin. Çî zukur çî uns, hem ji bo meyyît nebin du xuh we bira ji kullê cîheta. Ne ku ewladê wan yanî ji dê û bav weya ji bav weya ji dê, we illa ji bo wî sudûsê

(M.T.) Heye ji bo dê di suret ku zewcet mir jê ma (zewc 1/2) (hem dê û bav) weya zewc mir (jê ma zewcet) (we dê we bav) sulûsa ew ê mayî piştî ixraca zewc û zewcetê (meselayê ewel) 'eslê mes'eletê ji duduyan e sehîh dibe ji şeşa bi derbdana sisêyan ku 'ededî ruusê wan e di duduyan da dibe şeş. Sisê ji bo zewcê yek ji bo dê dudu jî ji bo bavê (mîsala yê sanî eslê mes'eletê ji çara ye yek ji bo zewcetê yek ji bo ummê hem dudu ji bo bavî ye. (Hem) sulûs ji bo duduyan weya zêdetir ji ewladê ummê ye çî mezkur çî ma uns, yanî mezkur ma uns musewetê nisfê mezkur zêdetir nîne. (Hem wê muşareket bike bi ewladê dî ra birayê ji dê û bav di meseleta muşrîketê da (ku zewcet mirîye jê ma zewc 1/2) hem um weya ceddê çî ji teref dê û çî ji teref bavî. (Hem du bira weya zêdetir ji ummê) hem yek bira ji dê û bavê (beyana mes'eleta muşareke) ji bo zewcê 1/2 nisif ji bo ummê sulus ji bo ewladê ummê 1/3 nema ji bo weledê ummê û emê tu şey'ek ew ê muşareket bike digel ewladê ummê di sulusê da çî yek bira ji ebeweyna çî zêde çî bira ve xuhek çî zêdetir. Yan zukur û keçên ewladê ebeweyna musewet e di sulusê da (3/1) her wek ewladê ummê div ê mes'eletê da çawa ku ewladê ummê û nasê we zukurê we in daîma musewetê di sulusê da (Şerha Tertîp per 67 Enwar per 4).

('Eslê mes'eletê ji şesa ye) ji bo zewcê 3 (Rûpel 11) ji bo ummê yek (1) ji bo ewladê ummê dudu (2) nema ji bo weledê dê û bavê tu şey, wê bê derbdan ededê ruusê biran ku sisê ne (3) di şeşan da (6) dibe heştdeh (18) ji bo zewcê neh (9) ji bo ummê (dayîkê) sisê (3) ji bo her sê biran, şeş (6) ji bo her yek dudu dudu (2).

(M.T) Ev mesele tê navdan bi mesela hîmariyye we minberiyîye we muşrike çima hatiye navdayîn bi min beriye ji bo ku ev mesele ji Hz. Elî hatiye pirsîn ser mînbera kufeyê. (Teshîlul feraîd per 101).

Weledê ebeweyna çî yek çî zêdetir, çî zukur weya zukur we ins bin ew ê muşareketê digel ewladê ummê bikin. Zukur we înasê wan.

Kur û keçên yanî ewladê ebeweyna misewetê da di sulûsê de (3/1) her wekî ewladê ummê di vî meselê de, çawa ku zukûr û înasê ewladê ummê musawî ne daîma (şerh û tertîb 67. Enwar 4) (hem mesela muşerrek e) ev e: ji zewcet mir jê ma zewc (2/1) ku îbn emm, hem kurmamê birayê wî ji aliyê dê ve. Hem sê birayên ji her sê cîhetan ve hem cedet.

Ji bo zewcê nisfê (nîvî) ji bo cedet sudûse (6/1) ji bo ewladên ummê suluse (3/1) exî ji ebeweyna muşareketê digel wan bike eslê wî ji şeşa ye (6) sehîh dibe ji heştdehan (18) kesîr ketiye li ser ruûsê biran. Hatiye derbdan ruûs di eslê mes'eletê da ku şeş e (6).

Tu şey ji bo exê ji ebê, hem ji bo zewcê we birayê ji ummê bi kurap tunîne (Şerha Tertîb 69).

(M.T.)Jinek hamile gotiye qewmekî ku terîketa jina meyyîtê teqşîm dikirin. Lez nekin bi teqşîm lewra ez hamile me, eger ez keçikek weya zêdetir bînim ew jî warîsatê terîketin e. Ez kurek weya çend kur û keç bînim ew irsîyetê nabin lewra ew esebetin ji ber xwe yî ferdan namîne ji bo wan. Suretê wî ev e zewcet mir jê ma (zewc) (1/2) um (1/6), ewladên ummê (1/3) ya hamile jina bavê jina meyyîte. Eger yek keç be ji bo wî nisf e, eger zêdetir bin ji bo wan sulusane. Mes'ele 'ailet e bal nehan (9) di suretê ewla da weya dehan (10) di suretê saniyetê da.

(M.T.) Ji bo mesela muşerreke çar (4) şert hene. (Ya ewla) ev e ku xweyî sudusê tê da hebe ji ummê we ceddetê we îlla wê sudus bimîne ji ewladê ebeweyna şirket nîne wekî niha zewc (1/2), we du birayê ji ummê birayek weya zêdetir ji ebeweyna. (Rûpel 12) (Ya duduyan) ew e ku ewladê ummê zêdetir bin jî yekî we îlla wê sudus (1/6) bimîne ji bo ewladê ebeweyna şirket nîne wekî niha zewc (1/2), we ceddet (1/6) yek birayê ji ummê (1/6), birayek weya zêdetir ji ebeweyna.

(Yê sisêya) ew e ku di ewladê ebeweyna da zekera hebe, we îlla wê mesele bê ewlkirin ji bo uxtekî nisif ew dibe mesele bal neha weya bal deha bi sulusanî. Eger uxt dudu weya zêdetir bin wekî niha zewc (1/2), we ummê (1/6) hem du birayê ji ummê (1/3), we uxtek ji ebeweyna weya zêdetir ji (çara) ew e ku di wê da zewc hebe we îlla îstîxraq çênabe wekê niha (um (1/6) du birayê ji ummê (1/3) birayek weya zêdetir ji bavê). (M.T.) Eger ji yek (ma cemî'ek) ji ewladê ebeweyna, ji zukur, ji înasa hem ewladê di eb ewher wekî ku jê mabe ewladê sulb digel ewladê ibnê (lakin keçêd ibn) digerin esebê bi ew e di dereca wan da. Hem ew ê ji wan esfeltir ji birayê we kurê apê (emma uxta ji ebê) nagere esebê ba wî di dereca wî da.

(M.T.) Eger ji yekî ma du xuhê ji ebeweyna (2/3) (hem) uxtek ji ebê (hem) ku birayek ji ebê ji bo herdu wê ji ebeweyna (sulusane) yê baqî ji bo ibnê exî wî ye. (Hem) uxta ji ebeweyna hem uxta ji ebê digerîne 'esebê digel bintê sulbê we binta ibn hem uxta ji ebeweyna saqit dike uxta ji ebê çawa ku exê ji ebeweyna saqit dike exê ji ebê. (Hem kurêd birayêd ji ebeweyna we ebê di dereca apa xwe da ne di haletî îçtîma we înfiradê da lakîn ewana diya meyyîtê ji sulusê red nakin bal sudusê hem ewana muqaseme digel ceddê nakin belkî ew bi ceddê çi qas here jor saqit dibin. Hem evana xuhêd xwe nagerînin 'esebe. Lewra xuhêd wan ne waris in 'esla. (Hem evana yanî kurê birayê saqit dibin di mes'eleta muşareketê da). Hem kurêd birayê ji ebeweyna hucba birayê ji ebê nakin lakîn bavêd wan hucba wan dikin hem (exê) ji ebê hucba kurê birayê ji ebeweyna dike, ne ku kurê wî.

(MT) Hem ji ebeweyna, hem ji ebê her wekî exî ji herdu cîhetane di haletê îçtîma we înfiradê da. (Rûpel 13) Wiha qiyas bike kurê maman jî. Hem yek ji furuda suduse (6-1) ew ji bo heftaye ji bo bavê ye zemanê ji bo meyyît hebûn weled weya weledê ibnê çi kur çi keç çi xunsa. Hem ji bo kalikê ye jî, wisa hem ji bo dayîkê ye. Eger ji bo miriyê hebin weled weya weledê inbê weya hebin didu, ji xuh û birayê ji tamamê ciheta.

(MT) Carna bav irsiyetê dibe bi ferdê bê we ku digel wî hebe îbnê meyyît weya kurê kurê wî, hem carna ji irsiyetê dibe bi 'esebebûnê. Bê wekû ji bo meyyît nebe weled him weledê kurê, hem carna bav irsiyetî dibe bi ferdî hem bi 'esebebûnê bê weku digel babê hebe keç weya du keçê kurê miriyê. Ji bo ebê (babê) suduse bi ferdê.

Hem yê bavê ji ber ferda herduwan e bi ‘esebebûnê wuha ye hukm ceddê ji lakîn bav saqit dike xuh û birayan ne ku ced lewra ew ê muqaseme digel wan bike. Hem bav saqit dike diya xwe, ced (bapîr) saqit nake diya bavê miriyê. Hem bav reddê diya miriyê dike ji sulûsa meciê malê bal sulusa ma yebqayê. Ced red nake. Mîsal: jê yek ma zewc dê, bapîr.

Hem sudus keça kurî ye çî yek çî zêdetir digel yek keça sulbê hem digel keça kurikê ku ‘latire ji wî wekî niha. Keça kurê kurê ye ji bo wî sudus e digel keça kurê, ji bo wî nisfe. Ema digel du keçê sulbê we zêdetir tu tişt ji bo wan nîne îlla wekê bigerin ‘esebe bi kurek ku bira we kurapê wan e (iane per 226).

(M.T.) Kurê kurê digerrîne esebe ewê di dereca xwe da wekî niha xuh keçê apê hem ew ê di fewqa xwe da wekî niha kurê kurî ye digel keça kurê di cihê we ku ferd ji bo wî nebe ku sudusê wekî niha keça kurî digel yek keça sulbê hem kurê kurî ye. Di vir da ji bo keça kurê sudusê (6-1) ew ne ‘esebeye îlla wekî keça sulbê digel wî nebûya (iane 232).

(M.T.) Ewladê kurê kurî digel ewladê kurê her wekî ewladê kurê ye digel ewladê sulbê hukum wiha ye: Eger çî çend derece berjêr herin yanî eger dawîyê dereca jor da zukur (mêr) hebin tu tişt ew ê ji dereca jêr da nîne, her wekî ewladê (Rûpela 14.) sulbê digel ewladê îbnê eger kur tunebin hukum her wekî ku di ewladê sulbê da zukur nebin digel ewladê (siracul wehhac per 324).

(Hem sudus) ji bo xuha ji bavî çî yek çî zêdetir digel yek xuha ji dê û bavê ne ku digel duduyan lewra ew tê hecipkirin. [Hem sudus] ji bo yek ji ewladê ummê ye çî zukur çî uns. Hem [sodus] ji bo ceddetek e weya zêdetir. Eger çî ew ceddêt bigihêje meyyîtê bi çend ciheta çî ji bo meyyîtê weled hebin çî ne. (iane û enwar per 3...)

(M.T.) Eger dereca ceddên mesawiye di qerba bal meytê wekê niha diya dê ye weya diya bavê ye. Ew ê muşareketê bikin di sudusê da wê bê teqşîmkirin da mabeyna wan da li ser ‘ededê ruûsa.

(M.T.) Ceddât hinga ji bo wan sudus e, eger bighêjine meyyîtê bi xalis jina, wekî niha diya diya diya dê. Mesela weya bi xalis zukura wekî niha diya bavê bavê bavê ye. Eger çiqas bi jor ve herin.


(M.T.) Ceddât li ser çar qisman e (qismê ewel) ev e ku ew ceddêt digihêje meyyîtê bi xalis jina, wekî niha diya diyê weya diya diya dê, eger çiqas here jor.

(Qismê duduyan) ew e ku bigehêje meyyîtê bi xalis mêran, wekî niha diya bavî ye, weya diya bavê bavê ye. Eger çiqas here jor.

(Qismê sisêyan) Ev e ku ew digihêje meyyîtê bi xalis jina, bal xalis mêran, wekî niha diya bavê meyyîti ye weya diya diya diya bavê bavê bavê meyyîtiyek, yan neketibe di mabeyna diya da mêrek wekê niha diya bavê dê weya dêya dêya dêya bavê bavê bavê diya dê ye mesela.

(Qismê çaran) Ev e ku ew ê di digihêje meyyîtê bijintî ku ketiye, dê mabeyna wan da mêrek weya zêdetir. Çawa ku burîye lewra ew ceddeta derewîn e ew nabe waris (I'ane cild 3 per 225)

(M.T.) Naskirina kesirê jî ceddât ku warîs bin, ji ewêd xeyrê waris ew e ku tê di stara keda çend ceddât ku Îrade tu dixwazî zikir bikî. Îdafa bikî bigihîne meyyîtê mesela bêje diya diya meyyîtê (paşî) di setara (rêza) sanî da wê qederê zikir bikî. Lakîn di bedelê diya axir da bavek zikir bikî mesela bijî diya diya diya diya bavê miriyê, paşî di rêza sisêyan da di umma bedel bikî bi bavan. (Paşî) di setara (rêz) çara da (Rûpel 15.) sê umma bedel bikî bi bavan, (paşî) di rêza pêncan da çar umman bedel bikî bi bava. Wiha rengê yek yek ji bav zêde bikî ji umman kêmbikî heta rêza dawiyê tamamê wî bi bavan bigihêje meyyîtê mesela wiha.



129

Fesl (M.T.) ‘Esebe ew in ku irsiyetê dibin temamê terîketê li nik nebûna xudanê ferda hem yê zêdetir ji ferda li nik hebûna xudanê ferda.

¹²⁹ Tabloya rêza dê û bavan: diya, diya, d, d,.....bav, b, b, b.....

(M.T.) Eger ji yekî ma du kur ap mesela ku yekî ji wan birayê wî bû ji dê ji bo ew ê ji dê sudusê bi ferdê çî yek çî zêdetir hem yê baqî jî di mabeyna wan da ye bi ‘esebabûnê (Şerhû Tertîb per 37).

(M.T.) Eger jinek mir jê ma (Rûpel 16.) du kur ap yek ji wan birayê wî bû ji dê. Hem ji ma zewc (1/2) hem um eslê mes’eletê ji şeşa ye ji bo zewcê sisê, ji bo ummê dudu , ji bo exê ji um sudus. Tu şey nema ji bo yê axir. Çawa ku ji bimîne ew her du kurap, hem bintek ji bo bintê nisfê, yê mayî mabeyna wan da lewre cihetê weletbûna ji ummê mehcûbê bi bintê. (Şerhû Tertîb per 29)

(M.T.) Eger jinek mir, jê ma zewc (1/4) ku kurapê wî ye hem 8 keç (2/3) mes’elet ji dozdehan e, 8 ji bo keça, 4 ji bo zewc, 3 bi ferdî ye yek jî bi ‘esebabûnê (Şerhû Tertîp per 150).

(M.T.) Muqademe ji ‘eseba kurê (paşî) kurê ibn. Eger çî qas berjêr here, (paşî) muqademe bav e, (paşî) bavê bav e eger çiqas berjor ve here. Emma bira we xuh we kalik, ew ê teqşîm biken malî di mabeyna xwe da ji bo her mêrek bi qederê nesîbê du jina (paşî) ‘esebet birayê ji dê we bavê (paşî) birayê ji bav, (paşî) kurê birayê ji dê û bav, (paşî) kurê birayê ji bav eger çiqas berjêr herin. (Paşî) apê ji dê û bav, (paşî) apê ji bav, (paşî) kurê wan jî kezalig. Eger çiqas berjêr herin, (paşî) apê kalikê ji bav, (paşî) kurê wan jî kezalig, eger çiqas berjêr herin (Beycûrî per 76). (Paşî) ‘esebe mu’tiqe yanî ew ê ku ‘ebd azad kiriye ku seyyîd e, (paşî) ‘esebatê wî ye eger mu’tiq ku ‘ebdê mir ‘esebatê wî nesebê nebûn kullê terîketê wîya ew qeder fezle maye ji ber xwe yê ferda ji bo seyyîdê weya esabetê wî ye bê wellaê bê we ku ji ‘ebd maye. Bint (1/2) weya xuh (1/2) weya um (1/3) (Enwar per 5). (M.T.) Eger mu’tiq mir jê ma kur we keç weya xuh û bira, xasse istihqaqa ‘esebabûnê bi zukur ne ku ji bo unasa lewra ew irsîyetê nabin bê wellaê illa ji mu’tiqê xwe. (M.T.) Wê bê muqedemekirin kurê mu’tiqê hem kurê exê wê li ser ceddê bi xilaf nesebê. (Paşî) esebê mu’teq mu’teqî ye kezalig.

(M.T.) Eger ji mu’tiq ma du kurap ku yek ji wan birayê mu’tiqê bû ji dê, kullê malê ji bo ew ê ji dê ye, tu şey ji bo yê axir nîne (Şerhû Tertîb 39)

(M.T.) Eger jinik bavê (Rûpel 17.) xwe yê ‘ebd kiribû ‘hûr (paşî) bab ji ‘ebdek azad kir (paşî) ebd mir, piştî mirina bavê eger ji bo bavê tu ‘esebê nesebê nîne mîrasa ebdê digihîje keçê bi sebeb mu’tiq mu’tiqe ye ne ku keçîtî, eger ji bo bavê ‘esebe hebin wekî niha bira ve kurap we nehwe wan çî nêzîk çî dûr mîrasa ‘ebdê ji bo ‘esebetiyê ye ne ku keç. Lew be’dek ji nasa gotine 400 qazî xelet kirine di vê meselê da, lewra ewan hukum kirine ji bo keçê bi sebeb nêzîkbûnê, dîsa wiha ye hukum. Eger xuh we birayekî bavê xwe bikirin ‘ebdê bavê piştê bav bimre mîrasa ‘ebdê ji bo exê ye ne ku uxt e. (Şerha Tertîp cild 2, Rûpel 139)

(Fesl (M.T.)) Hicib nîne (ji bo bavê) (we dê we kur) (we keç) (we zewc))we zewcet) yanî hucbê hirman¹³⁰ e ku hicbê nuqsan¹³¹ (M.T.) hucba kurê kurê nake îlla ibn hem kurê kurek axir qerebetir ji wî.

(M.T.) Hicba ceddê nake îlla ew ê ketiye di mabeyna wî ve meyyîtê da wekî niha bavê. (Hem) hucba exê ji dê we bavê dîkin sisê. (Paşî) [we kur] (hem kurê kurê) eger çiqas berjêr here, [hem] hucba birayê ji bavê dîkin ev her sê [hem] birayê ji dê we bavê, [hem hucba wî dîke xuha ji dê û bavê digel yek bint] weya bintek ibn (Feth we îane 228).

(Hem hucba kurê birayê) ji dê û bavê dîkin şeş [bavê û ced] (we kur) [hem] (kurê kurê). Eger çiqas berjêr here (hem) birayê ji dê û bav (hem) birayê ji bav, (hem) hucba kur, birayê ji bavê dîkin ev her şeş (hem) kurê birayê ji dê û bav, (hem) hucba apê ji dê û bav dîkin ev her heft (hem) kurê birayê ji bavê (hem) hucba apê ji bab dîke ev heştana (hem) apê (Rûpel 18.) ji dê û bavê. (Hem) hucba kurê apê ji dê û babê dîke, ev nehana (hem) apê ji bav, (hem) hucba kurê apê ji bav dîke ev dehana (hem) kurapê ji dê we bava (hem) tê hecipkirin kurê kurê birayê ji dê û bav bi kurê birayê ji bab lewra ew nêzîktir e ji wî .(Feht we îane per 96)

(Hem) hucba mu’tiq (hem) mu’tîqetî dîke ‘esebatê mu’tîq ji nesebê wekî niha kur we biraê we bavê we ap mesela (hem) hucba keça kurê dîke kur hem du keçê sulbê zemanê du binta ibn nebe ‘esebe bi birayê xwe weya bi kurapê xwe eger çiqas berjêr here, yanî zukurek mesele heza unsêyn (Beycurî).

¹³⁰ Hucbê hurman= mehrûmkirin

¹³¹ Hucbê nuqsan =heqê wî kêr dîke

(M.T.) Ceddeta ji teref ummê hucba wî nake îlla ummê hem hucba ceddeta ji terefê bavê ve dike bav hem ummê. (M.T.) Ceddeta qereb ji kullî cîhata ve hucbaya dûr dike ji wî cîhetî (hem) hecb dike ceddeta qerebê ji teref dê, ceddeta dûr ji teref bavê.

Wekî niha diya bavê bavê. Lakin ceddeta qereb ji teref bavê weku niha diya bavê ew hucba ya dûr nake ji terefê dê wekî niha diya diya dê.

(M.T.) Hucba xuha ji hersê cîheta dike bav we kur û hem kurê kurê. Eger çiqas berjêr here her wekî bira ji wan cîheta (hem) hucba xuhê ji bav dikin ev hersê (hem) birayê ji dê û bav, (hem) du xuh û zêdetir ji dê û bav (hem) xuhek ji dê û bava jî ku digel wî bint weya binta ibn hebe. Eger digel wan nîne kesek ku wan bigerîne ‘esebe, (hem) hucba xuh û birayê ji dê dikin bav [we ced] eger çiqas here jor (hem) weled çî zukur çî uns eger çiqas berjêr herin. Hem weledê kurê çî kur çî keçe ger çiqas berjêr herin (îane per 228). (Welhasil) ewladê ummê têne hecibkirin bi şeşan (6) (ku îbn) (we îbn îbn) (hem binte) (we bînte îbn) yanî bifer’e waris ne ku qatil we kole(reqîq) we îbn we cedda (îanetuttalibin per 228). Hem hucba kullê ‘eseba dike eshabê furudê mustexriq. Wekî niha jinik mir jê ma zewc (1/2), hem ummê (1/3), hem weledê ummê (1/6) (hem eb) (Rûpel 19) bê ku di meseletê da hebûn zewc (hem) uxta ji ebeweyna (hem) exê ji ebê tê hecibkirin exê ji ebê bi zewc we uxta(hem) weku niha du xuhê ji ebê (2/3) (hem) du xuhê ji ummê (1/3) (hem) apê ji xeyrê xuha ji ebeweyna hem ji ebê lewra hucba wan nakin eshabê furudê mustexriqê belkî wê bê ferdkirin ji bo wan nisif ku sisê ne mesele ‘ewl bibe bê we ku zewcet mir jê ma zewc (1/2) we umm (1/6). Hem du uxtê ji ummê (1/3) hem uxtê ji dê û bav (1/2) weya ji bav eslê meselê ji şeşan e (6) wê ‘ewl bibe bal neha (9) ji bo zewc (3) ji bo ummê yek (1) ila axirihî (îane 227). Hem wekî niha du xuhe ji ebê (hem) xuhek ji ummê (hem umm) hem ‘emm.

(M.T.) Eger ji zewc ma zewcetê hur (hem) seyyîdê mu’tiqê wî (hem) weledê reqîq ew weled hucba zewcetê nake ji rebî’ê (1/4) bal sumûnê (1/8). Wiha ye hukmê weledê ê qatil û kafir jî yanî rubu’ ji bo zewcetê ye. (Hem) yê baqî ji bo mu’tiqiyek tu şey ji bo weled nîne (bi xîlafî van sureta) bê weku jê yek um we eb we du bira ji bo ummê suduse yê baqî ji bo bavê ye tu şey ji bo bira nîne. Dîsa wiha ye eger bimîne ummê we ced û hem ‘ededek ewladê ummê, (eger jê yek ma) um we

exek ji ebeweyna weya ji ebê digel ceddê hem exek ji ummê ji bo ummê sudus e yê baqî di mabeyna ced we exê şeqîq e. (Eger jê yek ma) um we uxtex ji ebeweyna we zewc (1/2) hem exek ji ebê. Ji bo ummê sudus e ji bo zewcê nisf e hem ji bo şeqîqe (xuha ji dê û bav) jî nisf e. Saqit dibe exê ji ebê ji bo istixraqa furuda tamamê terîketê (Şerha Tertîp per 73).

(M.T.) Kurê kurê nagerîne ‘esebetê keça meyyîte ye, hem kurê kurê kurê nagerîne ‘esebe keça kurê di cihê weka ferd ji bo wî heye we îlla digerîne ‘esebe ji ber ‘edemê musawata rutbeta wan (wiha reng e) halê birayê ji dê we bavê digel xuha ji bavê hem birayê ji bavê digel xuha ji dê we bav, ji ber ‘edema musawatan van digehîştina bal meyyîtê (Feth û îane per 223).

(M.T.) Ibn bintê digerîne ‘esebet yanî li zukur mesel heye unseynî. Hem kurê kur eger çîqa berjêr (Rûpel 20) here digerîne ‘esebe keça kur di cihê weka ferd ji bo keça îbn nebe bê we ka digel du bint ji sulbê evana hucba bintê ibn dîkin weya bintek sulbê, hem binta kurek, axir ku eqrebtire ji wî keçê be. (Emma cihê weka) ferd ji bo wî hebe wekê niha yek keça sulbê hem yek keça ibnê ji bo keça sulbê nisf e hem ji bo herdu binta ibn sudus e. Hem yê baqî ji bo ibn ibn ibnê ye. Emma exî ji ummê ew xuha xwe nagerîne ‘esebe belkê sulus di mabeyna wan da ye bi musawî (Beycurî 84). (Hem birayê ji ebeweyna) digerîne esebe xuhê ji dê û baban, (hem exê ji ebê) xuha ji ebê digerîne ‘esebet wekî niha zewc mir jê ma zewcet (hem exî we uxtex ji ebê).

(M.T.) Kurê kurê her wekî kurê ye lakin digel yek bintê ji bo wî bi du mislê wî nîne. Cedde her wekî ummê ye lakin tu cara sulus ji bo wî nîne ji xeyrê sudusê ced jî her wekî bavê ye. Lakin ew hucba birayê ji dê û bav weya ji bavê nake, exê ji ebê her wekî exê ji ebeweyna ye. Lakin digel uxta ji ebeweyna du mislê wî jê ra nîne (Fethul Muîn 231). (Hem bint e, hem) binta ibn çî yek çê zêdetir xuhêd ji ebeweyna hem jê ebê digerîne ‘esebet.

(M.T.) Xuhêd ji ebeweyna digel bint hem binta ibn û xuhêd ji bavê saqit dîkin çewa ku birayê ji dê û bavê birayê ji bavê saqit dike. Hem uxta ji ebê li nik ‘esebebûna bavan hucb dike kurêd birayê mutleqa çê kurê birayê ji dê we bav çê ji bav çewa ku birayê ji bavê hucba wan dike (îane 223). (Mesela ji yek ma du bint

hem du xuhê ji ebeweyna hem du kurê birayê ji ebeweyna weya du birayê ji ebê ‘eslê mes’eletê ji sisiyan e sehîh dibe ji şeşa tu şey ji bo kurê bira we birayê ji bavî nîne.

(M.T.) Çar hene ku ew irsiyetê dibin neku xuhê wan yanî ew xuhê xwe nagerînin ‘esebe (wekî niha e’mam) hem kurê wan hem kurê biraê (hem ‘esabetê mewlayê ye) yanî kur û qîzê seyyîdê wekî niha kurê mu’tîqe neku keçê wî.

Fesl (M.T.) Eger di meseleta ferdê nebûn wê ‘eslê mes’eletê ‘ededê ruusê warisa be bê weku xalis kur weya bira weya e’mam in. Emma xalis jin hinga çêdibe bê weku (Rûpel 21.) sisê ji wan ‘ebdek mesela azad bikin ne ku di xeyrî wî da.

(M.T.) Wê bêmuqedderkirên her mêrek bi du jinan eger waris mêr we jin bin (Faîdet).

(M.T.) Hikmeta ku nesîbê zukur bi du qeder nesîbê unsa ye ew e ku hinek ji sifate xassê bi wan in. Ku ew ji bo înasa (jinan) nîne. Wekî niha nusreta dînê we cîhadê we tehemmula eqîlê yanî dîyeta qetlê we selaheta ji bo îmametê we qedayê we xeyrê wan hem ji bo wan du hacet heye ku haceta nefsa wî we zewceta wî bi xîlafê jinan belkê ew carna xenî dibin bi zewê xwe (îane 132). (Eger di meselê da heye ferdek wekê niha yek mir jê ma zewcet hem (1/8) sê ibn we yek keç (weya du ferdê mutemasil) yanî wekê hev, wekê niha jinek mir jê ma zewc (1/2) we uxt (1/3) ‘eslê mes’eletê wî jî mexrecê wî ferdê ye. Hem wekê niha du xuhê ji bavê (2/3) hem du xuhê ji dê (1/3) (mesele sisê – 3) û şeş e (6/3).

(M.T.) Mexaricê ferda ev in nisf, ji isneynê (hem sulus we sulusanê), ji selasiyetê (hem rubuê) ji erbe’etê, (hem sudus) ji sittetê (hem sumun) ji semaniyetê.

(M.T.) Eger di meselê da du ferdê muxtelif hebin wê eslê meseletê ji mexrecê ekserê wan be eger di mabeyna her du ferda tedaxul heye, bê weku fena dibe, yê ekserê bi avêtina qedrê eqellê ji wî du caran weya zêdetir. Weya eqel dibe mislê ekser bi zêdekirina mislê eqelê li ser careke weya zêde wekî niha ismeyn ve selaset digel şeşa weya sisê digel neha mesela ‘eslê mes’eletê wê ji şeşan be bê weku yek mir jê ma keçik (1/2). (We um) (1/6) (we apê ‘esebe) ‘eslê mes’eletê ji mexrecê ekser be ku şeşe ji bo keçê sisê ji bo ummê yek ji bo apê dudu weya (eslê mes’elet) ew qederê ku hasil dibe ji derba yekî ji wan di wîfaqiya yê axir da eger di mabeyna

wan da tewafuq hebe bê weku herdu ‘ededa efna dike ‘edede salis ji xeyrê wahid ku isneyne wekî niha sittet semaniye efna wan dike îsneynî yanî bi îsqata eqelê ji ekserê paşî yê baqî ji yê eqelê bavêje yek car weya zêde efna bike wekî niha şeş digel deha (Enwar 8).

(TB (tu bizan)) Çi wexta tedaxul hebe her tewafuq heye wekî niha sisê digel şeşa (Rûpel 22.) lewra ew mutewafiq in bi sulusê ne ku bi ‘eks wekî niha şeş digel neha lewra ew mutewafiqên bi suluseynê tedaxul têda nîne, lewra şeş ji neha du cara nayê avêtin (‘eslê mes’eleta wî) ji bîst çara ye bi derba sisê ya di heştan da weya derba çaran di şeşan da (weya ‘eslê mes’elet ew qeder) ku hasil dibe bi derbdana yek ji wan di temamê yê axir da. Eger di mabeyna wan da tebayun hebe bê weku efnae wan dike wahid wek, niha selaset û erbe’et (mesela wî wekî niha zewcet mir jê ma zewc (1/4) we du keç (2/3) we sê ap. (Musene 36).

(M.T.) Usulê temam dibin heft isnane we selase we erbeê sitte semaniye we isne esere we Erbe’etun we eşrun.

Tu bizan mesele nay ‘ewlkinin illa li nik noqsanê, mayîna sehamê xudanê ferda ne ku ji bu temam kirin nesîbê ‘esebata çawa ku mubtedî wisa zen dikin.

(M.T.) (Ewl dibe) ji usûla sittetê hetta sebêt we semaniye ve tis’ete ve ‘eşerete (hem ewle dibe) isna eşere hetta selasete ‘eşere we xemsete ‘eşere we seb’ete ‘eşere (hem ‘ewl dibe) erbetun we eşerun bi yekî ewle ku seb’ete we ûşruna ye (mîsala wan ev in bi tertîb) bê weku jinik mir jê ma zewc (1/2) hem du xuhê ji ebê (2/3) ‘eslê mes’eletê ji şeşa ye nayê teqşîmkirin wê ‘ewl bibe bal hefta sisê ji bo zewcê çar ji bo her du xuha (weya jinik mir) jê ma zewc (1/2) we ummê (1/6) we du xuhê ji ebê (2/3) ‘eslê mes’eletê ji şeşa ye wê bê ‘ewlkinin, bal hefta sisê ji bo zewcê çar ji bo xuhêd ji bavê yek ji bo dê, (weya jinek mir jê ma zewc (1/2)). Hem (du xuhê ji ebê (2/3) hem (du xuhê ji dê) ‘eslê mes’eletê ji şeşa ye wê bê ‘ewlkinin bal neha sisê ji bo zewcê çar ji bo xuhê ji ebê dudu ji bo xuhê ji ummê. Weya jê ma zewc (1/2) û xuhê ji ebeweyna (1/2) hem xuhê ji bavê hem xuhê ji dê, û hem jî ummê (1/6) (Şerha Tertîp 46). (Weya jinek mir jê ma zewc (1/2) hem du xuhê ji ebê (1/3) hem du xuhê ji ummê (1/3) hem um (1/6) ‘eslê mes’eletê ji şeşa ye tê ‘ewlkinin bal

deha, sisê ji bo zewc, çar ji bo du xuhê ji ebê dudu ji bo du xuhê (Rûpel 23.) ji ummê yek ji bo ummê.

(M.T.) Tê navdan ev mesele bi ummulfuruxê (Şerha Tertîb 46). (Mîsala 'ewla dozdeha bal sêzdeha) zewc mir jê ma (zewcet (1/4) we um (1/6) we du xuhê ji ebê (2/3) 'eslê mes'eletê ji dozdehan e wê bê 'ewlkirin bal sêzdeha ji bo zewcetê sisê, heşt ji bo xuhê ji ebê hem dudu ji bo ummê. (Mîsala 'ewla bal pazdeha) zewc miriye jê ma (zewcet 1/4) (hem) du xuhê ji ebê (2/3), hem du xuhê ji ummê 'eslê mes'eletê ji dozdeha ye heye wê bê 'ewlkirin bal panzdeha, sisê ji bo zewcetê, heşt ji bo xuhê ji ebê, çar ji bo xuhêd ji ummê, hem dudu ji bo ummê (hem wekî niha ji yek mas ê zewcet (1/4) hem du ceddât (1/6). Hem çar xuhêd ji ummê (1/3) hem heşt xuhêd (2/3) ji ebê, eslê mes'eletê ji dozdeha ye sehîh dibe ser heft dehan. Ev meselet tê navdan bi ummuleramîl hem tê gotin ku ji rîcalek maye hevdeh jin. Hem heft deh dînar. Mesela her yek ji van dînarek irsiyet biriye (şerha tertîp 47). (Mîsala 'ewla bîstçara bal bîsthefta) yek mir jê ma zewcet (1/8), du keç (2/3), we bav (1/6), we umm(1/6) 'eslê mes'eletê ji bîstçara ye wê bê 'ewlkirin bal bîstheftan, sise ji bo zewcet, hem şazdeh ji bo herdu keçan, heşt ji bo dê û bava her yek çar, çar (Faîde).

(MT) Eger jinek mir jê ma zewc (1/4) hem umm (1/6) hem pênc îbn, hem çar keçê 'esebe ne 'eslê mesele ji dozdeha ye sise ji bo zewcê, dudu ji bo umm, heft ji bo kur we keça li wan teqşîm nabe lewra ew heft in, ruusê çar deh in (10) nesîb û ruusê wan mutewafîq in bi subu'e me ruusê wan red kirin bal subu'e ku dudu ye paşî derb da dudu (2) di dozdeha da (12) bû bîstçar ji wî sehîh dibe.

(MT) Eger seham şikestin li ser yek sinif ji xudan ferda tu nezer ke eger mubayne heye (Rûpel 24) di mabeyna sîham û ruusê wan da wê bê derb dan 'ededê ruusa di 'eslê meselê da digel 'ewlê eger 'ailete (mîsala bê 'ewl) wekî niha jinek mir jê ma (zewc (1/2) hem) du bira 'eslê mes'eletê ji duduya ye; yek ji bo zewcê hem yek ji bo biraê wan teqşîm nabe, wê bê derbdan dudu duduyan da (2) dibin çar (4), dudu ji bo zewcê, hem dudu jî ji bo herdu bira (mîsala 'ewle) wekî niha jinek mir jê maye zewc (1/2). Wek sê xuhê ji ebê (2/3) 'eslê mes'elele ji şeşayeh e wê bê 'ewlkirin bal heftan ji bo zewcê sisê, çar ji bo hersê xuhan, li wan teqşîm nabe, dê mabeyna nesîp û ruusê wan da mabeynet heye. Wê bê derbdan sisê (3) dê heftan da (7) ku 'ededê ruusaye dibe (bîstyek). neh ji bo zewcê, we dozdeh ji bo her sê xuhan.

(Eger tewafuq hebe) di mabeyna sîham û ruusê wan da wê bê derbdan wufqa ruusa di eslê meselê da. Wekî niha umm (1/3) hem çar ap mesele ji sisiyan e sehîh dibe ji şeşan, bi derbdana wifqa ruusê apê ku dudu ne di sisêyan da.

Tu bizan (TB) eger siham şikestin li ser du sinifa ji xudan ferda wê bê muqabilkirin mabeyna sîhamê kullî sinifa hem 'ededê ruusê wan. (Eger di mabeyna wan da tewafuq hebe) wê bê redkirin ruusê wan bal wifqê we îlla bê terkkirin. Bi halê wî ji ew paş (eger temasul hebe) di mabeyna ruusê wan da wê bê derbdan yek ji wan dê digel mes'eletê da digel 'ewlê eger 'aîlet e (wekî niha) jinik mir jê ma zewc (1/2), hem sê xuhê ji ebê (3/2), hem sê ceddât (1/6) 'eslê mes'eltê ji şeşayeh tê 'ewlkirin bal heştan (8) paşî sehîh dibe ji bistçaran ra. Hem weka niha sê xuhê (2/3) ji ebê, hem sê cedatê (1/6) hem yek 'emê (eger tedaxul di mabeyna ruusê wan de heye). Wê bê derbdan ekser wan di esil meseletê de weka niha sê xuh ji ebê (2/3), hem şeş ceddât (1/6), hem apek. Esil mes'elet ji şeşayeh sehîh dibe ji sih şeşa (eger tewafuq di mabeyna) ruusê wan de heye wê bi derbdana wufqa yek ji wan de tamamê ye axir da paşî wê bê derbdan hasil.

Wê di eslê mes'eletê da weka niha (Rûpel 25) çar cedat (1/6) hem şeş ew sehîh dibe ji hef diduya. (Eger mabeyne di mabeyna ruusê wan da heye wê bê derbdan) tamamê yekî divê axir da paşî hasilê wî bê derbdan di eslê meseletê da (mesele wekî niha) sê ceddât hem heft ap ev sehîh dibe ji sed bîst şeşa, wiha rengê hukmê (eger sîham şikestin) li ser sê sinifa weya çaran e ku zêde lewra ew mewcud nabe. (Mîsala kesra li ser sê sinifa digel mumaseletê)wekî niha sê ceddât (1/6) hem sê xuhê ji bab (2/3), hem sê ap 'esebane sehîh dibe ji hejdehan (18). Emma digel mudaxele wekî niha (sê ceddât (1/6), hem neh xuhê ji ebê, hem şeş ap 'eslê mesele ji şeşa ye sehîh dibe ji sed û heştê bi derbdana şeşa di wufqa nehan da (9) ku sisiyê (3) dibe heşt deh(18), paşî bi derbdana hasilê ku heştdehan di eslê mes'eletê da ku şeşê dibe sed heşt bi terîqa ixtîsar lewra 6 û neh (9) mutewafîq in bi sulusê (1/3) wê bê redkirin bal sulusê ku sisê ne paşî bê derbdan di şeşan da, dibe heşt deh paşî wê bê derbdan di eslê mes'eletê da ku şeş e (6) dibe sed heşt. (Emma digel muwafeqetê) ji yek ma şeş ceddât, hem neh (9) xuhê ji babê (2/3) hem çar ap sehîh dibe ji dused û şazdehan, bi derbdana duduyan di şeşan da dibe dozdeh paşî bi derbdana yê hasil dê wufka nehan da ku sisê ye dibe sih û şeş paşî bi derbdana wî di eslê mes'eletê da ku

şêş e dibe (216). (Emma digel mubayeneta ruusa) ji yek ma sê ceddât (1/6) hem pênc xuh ji ebê (1/3) hem du ap mes'elet sehîh dibe ji (180)an bi derbdana duduyan di sisêyan da dibe şêş, paşî bi derbdana pêncan di şêşan da dibe sih, paşî bi derbdana wî di eslê mes'eletê da ku şêş in dibe sed û heştê.

(Tu bizan; mîsala înkîsara li ser çar sinifa digel mumaseleta ruusa) (ji yek ma du zewcet (1/4), hem şêş ceddât (1/6), hem şazdeh xuhê ji ebê (2/3) hem heşt xuhê ji dê (1/3) eslê mesele ji dozdehan e ailet bal hevdehan sehîh dibe ji sih û çara bi derbdana (Rûpel 26) duduyan di mes'eletê da digel 'ewlê yan bi redkirina ruusê her sê sinifê axir bal wufka wan ve ku ne nisfê ji bo ceddeta hem sumune ji bo xuhê ji ebê hem rubuûê ji bo xuhê ji ummê ku tamamê wan dudu dudune wê bê derbdan yek ji wan di eslê mes'eletê da digel 'ewlê ku heft deh in dibe sih û çar (emma digel mudaxeletê) yanî tedaxul hebit di mabeyna ruusê esnafê varisan (zewc mir jê ma du zewcet (1/4) hem 6 ceddât (1/6) hem bîstçar bira ji ummê hem sih û şêş kur ap di mabeyna nesîbê we ruusê ceddata da tewafuq heye bi nisfê wê bê redkirin ruusê wan bal sisiyan di mabeyna nesîb we ruusê birayê ji ummê, tewafuq heye bi rubuûê wê bê redkirin ruusê wan bal şêşan.

Nesîb we ruusê kurapa jî mutewafiq in bal sulusê wê bê redkirin ruusê wan bal dozdehan meseleta wan jî sehîh dibe ji sed û çil û çara bi derbdana dozdeha dudu ji deha da (emma digel muwafeqetê) ji zewcê ma çar zewcat (1/4) hem dozdeh ceddât (1/6) hem çil birayê ji ummê (1/3) hem çildu kurap ew 'esebene.

(M.T.) Wê bê redkirin ruusê ceddatan bal nisfi ku şêş (hem) ruusê birayê jî bal rubuû ku deh hem ruusê kurapa jî bal sulusê ku çardehan 'eslê mes'eletê ji dozdeha ye sehîh dibe ji pênc hezar û çil bi derbdana wufka çara di şêşan da dibe dozdeh paşî bi derbdana wî di wufka deha da dibe şêst paşî bi derbdana wî di wufka çardeha da dibe çarsed û bîst paşî bi derbdana wî di 'eslê mes'eletê da ku dozdeh e dibe pênc hezar û çil (emma digel mubayetetê) ji yek ma du zewcet (1/4) hem sê ceddât (1/6). Hem pênc xuhê ji ummê (1/3) hem heft xuhê ji ebê (2/3) 'eslê mes'eletê ji dozdeha ye tê 'ewlkirin bal heftdeha sehîh dibe ji sê hezar pêncsed û heftê bi derbdana her ruuset her sinifekê di yê axir da ku dibe dused û deh paşî bi derbdana wî di 'eslê mes'eletê da digel 'ewl ku heftdeh in dibe sê hezar û pêncsed û heftê.

(Hem mîsala tebayunê ev e) ji yek ma çar zewcet (1/8). Hem pênc ceddât (1/6) hem heft (Rûpel 27.) keç (2/3) hem neh ap sihama wan ji hezar û dused û şêst e sehîh dibe ji sih hezar û dused û çil.

(M.T.) Tesmiyeta vê meselê dikin bi mes'ela îmtihan tu gotin ji bo me heye meyyîtek 'ededê her firqekî ji warisê wî kêmtirê ji deha ye hem sehîh dibe mesela wan zêdehê ji sih hezar e suretê wî çawan e? (Hem mîsala mubayenetê ev e jî), hem tê navdan ev mesele bi mesela dinariyetul kubra we mesela şureyhiyye ve rukabiyye ve şakiye (ba ê ku ji zewcê ma zewcet (1/8) we um (1/6) we du bint (2/3) hem dozdeh bira yek xuh ku li wan ji ebê) 'eslê mes'eletê ji bîst û çara ye sehîh dibe ji şeşsedê (Şerha Tertîp per 70).

Fesl (M.T.) Zemanê ced cemê bû digel xuh û birayê ne ji ummê lewra ced (bapîr) xuh û birayê ji ummê saqit dike.

Tu nezer ke eger xudanê ferda digel wan nînin heye ji bo ceddê qencirê ji du emran ku muqasemeta digel wan bê ku yek bira ye weya exza (girtin) sulusa cemi'ê malê bê ku sê bira ne paşî ku ced sulus exiz kir yê baqî di mabeyna xuh û bira da ye ji bo zukura bi qederê para du jina.

(M.T.) Eger xudanê ferd digel wan hene ji bo cedheye ya qencir ji sê emra ku exza (sudusa cemi'ê) malê (weya sulusa) qederê maî piştî ixraca ferda weya (muqasemet) digel wan (mîsala sudusê) xêyr be ji bo ced bê ku ji yek ma du keç (2/3) hem du bira, hem ced (1/6) 'eslê mes'eletê ji şeşa ye, sehîh dibe ji dozdeha (mîsala sulusê) wekî niha jê ma zewcet (1/4) hem ced (1/3) ma yebqaê ye hem sê biraê, 'eslê mes'eletê ji çara ye, yek ji bo zewcet, yek ji bo ced, yê baqî ji bo birayan e, lakin mes'ele sehîh dibe ji dozdeha mes'ela (muqasemetê) bê ku jê ma zewc (1/2) we birayek hem ced 'eslê mes'eletê ji duduyan e sehîh dibe ji çara bi derbdana ruûsê herduyan di 'eslê mes'eletê da ji bo zewc dudu ye baqî ji bo ced we bira ye.

(M.T.) Carna tu şey namîne piştî ixraca ferda wekî niha jinek mir jê ma du keç (2/3) û dê (1/6) we zewc (1/4) we ceddê wî (Rûpel 28) bê ferdkirin ji bo ceddê sudusê hem wê bê zêdekirin di 'ewlê da heta panzdehan 'eslê mes'eletê ji dozdehan e. Wê bê 'ewlkin bal sêzdeha hem ji wî bal panzdeha hem carina dimîne kêmtir ji

sudusê wekî niha bimîne du keç (2/3) hem zewc (1/4) we ced wê bê ferdkirin ji bo ceddê sudus wê bê 'ewlkin mes'elet 'eslê wî ji dozdeha ye heşt ji bo keça sisê ji bo zewc, hem dudu ji bo ceddê bê 'ewlkin mes'elet bal sêzdeha, hem carna dimîne ji bo ceddê qederê sudusê wekî niha (du keç) (2/3) hem ummê we ced, hem bira û xuhên ced exiz bike wî qederê hem saqit dibin bira we xuh 'eslê mes'eletê ji şeşa ye, çar ji bo keçan, hem dudu ji bo cedde we um ji bo her yek, yek tu şey nîne ji bo xuh û bira, lewra eshabê wan furuda hucba wan kirine.

(M.T.) Ewlada ebeweyna çî zukur çî uns wê 'eddê bikin ewladê eb li ser ceddê ji bo nuqsankirina nesîbê wî paşê ku ced nesîbê xwe hilda eger dê ewladê ebeweyna da zukur hebe tu şey ji bo ewladê ebê nîne we îlla wê exiz bike uxtek wahid nisfa terîketê hem dudu du sulusê terîketê (mîsala wî) ji yek ma ced (1/3) hem birayek ji ebeweyna hem birayek ji ebê mes'elet ji sisêyan e bi 'ededê ruûsa ji bo ceddê parek dudu ji bo birayê ji ebeweyna (hem weku niha bira û xuhê ji ebeweyna, hem bira û xuhê ji ebê û ced) mesele ji heştaya ye, ya xeyr ji bo ced sulusê wê bê derbdan sisê di heştaya da dibe bîst û çar ji bo ceddê heşt yê baqî ji bo ewladê ebeweynan e, tu şey ji bo ewladê bab nîne, lakîn mesele sehîh dibe ji heftê duduya. Eger ji yekî ma du xuhê ji ebeweyna hem xuhê ji ebê, hem ced ew herdu hecba wî xuhê dikin. Piştî hesabkirina li ser ceddê nesîbê wan li wan teqşîm nabe 'ededê ruûsê wan bê derbdan di eslê meselê da eslê meselê ededê ruûsa ye mesele ji pêncaya ye, lakîn sekîh dibe ji dehan hem carna zêde dibe ji ber yekî xuhê şeyek (tiştêk) ew jî dibe ji bo weledê ebê çî zukur çî uns (mîsala wî) weku niha yek xuh ji ebeweyna (1/2) hem du xuh weya birayek ji ebê hem ced wê bê teqşîmkirin (Rûpel 29.) mal pênc qisma bi qederê 'ededê ruûsa dudu ji bo ced hem du qism nîv ji bo xuha ji ebeweyna û yê mayî jî ji bo weledê ji bavî ye ku nisfe ji bo her yek rubu'ek yan bi qederê 'ededê ruûsê wan ku pênc in paşî teqşîm kesîr dikeve di nesîbê herdu xuhêd ji ebê ku nîva nîvê ye ku rubuê mexrecê wî erbee ye hem ji nesîbê xuha ji dê û bavê ku nisfê mexrecê wî isnan e di mabeyna mexrecê herduyan da tedaxul heye. Wê bê derbdan mexrecê ekser di eslê meselê da ku pênc e dibe bîst, tê navdan ev mes'elet bi mes'eleta eşereynî ye ji bo ceddê dudu derbdanê çaran da dibe heşt hem ji bo xuhê dudu nîv derbdaê dê çaran da dibe deh hem ji bo her du xuhan jî rubuê derbdan di çaran da dibe dudu.

(M.T.) Ced digel xuhek xalis her wekî birayekî ye nayê ferqkirin ji bo xuhan tu şey îlla di mesela ekderiyetê da lew ti navdan bê ekderiyetê, lewra jina meyyît jê qebîla ekderiyata bûye weya nav zewcê ekder bûye. Weya xeyrê wan bûye ku (jinek miriye) jê ma zewc (1/2), hem um (1/3) hem ced (1/6) hem xuhek ji ebeweyna (1/2) weya ji ebê wê bê ferdkirin ji bo xuhê nisf hem bê ewlkin mesele ji şeşan bal nehan baş wê bê demkirin nesîbê wî ku sisê ye bal sudusa ceddê ku yekê wî bê parvekirin bi sê cihan, yanî parê herduyan çar in nayên teqsimkirin li ser ruûsê wan ku sisê ne, mubayenet di mabeyna nesîbê ruûsê wan da heye, wê bê derbdan ‘ededê ruûsê wan di mesela ‘ailetê da ku neh in dibe bîst û heft ji bo zewc neh ji bo ummê şeş ji bo ceddê heşt hem ji bo xuhê jî çar ji bo zukurê mîsal hezel ûnseyeyn.

(M.T.) Tê navdan ev mesele bi hemziyye bê weku ji yekî ma diya diya wî hem diya diya bavê ji bo wan yek sudus e, hem diya bavê bavê, hem cedde ku bavê bavê ye hem sê xuhê muteferrîqat ceddeta salisêt hem xuha ji dê saqit in bi ceddê eslê meselê ji şeşa ye, yek ji bo ceddê pênc ji bo ceddê hem herdu xuhan wê bê derbdan ruûsê wan ku çar in di eslê meselê da ku şeş in dibe bîst û çar, hem bi ixtisal ji dozdehan ji bo ceddeta dudu, pênc ji bo ceddê pênc ji bo xuha ji ebeweyna xuha ji (Rûpel 30.) bavê mehcub e.

(M.T.) Eger yekî wesiyyet kir ku sulusa malê min bidenê zeyd xumusa wî bidine umer mesela warisê wî jî kamil bûn caize deyran waris jî jin (1/8) we um (1/6) we ibn we yek keçê bûn eva çar ferd ketine mezhebê dê mabeyna sulûs ve sudûsê da tedaxul heye di mabeyna sisê heştan da tewafuq heye dibe bîst û çar di mabeyna wî pênc da tebayun heye dibe sed û bîst, sulusa wî 40, xumusa wî 24, sumuna wî 15, sudusa wî 20, ji bo ibn we binta jî dimîne bîst û yek. Eger ‘ededê musalehu weya zewcet ji yekî zêde bûn weya ewlad zêde bû kesir ketê li ser wan wê bê ‘emlkin di wan da çawa ku boriye.

(Babul ceddê wel uxuwetê)¹³²

(Rûpel 38.) Mes’eletun wê bê nivîkirin sê ji dînarê we dirhema dibe şêst ku eslê mes’eletê hem deh ji wan bê gerandin sudus ew jî dibe şêst, sudus ji bo zewceta

¹³² Rûpelên 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37 û di Rûpela 38an da heta rêza heftan bi Erebi hatine nivîsîn. Me ew per latînîze nekirin.

dozdeh nisif hem dozdeh sudus dikeve ku dibe heşt ji bo her yek dînarek we dirhemek. Ji bo uxtêd ji um şazdeh nisif hem şazdeh sudus dikeve. Hem ji bo uxtêd ji eb jî sih du nisif hem sih du sudus dikeve ku mecmuê wan dibe çil dînar we dirhem.

Fesil (M.T.) Mani'ê irsiyetbirinê çar in, (yê ewil qetil e), (yê sanî kufr e), (yê salist 'ebdbûn e), (yê çaran) melûmbûna pêşketina mewtayek ji wan li ser mewtayekî axir hetta ku ji wî irsiyet bibe. Qatil irsiyet nabe eger çi negere dam in, hem irsiyet nabe misilman ji kafirê hem herbî jî zimmî. Hem biekş ji kafir ji kafirê irsiyet dibe bê ku 'eslê fer'ê xwe qetil kir weya bi heqqê murisê qetil kiriye weya bi heddanê weya bi keyrê wî weya bi xette weya bi 'emd bi sebebê ku şahid e li ser da bi maê weku wacib fikir qisas weya bîrekî ku yekî kolabû bû muris wî ket tê da. Welhasil qatil irsiyet nabe. Çi weqta ku medxela ('eleqe) wî di qetlê da hebe bi çi terzê be ew irsiyet nabe.

(M.T.) Zemanê te qesda teqşîma terîketê kir li ser warisa piştî kifşkirina nesîbê wan tu nezer ker gelo di terîketê da kesir heye yan ne, eger kesir nebe tu derb bide nesîbê her warisek piştê (Rûpel 39.) teshîha mes'eletê, di cemîe terîketa ku kirine pere yê hasil gihişte çi qederê ewê teqşîm bikin li ser wê 'ededê ku mes'elet jê sehîh bûye ew ê xaricê ji qismetê nesîbê wî warisê ye. Mesela (yek mir jê ma zewc $1/2$) we um ($1/6$) uxteyn ji eb ($2/3$) hem uxteyn ji umm terîket ji şêst(60) zêr weya mecîdî weya quruş e. Mesela eslê mes'eletê ji şeşa ye sehîh dibe ji 'ewla bal deha. Me şêst teqşîm kir li ser dehan xarici wî bû şeşa paşî me nesîbe zewcê ku sisê ne derb da di şêsta da hasilê wî bû sed û heştê. Me li ser deha teqşîm kiriyê hasil ji qismetê bû heştdeh(18). Ew e nesîbê zewc paşî me nesîbê um jî derb da her wekê wî teqşîm kiriyê xaric bû şeş. Paşî me nesîbê uxteyn ji ebê derb da hem teqşîm geriya xaric bû bîst û çar. Nesîbê uxteyn ji ummê jî kezalig me jê hemil kir bû dozdeh. (Weya) tu berê terîkeyê teqşîm bikî li ser 'eslê mes'eletê ku di ferda deheyê (10) bi xaricê ji qismetê dibe şeş tu wî şeş derb bidî di nesîbê her yek ji warisa çi jê hasil be ew e nesîbê wî warisê.

(Mesela) me şeşa derb da di sisê ku nesîbê zewcê ye bû heştdeh. Paşî me ew derb da di nesîbê ummê da ku yek bû şeş yê ewladê ummê jî me derb da bû dozdeh, paşî me ew derb da di nesîbê uxteyna (herdu xuh) da ku çar in yê hasil bû bîst û çar e, yê maî wiha qiyas bike. (Eger ji yek maî zewcat ($1/4$) hem çar xahêt ji um û du

xuh hebit ji eb (2/3) terîka meyyîtê jî mesela heftê pênc(75) zêr bû. Mes'eleta wan ji dozdehan sehîh bûye ji 'ewla bal pazdehan. Mes'ele digel terîketê mutewafiq in bi cuz'ekî ji pazdeh(15) cuz'ê me mes'elet we terîketê red kirin li bal wufqa wan ku yek û pazdeh in li ser terîqa ewil tê derb bidî nesîbê her yek ji wan di wifqa terîketê da ku pênc ew ê hasil bûyî def bikî bal vî warisê li (ser terîka sanî) tu teqsim bikî wufqa terîketê ku pênc in li ser wufqa mes'eltê ku yek xaric dibe pênc paşî tu derb bidî wî pênc di para her yek ji warisa ji mes'eltê ewê def'ê bikî bal wî ve.

(M.T.) Eger di terîketê de mesela kesir hebû tê mexrecê (Rûpel 40) wî kesir ku nisif weya sulus weya rubu'e (1/4) weya xeyrê wan e, mesela derb bidî di sehîhê wî da hem kesir ji kamila dem bikî bal yê hasil, paşî teqsim wan bikî li ser warisa her wekî teqsim sehîh. (Mesela) ji yek ma zewc (1/2) hem du uxt eslê mes'eletê ji şeşa ye sehîh bûye ji 'ewla bal heftan. Terîket jî mesela deh zêr û nîv bû, mexrecê kesir dudu ne, me derb da di deha da bu bîst, me wî kesirê jî dem bal wan va kir bû bîst û yek. Nisfê paş me li mes'eleta wan teqsim kir. Ji bo zewcê neh nisif ket ku dibe çar û nîv, hem ji bo her xuhê şeş nisif ket ku dibe sisê.

(MT) Murted irsiyyet nabe hem irsiyyet jê nayê birin, malê wî fey e hem reqîq irsiyyet nabe, eger çî mukatebe be. Emma ew ê ku be'dekî wî hûrr e, ew irsiyyet nabe lakin irsiyyet ji wî tê birîn.

(MT) Irsiyet nabe menfiyyê bilî'anê hem weledê zina îlla ji diya xwe hem ji ewladê wî, yan dê irsiyyet nabe ji wan illa um hem ewladê um. (MT) Zemanê dudu wî ku ji hev irsiyyet dibirin bi hev ra mirin, weya di xurbetê da weya bi herqê (şewatê) weya bi xerqê (xeniqandinê) weya bi hedmê (hilweşandinê), hem nehate zanîn gelo kîjanê berî miriye. Yek ji wan irsiyyet nabe ji yekî, wê bê gerandin malê wan ji bo warisê maî. (Eger xerq bû exekî hem xuhê) ji ex ma zewcet (1/8) we bint (1/2) hem ji xuhê ma zewc (1/4) we bintek (1/2). Wê bê ferdkirin ke ennehu mînanî ex miriye ji zewceta xwe hem xuh miriye ji zewc we bintê feqet.

(MT) wê bê teksîmkirin malê mefquq yanî ew ê xebera wî qeti' bûye (hatiye birîn) di seferê da weya di qîtalê da (şerê) weya bi şikestina kimyawî li ser warisa zemanê hakim hukim kir, bi mewta wî bi şahida weya bi ictîhadê zemanê ku borî

muddetekî wisa ku emsalê wan nediman di xalib da emma pêşiya hukmê hakim wê bê hiştin ew ê maî weku mefqud irsiyyet ji xeyrê biriye.

(M.T.) Wê bê xwe girtin di heqqê warisê mefqud ji bo hadirîna bi esweê yanî çî kesê ku saqit bibe bi mefqudê eger hey (sax) be nayê dayîn ji bo wî tu şey. Hem çî kes ku heqqê wî noqsan bibe di fereda heyatê ye weya (Rûpel 41.) mewta wî wê bi wî terzê bê ferdkirin, hem çî kesê ku heqqê wî noqsan nabe bi heyatê we mewta wî wê bê dayîn heqqê wî. (Mîsala ferdkirina wî heyy (ku sax be)), bê ku zewcet miriye ji zewcê mefqud (1/2) hem du xuhê ji eb û hem apekî esebe hadir ji bo xuha çar e ji hefta, yanî mes'ele 'ailet e ewil dibe tu şey nîne ji bo em.

Eger mefqud bê ferdkirin meyyît, ji bo xuhan dudu ye ji sisêyan (2/3), hem yê baqî ji bo mamê ye, wê bê ferdkirin heyy lewra ya eswe ew e ji bo hadirîna. (Hem bo ku yek) mir jê ma ex ji ebê mefqud hem uxtekî ji ebeweyna hem ceddekî hadir, eger mefqud heyy be ji bo ex jî ebeweyna sulûsan e ji bo ceddê sulus e. Eger mefqud meyyît be wê mal di mabeyna wan da bisewwiyet be, yan wekhev wê bê ferdkirin di heqqê ceddê da heyat, hem di heqqê exê da mewt.

(Hem mîsala wî bê weku) jinik mir jê ma kurek mefqud hem bint hem zewc (1/4) bi kullê hala terîqa teshîha van mes'eleta ew e ku tu teshîh bikî mesele li ser teqdîra mewtê carek hem li ser teqdîra heyatê carek, paşî derb bidî eslê yek ji wan di temamê yê axir da, eger di mabeyna wan de tebayun heye. Weya derb bidî wifqa yek ji wan di temamê yê axir da eger di mabeyna wan da tewafuq heye. Paşî çî kesê ku irsiyyet dibe li ser herdu teqdîra wê bê derbdan herdu nesîbê wî ji her du mes'eleta di temamê yê axir da eger di mabeyna wan de tebayun heye. Weya di wîfaqa wî da eger di mabeyna wan da tewafuq heye wê bê daîn ji bo wî eqeltirê (hindiktirê) ji herdu qederê ku hasil dibe ji herdu derban. (Mîsala wan bê weku jinik mir jê ma du xuhê ji eb (2/3) hem apek, hem zewcê mefqud. Eger zewc heyy (sax) be mesele ji heftan e digel ewlê, we îlla ji sisêyan e muwafeqet nîne di mabeyna wan da, yanî herdu mes'eleta da wê bê derbdan sisê di heftan da dibe bîst û yek ji bo herdu xuhan di mes'eleta heyatê da çar in derb da di sisêyan da dibe dozdeh, hem nesîbê uxta ji mes'eleta mewtê du sehm in derb da di heftan da dibe çardeh, wê bê dayîn ji bo wan eqel (herî hindik) ku dozde ye, hem wê bê hiştin ew ê baqî (Rûpel 42.) ku neh in, ji ew paş eger hate zanîn heyata zewc wê bê def'kirin bal ve eger heyy nebû du sehmê

ji neha ji bo xuhanê, yê maî ji bo apê ye ku heft in. (Hem wekê niha) jinek mir jê ma dê hem zewc hem du xuhê ji eb (2/3), hem kurekî mefqud eger kur heyî be mes'elet ji dozdehan e.

Eger meyyît be ji şeşê ailet ba heştî di mabeyna eslê herduwan da ku dozdeh e, we heşt in tewafuq heye bi rubu'ê ku duduwe sisê ne wê derbdan rubu' a yek di temamê yê axir da dibe bîst û çar ji bo um, mes'ela heyatê da du seh in derbdîna di wîfaqa mes'ela mewtê da ku dudu ne ji şeşa dibe çar hem ji bo wî di mes'ela mewtê da sehmeke derbdîna di wîfaqa mes'ela heyatê da ku sisê ne ji dozdeha dibe sisê wê bide wî sisê. Hem ji bo zewc di mesela heyatê da sisê ye derbdîna di wîfaqa mes'ela mewtê da dibe şeş hem nesîbê zewcê di mes'ela mewtê da sisê ye derbdîna di wîfaqa mes'ela heyatê da dibe neh wê bê daîn ji bo wî şeş ne ku neh wê bê hiştin yê baqî.

(M.T.) Eger yek mir jê ma hemil eger munfesil bûye wê bibûya waris mutleqa. Wekî niha hemla zewcetê ye yan zewceta meyyîte weya wê bibûya waris li ser texdîra zukuret, wekî niha hemla zewceta exê hem zewceta ceddê wî ye. Weya wê bibûya waris li ser texdîra urusetê. (Wekî niha jinek) mir jê ma hemla zewceta bavê hem zewc (1/2) hem uxta ji ebeweyna xuh ji dê û bavê. Eger tu waris nînin ji xeyrî hemlê wê bê hiştin mal, eger warisê ji xeyrî wê hene lakin hemil hucba wan dike mutleqa wekî niha ewladê ummê ne. Hem hemil ji meyyîtê ye weya hemil hucba wan dike li ser be'dekî teqdîra wekî niha ewladê ebeweyna ye weya hem hemil ji meyyîtê nayê dayîn ji bo wan tu şey. (We îlla eger ji bo wan qederek) heye wê bê dayîn ji bo wan aîlen eger îmkana ewlê dibe. (Mesela wî) wekî niha mêrek mir jê ma zewceta hamîle hem dê we bav ji bo zewcetê heye sumun aîlen hem ji bo bavê we ummê du sudus aîlen wê bê muqedderkirin hemil bi du keçan (2/3).

(M.T.) Mes'eleta wan ji bîst û çara ye wê bê ewilkirin bal bîst û hefta. Sisê ji bo zewcet hem heşt ji bo dê we bav hem şazdeh dimînin (Rûpel 43.) ji bo hemil. Mes'ela eger nesîbekî muqedder ne ji bo warisê zahir wekî niha ewladê meyyîtê ne nayê sefkirin bal wan tu şey. Lewre zeptkirin ji bo 'ededê hemlê nînê. Hem wê bê xwe girtin di heqqê xunsa. We baqî warisa bi yeqîn hem wê bê hiştin ew ê meşkuku fîh heta zahir be hal (M.T.) we illa fela. Hinga hemil irsiyet dibe eger munfesil be hey digel heyata musteqîrre. Mîsala wî jinek mir jê ma zewc (1/4) hem eb hem

weledê xunsa ji bo zewc rubu e ji eb sudus e hem ji bo weledê nisf e ku şeş e wî yê heşt in yê baqî.

(M.T.) Li ser teqdîra xunsa zeker be mes'elet ji dozdeha ye. Sise ji bo zewc hem dudu ji bo eb yê baqî ku heft e ji bo xunsa eger paşê beyan bû zekerê wî ew ê bidine wî. Eger bû unsa wê bê redkirin li ser wî. We eb ew yekî baqî ji ew paşî eger hemil fesil bû heyy di weqtekî da ku dihate zanîn wucûda wî li nik mewtê wî bê ewilkirin bi muqtedayê wî. Eger hemil fesil bû meyyît weya zêdetirî ji çar salan weya şeş meh we zêdetir. Hem ji bo wî yan zewcet hebû zewc du danet bû ku hemil ji xeyrî wî bû hemil irsiyyet nabe. Îlla wekî muttetiğ be li ser wucûda hemlê weqta mewtê. (M.T.) Carna yek şexs irsiyyet dibe bi ferdê hem bi esebebûn. (Wekî niha jinekê mir) jê ma du kurê eb ku yek ji wan birayê wî bû ji dê. 'Eslê mes'eletê ji şeşa ye sehîh dibe ji dozdeha. Dudu ji bo kurê eb ku bira ye bi ferd. Hem pênc jî bi esebebûn eger di vî mes'eletê da digel herduyan keçek mabû ji bo keçê nisf e yê mayî di mabeyna wan da bi nîvîn lewre keç hucba cîhetê ferdê dike dimîne esebebûn.

(M.T.) Zemanê hebû ji bo warisek du cîhed irsiyyet birin bi herduyan irsiyyet nabe, belkî ew ê irsiyyet bibe bi wî cîhetê ku hucba cîheta axir dike. Weya qet nayê hucubkirin weya hucba wî eqeltir e. Mîsala yê ewil bû ku yek diya xwe wetand bi şubhe keçek jê bû paşê ew yek mir ew keç xuha wî ye ji ummê hem keça wî ye, lakin cîhetê keçîti hucba cîheta xuhê dike. (Rûpel 44.) (Mîsala yê sanî) wekê niha diya ku xuha wî ye ji bavê ku yek wetand keça xwe bi şubhet jê bû keçek. Ew keç hatiye wetandin diya keça xwe ye. Hem xuha wî ye ji bavê cîhetê keçîtiyê nayê hicibkirin bi tu halan. (Mîsala yê salis) wekî niha yek mir jê ma diya dê ku ew jî xuha wî ye bû ji bavê bê weku bav wetandiye keça sanî weledê jê bû ew weled mir jê ma diya diya wî ku xuha ji bavê wî ye. Ew ê irsiyyet bibe bi cîhet ceddedyê, lewre hicba wî kême. Lewre um bi tenê hicba wî dike.

(M.T.) Zemanê be'dekî ji warisan mirin pêşiya qismeta terîketê eger waris meyyîtê sanî munhesirin dawiyê baqî da hem muxtelef nebûn istehqaqa wan wê bê ferdkirin ke ennehu meyyîtê sanî nebûye. (Bê weku yek mir jê ma çend bira hem çend xuh weya kur û keç paşî yek jê mir ji ew ê baqî) eger waris meyyîtê sanî ne munhesir in dawiyê baqî da hem istehqaq muxtelif bûn wê bê tesîhkirin mes'eleta meyyîta ewil hem mes'eleta meyyîta sanî hem wê bê nezerkirin di nesîba meyyîta

sanî ji mes'eleta meyyîta ewil eger nesîbê wî bê teqşîmkirin li ser mes'eleta wî jixwe qenc e. (Mesela wê wekî niha jinekê mir jê ma zewc hem du xuh ji eb paşî qeblel qismet beriya teqşîma mîrasê da yek ji xuhan mir jê ma keçekê, hem ew xuh (mes'eleta ula) ji hefta ye digel ewl, (mes'eleta saniyet) ji duduya ye hem nesîbê uxta meyyît ji mes'eleta ula dudu ne li ser tê teqşîmkirin.

(M.T.) Eger tewafiq heye di mabeyna nesîbê meyyîtê sanî ji mes'eleta ula hem meseleta wî da wê bê derbdan wufqa mes'eleta wî, mes'eleta meyyîtê sanî di mes'eleta ula mîsala muwafiqetê ev e. Wekî niha jinek mir jê ma zewc hem um (hem sê bira eslê mes'eletê) ji şeşa ye, sehîh dibe ji hejdehan. Ji bo zewc neh, ji bo um sisê, ji bo bira şeş. Paşî zewc mir ji şeş kura mes'eleta wî ji şeşa ye. Di mabeyna nesîbê wî ji mes'eleta ula ku neh hem mes'eleta wî ku şeş tewafiq heye bi sulusê. Wê bê derbdan wufqa mes'eleta wî ku dudu ne di temamiya ula da ku hejdeh e dibin sih û şeş. Paşî çî kes ku şeyek ji bo wî ji mes'eleta (Rûpel 45.) ule hebe ew ê exiz bike derbdaî di wufqa mes'eleta sanî da hem çî kesê ku şeyek ji bo wî hebe di mes'eleta sanî da ew ê exiz bike derbdaî di wufqa nesîbê meyyîtê sanî di mes'eleta ula ku sisê ne ji bo um jî ya ula sisê ne derbdaî di wufqa ya saniyetê ku dudu ne dibe şeş. Ji bo her birayek dudu derbdaî di duduyan da ji ya saniyetê dibe dozdeh. Ji bo kura ji mes'eleta saniye şeş e derbdaî di wufqa nesîbê meyyîtê sanî ji mes'eleta ula ku sisê ne dibe hejdeh. (Eger tebayun hebe) di mabeyna nesîbê wî yan ji mes'eleta ula we mes'eleta mewta wî da wê bê derbdan cemîê mes'eleta meyyîta sanî diya ula da. Paşî gihişte çî miqdarê sehîh dibe ji wî ji ew paş çî kes ku ji bo wî şeyek ji mes'eleta ula hebe wê exiz bike derbdayê di wî maê weku hatiye derbdan di mes'eleta ula da. Hem çî kesî ji bo wî hebe şeyekî ji mes'eleta meyyîta sanî wê ewê exiz bike derbdayê di nesîbê meyyîtê sanî ji mes'eleta ula.

(Mes'eleta mubayeneta) her du meseleta bê ku mêrek mir jê ma zewcet (1/4). Hem sê ap paşî qeblel qisme dudu ji wan yek qetil kirin jê ma zewcet (1/4) hem du xuh (2/3) ji bavê hem apek. (Mes'eleta ula ji çara be) mes'eleta meyyîta sanî ji dozdeha ye. Hem nesîbê meyyîtê sanî ji mes'eleta ula yekê tu muwafaqat nîne di mabeyna nesîbê wî hem mes'eleta wî ku dozdeh in wê bê derbdan mes'eleta meyyîta sanî ku dozdeh in mes'eleta meyyîta ewil da ku çar in dibe çil û heşt ji bo zewcetê di mes'eleta ula da yek derbdaê dozdeha da dibe dozdeh. Hem yê her du apan jî wisa

hem heye ji bo zewcet da apê mexdud di mes'eleta sanî da sisê derbdayê di yekî da ku nesîbê mexdulê ye ji ya ula hem ji bo her du xuhan heşt derbdaî di yekî da hem heye ji bo ap yek derbdaî di yekî da. (Hem mîsala muwafeqetê ev e ji) bê ku ji yek ma zewcet (1/4) we exek mes'eleta wî ji çara ye. Paşî ex jî mir jê ma um we ibnekî. Mes'eleta wî ji şeşa ye. Nesîbê (Rûpel 46.) wî ji mes'eleta ula mes'eletayan ya mirina wî mutewafiq bi sulusa nesîbê meyyîtê sanî yek e, sulusa mes'eleta wî ji dudu ne, wê bê derbdan dudu di çara da dibe heşt. Herdu mes'elet ji wî durust dibin ji bo zewcet. Ji mes'eleta ula yek e derbdaî di wufqa ya saniyetê da ku dudu ye dibe dudu. Ji bo um jî ya saniyet yek e, derbdaî di wufqa nesîbê exê meyyît dibe. Yek ji bo ibn jî pênc derbdaî di yekî da ew jî dibe pênc. (Mîsalekî axir) ji yek ma du ceddê (1/6). Hem du uxt ji ebeweyna hem du birayê ji um mes'eleta wa jî ji şeşa ye. Tê ewilkirin bal hefta durust dibe ji çardeha paşê pêşiya teqsimê uxt jî mir. Ji ew ê di baqî mes'eleta uxtê ji şeşa ye. Sehîh dibe ji dozdeha. Di mabeyna dozdeha we nesîbê wî ku çar in ji yê ewil ku sisê ne mutewefiqet heye bi rubuê. Wê bê derbdan wufqa dozdeha di wufqa çardeha da dibe çil û dudu.

Herdu mes'elet ji wî sehîh dibe ji bo ceddeta ji ya ula dudu derbdaê di wufqa ya saniyetê da ku sisê ye dibe şeş. Hem nesîbê wan ji ya saniyet jî dudu derbdaî di wufqa nesîbê meyyîtê ku yek e dibe dudu ji bo ceddeta dibe heşt ji bo uxt jî ya ula çar in. Derbdaî di sisêya dibe dozdeh. Para uxt ji ya saniyetê cara teqsimê duduya şeş e. Derbdaî di yekî da dibe şeş. Ji bo wî dibe hejdeh. Ji bo her du birayê ji ummê ji mes'eleta ula çar in. Derbdayê di sisêya da dibe dozdeh hem ji ya saniyetê ji çaran derbdayê di yekî da dibe çar. Ji bo wan herduyan dibe şazdeh, li ser vê qaîdeyê maê jî qiyas bike. (Mîsala tebayunê ev e jî) ji yek ma zewc we esabetek mes'eleta wî ji duduyan e paşî zewc mir jê ma bint we exekî mes'eleta wî ji duduyan e tebayun di mabeyna nesîbê wî mes'eleta wî da heye wê bê derbdan dudu di mes'eleta ula da dibe çar herdu ji wê durust dibin ji wê esebetê jî ji ya ula yek derbdayê di duduya da dibe dudu. Ji bo bint ji ya saniyetê yek e. Derbdayê di nesîbê meyyît ku yek e ku yek dibe yek. Ji bo exê jî wisa (hem mes'ela wî ev e ji) ji reculek (mêrekî) ma zewcet ku (1/8) e. We bintekê keçek ma hem sê ibn ji wê zewcetê mes'eleta wan hem sê ibnê ji wî zewcet mes'eleta wan ji heştaya ye. Ji bo bint yek, paşê bint mir jê ma um ku (1/6) e. Ew sê (Rûpel 47.) birayên mes'eleta wî ji şeşa ye. Durust dibe ji hejdehan wê bê derbdan di heştan dibe sed û çil û çar. Her du ji wî sehîh dibin ji bo um jî ya ula

nesîbek derbdayê di temamê ya saniyetê da ku hejdeh in dibe hejdeh. Ji bo um jî ya saniyetê mesela duduyan sisê ne derbdayê dawî di destê meytî da ku yek e dibe sisê. (Ji bo um dibe bîst û yek) ji bo her sê kura ji ya ula şeş, derbdayê di hejdehan da dibe sed û heşt ji bo kura ji ya saniyetê panzdeh in derbdayê di nesîbê meyyîtê da ku yek e dibe yazdeh ji bo kura dibe sed û bîst û sisê. (Li ser vê terzê qiyas bike yê maî jî).

Mîsala wî ku sisê bimirin piştê teksîmê wê bê teshîhkirin mes'eleta wî her wekî ya meyyîta sanî lewra her du mes'elet ula bûne yek. (Evê salis) bûye yê sanî wê bê emelkirin di wî da her wekî di her du yê ewil da dîsa weha ye eger yek çara weya pêncê weya zêdetir bimirin pêşiya qîsmeta mîsalêt wî sisê ne. Mesela ewil ji yek ma zewcet ($1/4$) we ceddê ($1/6$). Hem mes'eleta wî ji dozdeha ye paşî em jî mir jê ma um ($1/6$) hem şeş xuhêd ($2/3$) muteferriqat du uxt ji eb tu şey jê ra tunîne ji bo her du uxtê ji ebeweyna sulusan e. Ji bo her du xuhê ji ummê sulus e mes'eleta wan ji şeşaye wê bê ewilkirin bal heftan tê teksîmkirin nesîbê wî ji ya ula ser mes'eleta wî eger paşî (zewcet mir jê ma um we kurê eb mesela). Mes'eleta wî ji sisêya ye ji bo um parek ji bo ibn û em jî du parek, para zewcet teksîm dibe li ser mes'eleta wî sehîh dibe her sê mes'elet ji wî qederê ku sehîh bûye ji wî ya ewil. (Mîsala sanî) ji yek ma bintekî ($1/2$) e, we uxtê ($1/2$) ji eb mes'eleta wan ji duduyan e. Paşî uxt jî mir jê ma du keç ku ($2/3$). Hem mes'eleta wan ji sisêyan e para uxt ji ya ula ji mes'eleta ewil yek e, nayê teksîmkirin li ser mes'eleta wî her du mubayîn in. Wê bê derbdan sisê di duduyan da dibe şeş ji wî sehîh dibe di bin her du mes'elet ji bo bintê ji ya ula sisê ne. Derbdayê di yekî da dibe sisê ji bo her du keçan jî du par in, ji bo em (mam) jî parek, paşî ew jî mir jê ma zewcet (Rûpel 48.) we ibn û ex mes'eleta wî ji çara ye nesîbê wî yek mubayeneta di mabeyna wan da heye wê bê derbdan mes'eleta ula ya wî da dibe 24 (bist û çar) ji wî her sê mes'elet sehîh dibe ji bo bintê ji ya ula sisê ne derbdayê di çara da, hem ji bo her du binta ji dudu derbdayê di çara da dibe heşt ji bo zewceta em yek derbdayê di yekî da dibe yek. Hem ji bo ibn û ex jî sisê derbdayê di yekî da dibe sisê. (Mîsala salis) ji yek ma um ($1/3$). We em ma mes'eleta wan ji sisêyan e paşê em jî mir jê ma ceddê paşî mam jî mir jê ma dapîr we exek meseleta wan ji şeşa ye.

Mes'eleta wî we nesîbê wî mutewafiq in. Wê bê derbdan wufqa meseleta wî yan hem ku ji sisê ne di sisêyan da dibe neh. Ji bo ummê jî ya ula yek derbdayê di

wufqa ya saniyetê da ku sisê ne dibe sisê (ji bo ceddê) jî ya saniyetê yek derbdayê di wufqa para emmê da ku yek dibe yek. (Ji bo ex jî pênc in). Derbdayê yekî da dibe pênc paşî um jî mir jê ma (zewc (1/2) we um ma (1/6) hem sê xuhêd muteferrîqat) mes'eleta wan ji şeşa ye. Ewil dibe bal neha para ummê sisê ne û meseleta wî mutefeqqat in, bi sulus wufqa para wî yek e wufqa mes'eleta wî sisê ne wê bê derbdan sisê di nehan da dibe bîst û heft. Ji wê her sê mes'elê sehîh dibe ji bo ceddê em ji bo ceddê. Em jî ya ewil yek derbdayê di wufqa ya saniyetê da ku sisê ne. Dibe sisê ji bo birayê wî jî ji ya ewil pênc in derbdayê di sisêyan da dibe panzdeh. Ji bo uxta ji ebeweyna ya saniyetê jî sisê ne. Derbdayê di wufqa para meyyît ku yek e dibe sisê. Ji bo zewcê jî wisa ji bo ummê jî ya saniyetê yek e derbdayê yekê da. Ji bo uxta ji eb jî wisa, ji bo uxta ji um jî wisa. (Hem mîsala tebayyûnê ev e ji) yek mir ma zewcetek hamiletun hem du bira paşî zewcet welidî kurek, rast hatin meyyît zewcet e digot heyî bûye paşî miriye. Eger herdu bira tesdîqa wî kirin eva reculek e miriye jê zewcet maye we ibnekî meseleta wan ji heştaya ye paşî ibn miriye jê maye um (1/3). We du em mes'eleta wan ji sisêyan e her du mes'elet sehîh dibin ji bîst û çaran ji ber mubayeneta wan.

(Rûpel 49.) (M.T.) Eger her duwên tekzîba jinek kirin, qewl qewlê wan e digel yemîna wan. Mes'elet sehîh dibe ji heştan, eger yek tesdîq hem yê axir tekzîba jinekî kirin wê mukezzip sond bixwe temamê heqê xwe exiz bike tekzîba herduwan nesîbê her yek ji wan sisê ne ji heştan. Paşî ku jê bu mukezzip sisê, xaric bûye baqî pênc, ma di mabeyna museddiq we zewciyet e bi nisbet nesîbê wan li nik tesdîqa meruwan nesîbê zewcet deh in. Ji bîst û çara sisê, ji zewc irsiyet biriye hem heft ji ibnê nesîbê em museddiqê jî heft in, yan ji bîst û yeka pênc di mabeyna vî emmê we zewciyet e li ser herduwan nesîbê wan nik wê bê derbdan heft deh û para wan in di eslê mes'eletê da ku heşt in dibe sed û sih û şeş, paşî ji bo mukezzibê sisê derbdayê di maê weku hatiye derbdan di mes'eleta ku hevdeh in dibe pîncî yek. Yê baqî heştê pênc in wê bêne teksîmkirin li ser hevdeha we her sehmeke pênc dikeve ji bo zewcet deh cara pênc dibe pîncî ji bo museddiq heft cara pênc dibe sih û pênc nesîbê mukezzib zêde bû li ser yê museddiqê bi şazdeh sehman.

(M.T.) Eger di vî mes'elet da ji zewcet bintek bû eger ew tesdîqa zewcetê bikin sehîh dibe her du mes'elet ji çilheştaya. Bi derbdanê mes'eleta bint ku sisê ne

mes'eleta ula da ku şazdeh in, eger tekzîba wî bikin sehîh dibe ji heştan eger yek ji wan tesdîq bike her du sehîh dibin ji dused û çil û heştan. Lewra li nik tesdîqa wan ji bo zewcetê şeş ji çilheştan. Bi derbdana nesîbê wan ji mes'eleta ula ku dudu ne, mes'eleta meyyîta sanî ku sisê ne dibe şeş. Bi zewciyetê ye hem heşt jî bi umumet derbdana nesîbê wî ji mes'eleta meyyîta sanî ku yek e. We nesîbê meyyîta sanî ji mes'eleta ula heşt e ji şazdeha yê baqî di mabeyna herdu bira da ji bo her yek hevdeh. Di mes'eleta tekzîba wan ji bo zewcetê dudu ne ji heştan, hem ji bo her exek sisê sisê di mes'eleta tesdîqa yek ji wan ji bo mukezzîp sisê ne ji heştan pênc baqî ji bo museddîq we zewcetê ye bi nisbeta par.

(Rûpel 50.) Bi nisbeta parê wan ji çilheştan ji bo jinek çardeh in ku şeş we heşt in parê herduwan ji wî sih û yek e. Ew mubainên mes'eletê ye ku heşt e, wê bê derbdan sih û yek di heştan da dibe dused û çil û heşt. Çawa ku boriye, ji bo mukezzîb ji wî nod û sê ye bi derbdana nesîbê wî ku sisê ne di wî maî weku hatiye derbdan di eslê mes'eletê da ku sih û yek e. Yê baqî ku sed û pîncî û pênc e, tê teksîmkirin li ser sih û yekan ji bo her yek pênc dikeve, ji bo jinek çardeh caran pênc dibe heftê, ji bo museddîqê heftdeh pênc dibe heştê û pênc, nesîbê mukezzîbê zêde bû li ser yê museddîqê bi heştê sehma (Şerha Tertîba Sanî).

(Feslun fî beyanun reddî M.T.)

Di Keşful Xewam da (red didê ewlê ye. Lewra ewl zêde kirine di ededê para hem noqsankirine ji wan. Red jî noqsankirine ji ededê para hem zêde di qederê wan da.

(Tu bizan red nîne li ser zewcet) we zewc bê Îttîfaqa hemû ulema. (Tu bizan) zemanê digel xweyê ferda zewc we zewcet nebûn hem ewê red li ser dibû yek şexis bu, bê ku yek mir jê ma keçik weya keça kur, weya uxtex, weya um, weya ceddetek kullê terîketê ji bo wî ye bi ferd. Hem bir reddê eger ewê der li ser dibe yek sinif e. Wekî niha çend ewladê ummê ne weya çend ceddât in, weya çend keç in. Eslê mes'eletê redd e wî ededê ruusê wan ve. Tu bizan eger ewê red li ser wan dibe du sinif in wekî neha sê keç in we du ceddât in. 'Eslê mes'eleta wan ji şeşa ye çar ji bo keça, yek ji bo ceddeta kesir dikeve li ser her du sinifê ruusê wan mubayîn, heft yek

bi derbdana di temamê yê axir da dibe şeş, paşî ew şeş bîne derbdan di nesîbê her du sinifan ji mes'eleta wan ku pênc e dibe sih ji bo keça bîst û çar ji bo ceddeta şeş.

Tu bizan eger ewê red li ser wan dibe sê sinif in, wekî niha sê xuhêd muteferriqat ji her sê cîheta 'eslê mes'eleta wan ji şeşa ye. Sisê ji bo xuha ji dê û bavê sudusek ji bo xuha ji bavê hem sudusek ji bo xuha ji dê wê terîket bê gerandin pênc par in bi ededê nesîbê wan hem (Rûpel 51.) wekî niha du ceddêd we bint we sê benatê ibn. 'Eslê mes'eleta wan ji şeşa ye, nesîbê wan jî pênc e. Kesir dikeve li ser her du sinifan. Wê 'ededê ruûsê wan di hev da bê derbdan dibin şeş. Paşê derb bidin wan di nesîbê wan da dibe sih. Ji bo bint heşt we deh (hejdeh) hem ji bo her yek ji sinifê di maî şeş. Welhasil wê bê cemihkirin sihan par her du firqan weya hersêyan ji 'eslê mes'eleta wan her wekî ku red tê da nînin wê bê itbarkirin esil ji bo mes'eleta red.

(Tu bizan) usûlê mes'eleta reddê ku zewc we zewcet tê da nebûn çaran (yek jê dudu ne). Wekî niha ceddêdek we birakî ji um 'eslê mes'eleta wan jî ji şeşa ye. Lakin nesîbê wan dudu ne terîket bê gerandin di mabeyna wan da bi nîvîn. Yek jî sisê ne wekî niha um digel du weledê um 'eslê mes'eleta wan şeş e para wan jî sisê ne wê terîket bê gerandin bi sê para. Yek ji bo dê dudu ji bo ewladê wî. (Yek ji usûla jî erbe'et). Wekî niha bint we umme 'eslê mes'eleta wan ji şeşa ye nesîbê wan jî çar in. Terîket wê bê gerandin bi çar qisma sisê ji bo bint yek ji bo dê. Hem wekî niha xuhek ji dê we bavê 'eslê mes'eleta wan ji şeşa ye nesîbê wan jî çar in, sisê ji bo xuha ji ebeweyna yek ji bo xuha ji ebê, yek ji usûlê jî xemset e. Wekî niha xuhek ji dê we bavê, hem um 'eslê mes'eleta wan ji şeşa ye. Bi derbdana ferdan di hev da, paşî nesîbê wan jî pênc in. Ji şeşa terîket bê gerandin pênc qisma ji bo xuhan sisê ji bo dê dudu. (Hem wekî niha um we du keç in) (hem wekî niha um we bint we bintekî ibnê ye), 'eslê mes'eletê di wan da şeşa ye nesîbê wan jî pênc in. Wê terîket bê teqşîmkirin bi qederê nesîbê wan ji mes'elet eger bê kesir teqşîm bû qenc e. Wekî niha ev mesail we illa wê bê tesîhkirin çawa ku boriye. (Mes'elet ji yek ma du ceddêd hem exekî ji um) 'eslê mes'eletê ji şeşa ye nesîbê wan jî dudu ne. Kesir dikeve li ser ceddêda 'ededê ruûsê wan bê derbdan di nesîbê wan da dibin çar, dudu ji bo ceddêda dudu ji bo ex. Mes'elet hem sê birayê ji um 'eslê (Rûpel 52.) mes'eletê ji şeşa ye, nesîbê wan jî sisê ne, nesîb we ruûsê wan mubayil 'ededê ruûsê wan bê

